K.T.
ZANÎNGEHA YUZUNCU YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN U ÇANDA KURDÎ

**Teza Lîsansa Bilind**

# Rola Salih Yusufî di Çapemeniya Kurdîde

**Xalib Eli Mohemed MOHAMMED**
**14950001090**

**Şêwirmend:**

**Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ**

**WAN – 2017**

**T.C.**
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DILI VEKÜLTÜRÜ BİLİM DALI**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

# Kürt Basının da Salih Yusuf'un Rolu

**Ghalib Ali Mohammed MOHAMMED**
**14950001090**

**VAN – 2017**

NAVEROK

**KURTE** ............................................................ **II**III
**ÖZET** ............................................................ **IV**
**ABSTRACT** ............................................................ **V**
**SİPAS KİRİN** ............................................................ **VI**
**PÊŞGOTIN** ............................................................ **VII**
**KURTEBÊJ** ............................................................ **IX**
**DESTPK:** ............................................................ **1**

BEŞA YEKEM

**1.1 Çemkê Çapemeniyê** ............................................................ 4
**1.2 Kurtîya Çapemenîya Cîhanî.** ............................................................ 8
1.2.1 Despêka Çap u Çapemeniyê li Urupa: ............................................................ 8
1.2.2 Despêka Çapemeniyê li Rojhelat: ............................................................ 8
1.2.3 Yekemîn Rojnama 'Erebî: ............................................................ 9
1.2.4 Yekem Rojname Bi Turkî: ............................................................ 10
1.2.5 Yekem Rojname Bi Farsî: ............................................................ 10
**1.3 Rojnameya yekemîn ya Kurdî:** ............................................................ 11
1.3.1 Rojnamaya Kurdistan (1898-1902): ............................................................ 11
1.3.2 Sedema Derketina Rojnameya Kurdistan: ............................................................ 15
**1.4 Derbarey Çapemenîya Kurdî:** ............................................................ 20
1.4.1 Çapemenîya Kurdî li (1900)-(1914)an: ............................................................ 21
1- Rojnama Umêd (1900): ............................................................ 21
2- Kovara Kurd Te'awn u Tereqî Xeztisî: (1908-1909) ............................................................ 22
3- Rojnama Şerq u Kurdistan: (1908) ............................................................ 24
4- Rojnama Peyman (1909): ............................................................ 25
5- Rojnama Amîd u Sewda (1909): ............................................................ 25
5- Kovara Meşrotîyet (1909-1914): ............................................................ 26
6- Kovara Kurdistan (1912-1914): ............................................................ 27
7- Kovara Yekbun (1913): ............................................................ 28
8- Kovara Roj Kurd (1913): ............................................................ 28
9- Kovara Hetava Kurd (1913-1914): ............................................................ 30
**1.3.2 Rojnamegerya Kurdî li 'Iraqê:** ............................................................ 31
1- Kovara Banga Kurd (1914): ............................................................ 32
2- Rojnameya Têgehiştina Rastiyê (1918): ............................................................ 33

3- Rojnameya Pêşkeftin (1920): 34
1.3.3 Dema Hukmeta Şêx Mehmudê Hefîd: 35
1- Banga Kurdistanê (1922): 35
2- Roja Kurdistanê (1922): 38
4- Omêd Istîqlal (1923): 40
**1-5 Çapemenîya Kurdî li 'Iraqê (1958-1982).** 42
**BEŞA DUYEM**
**2.1 Jiyana Salih Yusufî:** 50
2.1.1 Aliyê Civakî: 50
2.1.1.1 Peydabuna Wî: 50
2.1.1.2 Xwendina Wî: 52
2.1.1.3 Pêkanîna Xêzanê: 54
2.2.1 Aliyê Siyasî u Neteweyî: 56
2.2.2 Damezrandina Komara Kurdistan li Mehabad: 61
2.2.3 Darbeya Sala 1963 an: 63
2.2.4 Rêkketina Cihzayir 1975 an: 69
2.2.5 Damezrandina Parta Sosyalîsta Kurdistanê 1976 an: 70
**2.3 Aliyê Rewşenbîrî u Edebî:** 72
2.3.1 SalihYusufyê Helbestvan: 72
2.3.2 Salih Yusufî u Paqijkirna Zimanî: 75
**2.4 Rola (Salih Yusufî) yê Rewşenbîrî u Çapemenî:** 77
**2.4.1 Rojname u Kovarên (Salih Yusufî) Derxistî:** 81
2.4.1.1 Rojnama Elteaxî 1967: 82
2.4.1.2 Rojî Kurdistan (Şemis Kurdistan)1971: 84
2.4.1.3 Kovara Estêre 1972: 85
**2.4.2 Rojname u Kovarên (Yusufî) Têde Bejdarbuye:** 86
2.4.2.1 Kovara Gelavêj 1939: 86
2.4.2.2 Rojnameya Jîn 1939: 86
2.4.2.3 Kovara Hawar1941: 86
2.4.2.4 Kovara Ronahî1960: 88
2.4.2.5 Kovara Nuserî Kurd 1971: 89
**2.4.3 Ji Gotar u Nivîsînên (Yusufî) di Rojname u Kuvaran de:** 90
**ENCAM:** 91
**LISTEYA ÇAFKANIYAN** 94

**KURTE**

**Rola Salih Yusufî di Çapemeniya Kurdîde.**

Peydabune Çapemeniyê li cem her mîlet u neteweyekê, mîna beşek herî giring u karîger ji dîroka wî miletî were hejmartin, Çapemenî xwedî kar u bizavên çendîn kesayetiyên bernas u karîgere, u ji bo pêşketina komelgehênmiruvatî, ev rêya peywendîkrinê çi qas mukum u bihêztirbe; têkelî u peywendîkrin ber bi pêş di çe, peydabune Çapemeniyê ne boyerek demkî ye, mîna çendîn boyerên din yên siroştî, ku bi tenê ropelek yan çendekan ji dîrokê ve digre, belku boyereke dumkirî ye u hindî miruv u miruvayetî hebe, hebuna wê jî berdewam di be u berdewamiyê bi karwanê xwe di de, reseniya Çapemenîya Kurdî ji navê Rojname u Kovarên wê diyardibe, ku piraniya wan bi navê Kurd yan Kurdistan re girêdayine, mîna: Kurdistan, Banga Kurd, Hetava Kurd, Rojî Kurd, Nuserî Kurd u Rojî Kurdistan.. .

(Salih Yusufî) yek jiwan kesanên giring u navdêr buye li seranserî Kurdistana mezin, ji bilî ku nêzî nîv çaxî jiyana xwe di siyasetê de derbazkiriye, helbestvanek çeleng u ziman zan bu, dîsan nvîsevanek navdêr buye u destek bala di biyavê Çapemenîya Kurdî de hebuye, bi taybet li başurê Kurdistanê u ‘Iraqê, kar di çendîn Rojnama u Kuvaran de kiriye mîna nivîser, sernivîser yan xwedî îmtiyaz, ev yeke derencama zîrekî u wêrekî ya wî buye, mifayek zaf ji buyer u babetên çaxê jiyana xwe dîtiye, ku rê xweşker bu ji bo gehandina peyama xwe, u kariye bi awayek serketiyanetekezê ji baruduxê alozê Kurdan bike, vê yekê di hundirê Gotar u nvîsînên wî de rengve di de.

Mîna Rojnamenvîsek çeleng, qelema xwe ji bo xizmetkirna doza gelê xweyê Kurd bi karanye, u baştirîn Gotarên wî bi zimanê 'Erebî bun, bi rengek ku çi nvîsevanek 'ereb karînên wî nebun, were nasîn pêşengê Rojnamenvîsên Kurdên nafçeya badînan, ku kesekê li pêşya wî nvîsînek bi zarê kirmancî li Çapemenîya Kurdî de belaf nekiriye, yek jiwan kesatiyane yên karîgeriyek erênî li ser jiyan u rewşenbîriya miletê Kurd hebuye, ku bi nvîsanên xwe ropelên piraniyaRojname u Kovarên Kurdî yên çaxê xwe xemlandîne, u li piranîya saziyên rewşinbîrî u zansitî u mediya ya Kurdî karkiriye u li hinek ji wane ji damezrêneran bu.

**Xalib ‘Elî MEHEMED**
**Wan 2017**

# ÖZET

## Kurt Basinin da Saliḧ Yusufun Rolű.

Her millet için gazeteciliğin meydana gelmesi o ulusun tarihinde önemli bir çalışma olarak kabul edilir. Gazetecilik önemli bir aksiyondur ve çalışkanlık isteyen kişilerin işidir. Gazetecilik insanın çalışma mirasıdır. Bu yolla insanları ne kadar çabuk eğitirse insanlarla ilişki ve alaka o kadar çabuk gelisir.  Gazeteciliğin meydana gelmesi diğer tabii olaylar gibi anlık bir olay değildir, tarih içerisinde ozel bir çalışma sayfasıdır. İnsan ve insanlık oldukça gazetecilik de devam edecektir. Böyle çalışmalar neticesinde Kürt gazetecilik ve dergiciliği de kendini gösterdi. Bu da Kürt veya Kürdistan ismi ile bağlantılı olarak ilerledi. Örneğin: Kürdistan, Kürt Çağrısı, Kürt Güneşi, Kürt Günü, Kürt Yazısı ve Kürdistan Günlüğü gibi…

Yusvî de, tum Kürdistan‘da tanınan, bilinen yarım asır yaşamını siyasette geçiren önemli bir dilbilimci ve şairdir. Yine Kürt basını alanında bilinen bir yazar, özellikle de Kürdistan'ın güneyi ve Irak'ta dergi ve gazetelerde çokça emeği olup yazar, başyazar, imtiyaz sahipliği yapması onun zekiliginin ve cesurluğunun gostergesidir. Kendi dönemindeki olay ve konularinda fayda görerek mesajını hogörü ile ileterek Kürtlerin kafa karışıklığı ve kargaşalarını kendi söylesi ve yazılarında göstermiştir.

Yusvî kahraman bir yazar gibi kalemini halkının davasında kullanmistir. Soylesilerinin onemli bir kismi Arapca'dir. Arap yazarlarının onun gibi bir tarzı yoktu. Kürt gazeteciliğinin tanıtilmasinda Behdinan bölgesinde Kurt yazarları arasında ondan önde, onun gibi Kurmancı lehçesiyle çalışma yapan olmamıştır. Kürt aydınları üzerinde tesirli bir etki ve olumlu bir çalışma bırakmıştır. Kendi dönemi dergi ve gazetelerinin çoğu çalısmalarıyla süslenmiştir. Birçok Kürt kurum, ilim merkezi ve medyasında emeği vardir ve birçoğunun da kurucusudur.



**Galib Ali MUHAMMED**
**Van 2017**

## ABSTRACT

**The Role of Salih AL.Yousifi in Kurdish Press.**

The Existing press in any community and nation, accounts as one of the most very important signs and factors in their historical life. The press is done through people who are well-known and influential, for developing social communities, the social relationships become stronger, improving communications and social life. The press is not a temporary impact like any other natural impacts, which they cover and influencih in one or some sectors from the history; but instead ongoing and consistent with existing human life. Its existing continues and will continue. Genuineness of the Kurdish press, noticihs from its newspapers and magazines,which most of them accompanied by Kurd orKurdistan names such asKurdistan, BangaKurdistan, Hatava Kurd, Rozhi Kurd, Nossary Kurd, Rozhi Kurdstan...

(Yousifi) is one of the important people and well-known among the bigKurdistan, although he spent more than half of his life in politics. He was one of the linguists as well as a famous writer (author) in the Kurdish press especially in the north and Iraq. He worked in many newspapers and magazines as a writer (author), an editor and this is because he was excihllent in the current field. He was also able to reach his voicih to people throughout the Kurdish press and to express the Kurdish crises significantly, which is widely obvious in his publications.

Like an active writer, he used his publication in a way to serve his community as Kurds and most of his publications were in Arabic language in a way that none of Arabs had like his abilities in writing. He is called as a leader Kudish press in Badinan area as no one had abilities to write in Kirmaji dialect like him. He was also one of the people who affected on the cultured, educated and intellectual people’s life as he spreaded out his publications at that time in most Kurdish press. He worked in significant majors such as cultural, scientific, and media reforms and he established some.



**Ghalib Ali MUHAMMED**
**Van 2017**

## SİPAS KİRİN


**Sipasî Jibo**

- Yezdanê Mezin ez gehandme îro qunaxek din ya xundinê temam bikem.
- Gyanê dayk u babên min ku hertim nexweşî kşandî ji bo nehiştna astengan di rêya xwendna min de.
- (YIrd. Doç. DIr.Nesim Sonmez) ku erkê şêwermendyê ji min re kir u hertim bi min re alîkar bu.
- Kargêrya pirtukxana kulîja zansitên mirovayetî, beşa zimanu edebîyata Kurdî u beşa dîrokî ya zanîngeha Dihukê.
- (D.'îmad weysî,m.Newzad'Ebdula, m.barzan,u m.luqman ferîq u m.Nazim Fayiq ) u tevaya hevalên alîkar ji bo min.
- HevJîn u malbat u xweşk ubirayên min ku hertim hander u piştevan bun ji bo temamkirna vekolîna xwe.

**PÊŞGOTIN**

Tevaya dîroknivîs u vekolerên Kurd hevrane li ser derketina Çapemenîya Kurdî ku Rojnameya (Kurdistan)e, li 1898an li Qahîre, u zêdebarî borîna 119 salan, lê nikarîn bi bêjîn demeke drêje li hemberî mîletên din, lê bi awayek giştî Çapemenîya Kurdî gîru nebuye, çunkî Kurdan bi xwe derxistye ne wek welatên din, li ‘Iraqê yekemîn rojname (elzewra) bu li 1869 ande, u bi roja Cejna Çapemeniyê li ‘Iraqê were hejmartin.

Çapemenîya Kurdî li çaxê hikumdarya Şêx Mehmudî, pêşketin bi xweve dîtîye,lê bi awayek giştî lawaz tê aşkerakirin, heta di gehe sala 1958 an, kete qunaxek nu wib dehan kofar u Rojname derketin, u l1970 an u li şunde, bi qunaxek dîrokî tê zanîn di rewşenbîriya Kurdî de, bi taybet dnîvbere (1970-1974)an, ku bi demek zêrîn tê danîn, li salên 1974 u 1975 an, u dgel despêka şorişa gulanê dîsan bi dehan derketin, gelek ji wane mîna mayinan, kelayên dagîrkaran di hejandin u di bune çra u ronahî ji bo tevaya Kurdistanê.

(Yusufî) mîna kesatyek navdêr li ‘Iraqê bi giştî u li Kurdistanê bi taybetî, rulek pir mezin dîtîye, mîna helbestvanek çeleng ropelên edebyata Kurdî nexşandîne, mîna nvîsevan u rojnamenvîs; Rojname u kufarên Kurdî u 'erebî prî Gotarên xweyên pir biha krîne, berhemên wî rastî u wêrekî têde bu, qaremanek navdêr bu di jiyana xwe de u qaremanane şehîd ketiye, di temena (21) salî de, dest bi nvîsînan kirîye u çuye hundirê derya ya helbesta Kurdî de, wili 1939 an bi damezrandina kumeleya (Hîvî), bi aşkerayî hizir u boçunên xweyên siyasî diyar di ke.

Di xwendina min de ji bo nvîsînên seydayê (Yusufî), bawerî u wêrekyek aşkera jêre diyar di be, hertim xudê u gel li hemberî çavan bu u ji kesekî netirsyaye, u hemberî rijêmek dijwar seknîye mîna şîretkar u rexnegir u berhingar hemberî hikumeta ‘Iraqê u rjêmên yek li duf yekên çaxê jiyan têde derbaz krî, seyday bi Gotarên u lêkulîn u helbestên xwe, cihek gelek freh u layiq di ropelên rojname u kufarên Kurdî u 'erebî de girtye dest,

Piraniya nvîsînên wî mîlet persitî u hefkarî u rewşenbîrkirna Kurdan bu, ji bo azadî u serixwebuna mîletê Kurd bu, u hertim di gu: ( rewşenbîrî milkê mîlete u yekbuna rewşenbîran hezkirna îradeya gelê Kurde ), (yosfî) çendîn rojname u kufar derxistîne ji wane: ( Elteaxî, Estêre, Noserî Kurd, u Rojî Kurdistan ), baştirîn nvîsînên wî di herdu rojnameyên dawyê de belavbuyne bi zimanê 'erebî, ta astek

bilind ku 'ereban hertim di gu kesekê ji nvîsevanên me şêwazê nvîsîna wî nîne, ji ber şarezayya wî ya zêde di zimanê nav bihorî de.

Vekulîne henê ji du beşan Pêkhatiye, beşa yekemîn (Çapemenî) çemk u pênase kurtyek cîhanî, u kurtyek ldor êkemîn Rojnama Kurdî u derkevtna wê, u li beşa duyemîn de kurtyek li ser jiyana (Yusufî) yacivakî u aliyê siyasî , dîsan aliyê rewşenbîrî, u li dawyê ku nav u nîşan u naveroka Xebatê buye, bi drêjî li ser Xebata wî ya Çapemeniyê seknîne, u di hundir de kar kiriye heta dawiya jiyana xwe, ku tê tîrorkrin mîna çrayek geş li esmana Rojnamegerya Kurdî di mîne.

**KURTEBÊJ**

B : Berg
B.n.b : Berhema nav bihorî
B.Ç: Bê Çap
Ç : Çap
D.d: Dîdar
Ça : Çapxane
H.b : Heman Berhem
H.r : Heman RopeL
H : HeJmar
N.m: Nama masterê
Pa: Parêzer
N.d:Nama Diktorayê
Ko : Kofar
Ru: Rojname
R : RopeL
T : Tercume
Wer : Werger

**DESTPK**

Çapemenî rêya ragehandina bilave, ji bo babetên di hundirê civakî de tên Rudan, tekezê ji dengê azadê netewan u berevaniyê ji mafê miletan di ke, u hertim bizavabellavkirina rewşenbîryeke pêşketî di hundirê rêzên xelkê de di ke. di dîroke zorbey miletan de kesanên bernyas hene, miletê Kurd jî ji hebune van cure kesan bê bar nebuye, u çendîn taybetmend u şareze di byava edeb u Çapemenî u aliyên din derketîne, u her yek jiwane li pey şyanên xwe xizmeta miletê Kurd kiriye, u miletê me bi gelên cîhanê re daye nasîn, (Salih Yusufî) yek ji wan kesatiyane yên karîgeryek erênî li ser jiyan u rewşenbîriya Kurdî peyda krî, giringîya vekulînê di wê yekê daye, ji nêzî kar u bzav u çalakyên Rojnamevanya (Yusufî) were zanîn ku di çi ast da buyne?

Ji berku destek bala di biyavêrojnamegerya Kurdî de hebu, bi taybet li başurê Kurdistanê u 'Iraqê, kar di çendîn Rojnama u Kuvarande kiriye mîna: (nivîser, sernivîser yan xwedî îmtiyaz), ku derencama zîrekî u wi êrekî ya wî buye di vî biyavîde, li demekî ku miletê Kurd mletek tepeserkirî buye, belê Çapemenîya Kurdî li wî çaxî bi taybet li bexdaya paytext, renge zehmetî u nexuşyek hebuye, heta ku karîban Rojnameyekê yan kufarekê derbixen, belê ev yeke bi hend wernegrit u bi hemî wêrekî u hêza xwe karî bejdarî çendîn (Rojname u Kuvaran) bi be.

**Hilbjartina Xebatê**

Helbijartna min ji bo babetî ji bo giringya Çapemeniyê di jiyana rewşenbîrî de ve di gere, ku diyardeyek şaristanye ji bo pêşketina her cvakekî, belku pêdivyek civakî hevçerxe , Çapemenî bejdaryeke pêşenge di çawenya dirustkirna cvakek saxlemu rizgar bune ji nexwendewaryê,ku yek buye ji rêyên serekyên peywendîkirna miruvan, helbjartna min ji bo rola Xebatkarek siyasî mîna (Salih Yusufî) di bwara Çapemeniyêde, ji bo diyarkirna rol u karîgerî ya wî u aşkerakirna senga wî ya zansitî bi awayek ekadîmî ji hemu alyan re , taybet aliyê Rojnamegerî buye. U diyarkirna şyan u Xebata wî mîna nvîsevanek u Xebata wî ya netewayetî dijî rjêmên wî çaxî li îraqê u nafçeyê, dane nasîna kesanên mîna (Yusufî) bi karekê herî giring di zanim.

**Giringiya Xebatê**

Çêdibe gelek Mijar u vekulîn derbarê Çapemeniyêde hatbin encamdan, lê berçav kirna rola (yosfî) di hondirê Çapemenîya Kurdî de, taybet li dawiya salên şîtande, bi kurmancî nehatye nvêsandin, vekolîna henê di be yekemîn Mijara ekadmî li Kurdistan u 'Iraqê, Çapemeniyê giringyek zav di avakirna cvakande heye, dîsan cihek taybet di jiyana netewande heye,ku tekezê ji dengê azad di ke, berevanyê jmafê mîletan di ke u hertim bzav di ke rewşenbîryek pêşketî di hundirê xelkêde peyda bi ke.

**Armanca Xebatê**

Armanca sereke ya Mijara xebatê, xwandinek kurte li ser piraniya hejmareyên Rojname u kufarên Kurd yên derketîn, li pey derketina her yekê li çaxê dewleta 'usmanî u hikumetên 'Iraqê, xweser Rojname u Kovarên (Salih Yusufî) derxistîn, mîna (Elteaxî u Estêre u Rojî Kurdistan u ...),bi rêya xwandinek hur ji bo gotar u nvîsîn u helbestên di hundir de wern belavekrin.

**Rêbaz u Mîtoda Xebatê**

Rêbazên wesifkrin u şlovekarî u dîrokî ji bo Çapemenîyê hatiye bikaranîn, her ji wesifkirnek dîrokî ji bo qunaxên derketina Çapemenîya Kurdî li berwara (1898) zi l wlatê xerîbyê, di gel kurtyek dîrokî ji bo jiyana şehîd (Salih Yusufî), u şlovekirna rolê wî di Çapemeniyê de li salên çlan hetaku heftyan.

**Pirsgiêrkên Xebatê**

Ji astengên ketîn hemberî me di dema nvîsînê de, zêdebarî zurî ya çafkanyan li dor Çapemeniyê, ku mfa li beşa yekem jêre hat wergirtin, lê li dor Xebat u rola nvêskarî ya dur u drêj u heme reng li zurbey sazî yên rewşinbîrî ya Kurdî bi kêmî wern dîtin, u kumkirna pêzanînan li ser kar u çalakîyn wî di hsan nebun, di karîn bi bêjîn kesatyê henê ta radeyekî u ndabuye, ji bo vê yekê me bzavkiriye xwe bgehînin malbata wî u hefsenger u kes u karên wî, u kurte tomarek wênekrî ya dîkîwmenterî di gel de hazirkiriye.

**Snurên Mijara Xebatê**

Mijar ji despêka serheldana Çapemenîya Kurdî li sala 1898 an despêdike ku rojbuna wê tê naskrin,bi qunax qunax hatiye behiskrin Rojname u kufarên di wî çaxîde derketyên bihurî li ser peyvîn,u ji aliyek din taybete bi rola Salih yosfî di Çapemenîya Kurdî de li ‘Iraqê, bi taybet dawiya salên çlan hetaku dawiya salên heftyan de, bi hurî li ser seknîne.

**Peykerê Xebatê**

Pêkhatiye ji kurteyekê u kurtibêjî u naverok u pêşgotin u despêk u du beşan u encam u lîsta çafkaniyan, di beşa yekemîn de bi kurtî behsa têgeh u çemk u dîroka Çapemenîya Kurdî were krin, di gel dane nasînek kurt li ser Çapemenîya cîhanî, u hinek bi drêjî li ser derketina yekemîn Rojnameya Kurdî seknîne, dîsan bi hurî li ser Rojname u kufarên li şunde derketîn seknîne, heta 1914an, wçaxê Şêx Mehmud hefîd, dîsan Çapemenîya Kurdî l’Iraqê piştî şoreşa 1958an heta dawiya heftyan ku grêday dawiya jiyana (Salih Yusufî) buye,wil beşa duyemîn de kurtyek li ser jiyana (Yusufî) yacivakî waliyê siyasî ku piraniya jiyana wî girtbu , dîsan aliyê rewşenbîrî mîna nvîsevanek çeleng wiziman zan whelbestvanek navdêr, u li dawyê ku navunîşan wnaveroka Xebatê buye, bi drêjî li ser xebata wî ya Çapemeniyê seknîne, me amaje bi bejdaryên wî krîne her ji çaxê bnemala Bedirxanyan u Çapemenîya byanî u Rojname u kufarên derdxistin mîna: Elteaxî u rojî Kurdistan u nuserî kurd u Estêre..... u di hundirde kar dikir heta dawiya jiyana xwe, ku tê tîrorkrin mîna çirayek geş li esmana rojnamegeriya Kurdi.

## BEŞA YEKEM

### 1.1 Çemkê Çapemeniyê

Çapemenî yek ji rêkên serekeyên peywendîkirna miruvaye, ev yeke jî çendeha komelgehênmiruvayetî pêşbikevin, rêka henê ya peywendîkrinê jî pêşdikeve, ji berku her miruvek yan takekesek dijiyane xwede pêdivî peywendîkrinêye di gel kes u cvak u komelgehên din, yanî peywendyeke du qulî di nîvbere miruv u pêşketina civak u komellgehîdebuna wî heye, Çapemeniyê rolek berçav di pêşvebirne mirov u cvakande heye. Çapemenî wek peyv ger lê bnêrîn, di zimana Kurdîde hemberî peyva: (Rojnamegerî , yan Rojnamenusî yan Rojnamewanî )[1] , were bikaranîn. Derbara zimana îngilîzî hemberî peyva (( (Journalism) yan (The Press) ))[2] were bikaranîn.

Dîsan hemberî heman peyv di zimana 'erebî de, peyva (Elsehafe) were bikaranîn , ku bi ramana kar u îşêRojnamevanan were zanîn, belê derbarey ew kesê li byavê henê de kardike dibêjnê: (Rojnamenus)di zimana Kurdîde, u (Journalist) di zimana niglîzîde u di zimana 'erebîde di bêjnê: (elsehefî).[3]

Peyvên bihurî , hemî bi ramana hindê ne ku ew kesê di byavê Çapemeniyêde kardike dibêjnê: ( Rojnamevan , yan jî Rojnamenvîs... Hitd. Peyva Çapemenî ji alîê zarravîve, ji bo wê yekê were bikaranîn ku rê yên karê nvîsîna rojnamêne, ku bi şêweyekî zansitî u Rojanebe, heta dgehe byavê çapkrin u fRutinê.[4] ( Çapemenî were hejmartin yek ji giringitrîn stunên şaristaniyeta hefçerx, u honerekeb hokarên bajêrvanyêve grêdaye, u li pitrî bajêr u bajêrkan belavdibe). [5]

---

1. 'Ebdulsemed Islam Teha duskî, *rolî bnemaley bedirxanyekan le geşepêdan û pêşxistinî hunerekanî rojnamegerî kurdîda 1932-1946,* çapa yekem, çapxaneya baban, slêmanî, 2010, r.50.
2. Gêwî Mukiryanî, *ferhengî kurdistan, çapa yekem , dezgayê aras, hewlêr, 1999, ri . 501.*
3. Fuad Tahîr Sadiq, ferhengî yarîdeder, ('erbî- kurd î- êngilîzî), çapa yekem, çapxaneya karo, slêmanî, ri .1225.
4. Mecdî Wehbe, *mu'cem mustelehat eledeb*, çapxaneya lubnan, beyrut, 1974, ri .18.
5. Ibrahîm Imam, *dirasat fî elfen elsehefî*, elqahîre, r.7 ; cemîl cburî, wesal elî'lam û mesîret elîntac, b.ç, bexda, 1977, ri .37.

Ferhad Pîrbal di pertuwa xwe de ya li bin navê (çend basê le mêjuy Rojnamenusî Kurdî) de aşkera dike ku (( hacî qadrê kuîy yekemîn helbestvanê Kurd bu zaraveyê (Rojname) u (cihrîde) dinvîsînên xwe de bikaranbe, ewjî li sala 1870 ande buye )):

***Sed qaîme u qsîde kes naykrê be pullî***
***Rojname u cihrîde kewtunete qîmet u şan***

Yan li cihekê dinde dibêje:

***Le dewrî ême roman u cihrîde***
***Eger çî meqsede, zanînî bawe.***[6]

Eve wê dgehîne ( ku hacî (1824-1897), ger li pêşî wîjî Çapemenî bi zimanê Kurdî hebe, giringya wê famkiriye. Her jber wê yekê mamustayê kurên mîr Bedirxan paşay buye, u ders ji bo emîn 'alî u mîqdad midhet u 'ebdulrehman gotîne).[7]
di pênaseya Çapemeniyêde boçun u têwerên cuda hene, mîna (edîb merwe) didete nasîn: ( ew hunera tomarkirna buyerên Rojaneye ku bi hurî u rengekê rêkxistî u koncay li gel boçun u giringîdan bi komên mirovan u vekohastna denkobasên wan u diyarkirna karên wan, u bvî awayî wêneyê civakî u dîtin u hizrên xelkî li ser reng vedide).[8]

Ji ber berifrehî u giringya biyavê Çapemeniyê bi çendîn rêkên cudacuda hatiye pênasekrin ji berku (( layenekêgiring di jiyana Rewşenbîrîde ve di gre, u ew diyardeyeka şaristanîye ji bo pêşketina her cvakekî, belku pêdivîyeke ji pêdivyên cvakê hevçerx, Çapemenî pişkdaryeka pêşenge di çawanya teknîkêde ji bo civakî u rizgarbuna wî ji nexwendevanîya ketye dbinê ketwarê wîde )) [9].

---

6- Dîwana Hacî Qadrê kuîy, *lêkdan û vekolîna serdar hemîd mîran û kerîm şareza*, ji çapkiryên e.g. Ri , hewlêr, 1986, ri .88-106.
7. Ferhad Pîrbal, *çendbasêk le barey rojnamenûsî kurdyewe*, çapa yekem, slêmanî, 2007, ri .22.
8. Jibo ptir bêzanînan temaşeke danerê: *elsehafe el'erebye neşetuha û tetewruha*, beyrot, 1961, ri .17.
9. Hugir Tahir Tufîq, *rolê rojnamegerya kurdî di pêşvebirna hizra netewe î ya kurdî de (1898-1918)*, wergêrana muhsin 'arf, çapxana hecî haşm, hewlêr, 2006, ri . 9.

Yanî giringyeka zorr di gişt cvakan de heye, dîsan Çapemeniyê (cihek taybet dijiyana netewande heye, wate derrbrrînê jdengê azadê netewan dike, berrevanîê jmafê miletan dike u hertim bizavabellavkirina reoşenbîryeke pêşketî di hundirê rêzêt xelkê de dike).[10]

Evê yekêgiringyeka zor daye byavêRojnamevanîê ku karîgeryeka balla li ser gişt cvakekê heye. Ji ber evê yekê bi gelek rengan hatiye pênasekrin ji bo mînak: Çapemenî ( rêkeke ji rêkên ragehandina bellav, ku babetên di nav civakîde dhêne Ruydan, vekulîn u baskrinê li ser encam dide). [11] Heta bi karbe bi huyrî di gel kawdanêt jiyanê u Jîn gehê bgerre, ji bo avakirna cvakekê prrî xuşî.

(Vultêr) di bêje: (( Rojnamenusî dezgayeke bekes naşkê, bellam ew cîhanî kun derroxênê bo ewey cîhanekî nwê dabimezrînê )),[12] dête nasîn, yanî ew dezgehe ewê zêrevanî u berevanîê jimllet u wellatî dike. Dîsan derbarey Çapemeniyê hatiye ((Çapemenî layenek giringê binyatê civakîye , belku diyartirîn layenê avakerê rasteqîneyê jêrxana civakî dike)).[13]her dîsan naplîwnê yekemîn (1769-1821) kotye: ( Çapemenî yeke ji mezintrîn stunên herî giringên şaristaniyetê ku cvak li ser were avakrin). [14]

Çapemenî binyat u rêka nvêsîna Rojnamaye, ku bi şêweyekê zansitî be , heta di gehe qunaxa çapê u fRutinê , ev çende zarraveya Çapemeniyê diyard ke. (( Wate layenekêgiringê kumellê ye, çunke Çapemenî diyartirîn layenê serxana civakîye, ji berku derrbrrîn u salloxdanê li rastyên jêrxana civakî dike)). [15]

10. Wayl ‘Izet elbekrî, *tetewr elnîzam elsehefî fî el'îraq (1958-1980)*, dar elşun elseqafye el'ame, bexda, 1994, r.5.
11. Se'di eldîn Xizir, *elsehafe û el'esr*, çapxaneya dar elhurye , bexda, 1986, r.18.
12. Kemal Mezher Ehmed, *Têgeyiştnî rastî*, çapxaneya kurê zanya rîy kurd, bexda, 1978, r. 18.
13. 'Ebdul Semed Islam teha duskî, *rolî bnemaley bedirxanyekan le geşepêdan û pêşxistinî hunerekanî rojnamegerî kurdî*, r.51 .
14. Elfîkunt Fîlîb dî trazî, *tarîx elsehafe el'erebye*, berga yekem, beşa yekem, beyrut , 1913, r. 9.
15. Hîmdad Husên, *rojnamewanî û edebyatî nwêy kurdî*, çapxaneya şvan, slêmanî , 2008 , r.342 .

Çapemenî bi şêweyekê zorê berifreh hatiye pênasekrin, belê di karîn bêjîn : ew biyave, yanjî ew dezgehe ewê bi rêkên zansitî u ekadmî u cudacuda behis li byavên cudacudayin jiyanê dike, heta bi karbe bi cwantirîn reng bi gehe dest xelkî, anku Çapemenî hunerekê şaristanye di gel pêşketina jiyana şaristanya mletande bi karbe rolê xweyê karîger di hundirê civakîde rab be, bi amrazekêgiringê cvak bi rêvebrinê were hijmartin. (di gel pêşketina rêpîvana cvakê mirovayetî u dirustibuna peywendyên nîvdewletî di gel wellatekê din de grêdide, bi evê yekê Çapemenî jî rolê xwe dbîne u pêş dikeve).[16]

Weku diyarbuy Çapemenî di gel her qunaxeka pêşketina şaristanya mîletan ber bi pêş ketye u hebuna xwe di nav civakîde dîtiye. Serhildana Çapemenîya Kurdî di jiyanêdeye bi rengek giştî, diyarkrin u zanîna rastya hertiştekê di jiyanêde, fere miruv dîroka wî tiştî bzane, eger li despêka Rojnamegerya Kurdî bi gerrîn, ya fere miruvgiringyê bi dîrok ya mêjuya destipêka Rojnamevanya Kurdî bde.

ji berku miletê Kurd mleteke ji alîê jiyan u kelturîve gelek caran hevbeşî miletên hevsiwên xwene, ji berhindê jî gelek caran kesayetyê Kurd Wehe vyaye zanyarya li ser: ( gel, netewe, ziman, cvak, ramyarî, ayîn... Hitd ) yên miletê xwe werbigre.

Ji aliyekê dinve derketin u pêşketina Çapemeniyê li her wellatekê peywendî bi derketin u pêşketina Rojnamegeryêve heye, serrerray hindê ev çende hemî dnav miletê Kurd de hebuye, ji berhindê derketina çapê li nîva duyemîn ya çerxê sêzdan karîgeryeke erênî li ser gişt layenên jiyanêkiriye, bi taybet Çapemeniyê , ji ber hindê miletê Kurd xudanê reoşenbîrya taybeta xwe buye, u ev reoşenbîrye ji gelek alyanve di hate pêş, bi taybetî di byavê Çapemeniyê de, ji berhindê byavê çapê di nav miletê Kurd de karîgeryeke zaf li ser bizavaRojnamegerya Kurdî kiriye.

16. Feysel Dêyatî , *eda û mulahezat hewle elsehafe û elsyase* , çapxaneya selah eldîn , hewlêr, 1998 , r.53.

## 1.2 Kurtîya Çapemenîya Cîhanî

### 1.2.1 Despêka Çap u Çapemeniyê li Urupa

Çapemenî mîna nîşanek herî diyara şaristanîyeta nu, berdewame di gel sedemên pêşketnê, [17] ((Çap bi eslê xwe urupiye, derxistna Çapemeniyê bêy dezgayê çapê nabe. Li sala 1436 kotnibêrkê elmanî çap derxist, ku li despêka çerxa hevdeyan Rojnama (Rojane) li urupa derketiye u dest bi derçunê kir, li sala 1605 an Rojnama (Nîyutîdîgîn) li belçîka, u li 1615 an (Frankfurtercornal) li elmanya u li 1620 ande li hulenda, u li 1631 ande li firansayê ji bo xizmetkirna Luysê çwarem rojnama (Lagazêt) derxist. U li 1641 ande Rojnama (Rîvyo) li birîtanya. Li sala 1703 an li Rusya u emrîkayê jî Çapemenî peydabu li ser destê gerrokek îngilîzî ku li bostin barvedkrin , her çende Rojname hate daxistin u ef kese xiste zîndanê, lê li sala 1704 ande car din ( Bostin Nyoz Lêter) Rojane hate derxistin )) [18]

Di gel vê despêkê li urupayê bi sedan u hezaran Rojname derketin li seranserî urupa u emrîka bçendîn zimanê cuda u jaliyê xwendevananve bi awayekî normal dhatne xwendin.

### 1.2.2 Despêka Çapemeniyê li Rojhelat

( Her lidespêka çerxê şazdan de uRupîyan tîpên 'erebî u farsî darîştin u pirtukên pîrozên esmanî pê çapkrin, lê ji bo maweyek drêj karbedestên 'usmanî nehêşt ev dezgaye bête nav mîletê bi tesîra kesanîn olî, ku dkotin çap ('emelun mîn rcis elşeytan) ji ber wê çapenî jî nederkete holê). [19] Dîroka Çapemenîya her wlatekî derbirîna aliyekê dîrokî dike, ji bo rengvedana barê siyasî u aburî u civakî u olî yê wî civakî Çapemenî têde derketî. [20]

---

17. Hugir Tahir Tufîq, *dewr elsehafe elkurdye fî tetewr elwe'î elqewmî elkurdî 1898-1918*, ri .55 .
18. Newşêrwan Mustefa, *çend lapereyek le mêjûy rojnamewanî kurdî*, berga yekem, çapa dezgayê serdem, slêmanî, 2001, r. 8.
19. Newşêrwan Mustefa, *çend lapereyek le mêjûy rojnamewanî kurdî* , r. 9.
20. Rofayîl Betî, *elsehafe fî el'îraq*, b.ç , 1955, r. 5.

Bo cara yekemîn gelên ne Musilman mîna: (Cuhî, Ermenî, Iwnanî, Mesîhyan) çapxane peydakiriye u pirtukên ayinî u dîrokî bi zimanên xwe u bo gelên xwe nvîsîne, u rê nedhat dayin ji bo gelên Musil man bi zimanên wan çapbiken. Ji bo cara yekem cuhyan çap birye turkya u li sala 1546 ande pertuka tewratê bi pîtên 'îbrî çapkiriye, li şunde ermen u îwnanyan çapxane damezrand.

Li welatê îranê ji bo cara yekemîn li salên 1611-1620 ande aniye esfehanê, u li peristgehên xwe hinek du'ayên 'erebî u farsî çapkirîne. Sala 1702 an qeşeyên mesîhî çapxane li helebê damezrand, li 1712 an bi fermana sultanî rêk hat dayin ji bo (se'îd efendî) vî dezgay dabne bi şertê; quran whedîs u fîqe u kelam çap neke. Li sala 1733 ande li lubnanê kasulîkan çap danaye, her dîsan ersedukisyan mîna hevirkekî 1750 ande li beyrotê dezgayekê din dana, u li 1834 ande jî çapxaneya emrîkî u li naverasta çerxê nuzdê çapxana (babên yesu'yan) hate damezrandin mîna giringitrîn dezgayê çapê li nafçeyê ku heta îro maye. [21]

### 1.2.3 Yekemîn Rojnama 'Erebî

( Di gel leşkirkêşya nablîwnî ji bo ser mîsrê li (1798-1801) an, komek ji zana u pisporan di geldabun, di gel dezgayekê çapê bi pîtên latînî u îwnanî u 'erebî, jiblî Damezrandina pirtukxane u dbistanan ji bo zaRuyên xwe, du Rojname bifrensî u yek bi 'erebî li bin navê (eltenbye) derxistin. Li sala 1821 ande li ser demê ( Mehemed ‘Elî paşa) çapxaneya nablîwnî hate nukrin bin navê ( elmetb'e elehilye) ku li pêşî di kotnê (metbe'et bolaq) ropelên hukmetê yên fermî çapdikrin, u li 1828 ande ketye derxistna (elweqa' elmîsrye). Honera çapê li nav Musil manan hemberî wlatên ne Musilman gelek paşketye, yekem çapa pîtên 'erebî li 1728 an hatiye stembolê, u li 1844 ande ji bo esfehan u li 1840 ande ji bo wirmê; mesîhîyan çapxaneyeka pîtên siryanî, 'erebî, farsî, îngilîzî damezrand ).[22]

21. Newşêrwan Mustefa, *b.n.b*, r. 9-10.
22. h.b , r.10.

### 1.2.4 Yekem Rojname bi Turkî

Sedema zu peydanebuna çapê ji bo dewleta 'usmanî, ji bo gelek egeran vedgere, u pêşî hemuyan egera olî buye, çinku Şêxê îslamê bi karê (fisq u fcor)ê di zanî, li ser vê têgehiştnê hatna çapê ji bo çarêka yekem ya çerxa nuzdan gîru bu.[23] li wî çaxî mîlet bi ser hilbu ji bo cara yekemîn, u yekem Rojname hatiye çapkrin u derketin li sala (1825) an bu bi zimanê frensî u piştî demek kêm (tequym elweqa' ) bi zimanê turkî derket li (1832) an u ev dîroke buye despêkeka rasteqîneya derketina Çapemeniyê u giringîdana mîletên jêr destê dewleta 'usmanî).[24]dîsan Newşêrwan Mustefa aşkera dike ku: (( yekem Rojname li turkya u bi zimanê turkî derketî li sala (1832) an li bin navê ( tequymî weqa' ) bu , ji bo belavkirna ferman u xeberên babê 'alî)).[25]

### 1.2.5 Yekem Rojname bi Farsî

Bê goman her cihê çap lê peydabuy Çapemenîjî di şunde çuye, (( çap mil bi milê rojnamegeryê ve buye )) [26] bi zimanê farsî li îranê bi xwe derneketye, belkî li hîndistanê buye, ku li wî çaxî li jêr deshelata îngilîzî bu, her ewan çapxane brîye hindistanê u bo cara yekem sala 1780 ande bîngilîzî Rojname li bengal jêre çapkirîye, u şunde zimanê Farsî li wî wlatî hate bi karanîn bi yekemîn Rojname li bin navê ( merat elehwal ) li 1820 ande )).[27]

Li wlatê îranê despêka Çapemeniyê ji bo sala 1837 an vedgere, ku mîrza Salihê şîrazî [28] (kaxez exbar) li taranê derxist ji bo exbarên hundir u derve wexbarên şae u derbar u biryarên wî. Li ser dema sedaretê muslîhê gewre mîrza teqê xanî emîrê kebîr da (dar elifnun) damezrand, ku Rojnameya duyemîn li îranê derxist.)) [29]

---

23. 'Ebdul Rezaq elhîlalî, *Tarîx elte'lîm fî el'îraq fî el'ehd el'usmanî elexîr 1638-1917*, b.ç, bexda, 1959, ri .142.
24. Kemal Mezher, *dîsan rojnameya kurdistanê, kofara rojnamevanî*, hijmar(8), hevlêr, 2002, ri . 118.
25. Fayq Betî, *elsehafe el'îraqye, mîladuha û tetewirha*, bexda, 1961, r. 213.
26. Fayq Betî, *suhuf bexdad fî zîkra tesîsha*, bexda, 1962, r. 7.
27. Newşêrwan Mustefa, *b.n.b*, r. 11.
28. Mîrza Salhî hatbû şandin ji bo lenden da fêrî honera çapê bi be, û dyar di be ku her ef kes bûye (newispaper) veguhastye ji bo (kaxezî exbar) ya farsî ku belafkirya sereke ya derbar bû (hkumetê) , lê piştî çend salan hat girtnê.
29. Newşêrwan Mustefa , *b.n.b*, r. 12.

Belê ehmed ‘Ebdulkerîm di pirtuka xwe de (elsehafe elîranye) diyardike: (( yekem Rojnameya farsî li îranê li sala 1851 an bu, u yekemîn Rojnama 'erebî li ‘Iraqê ( elzewra ) bu li 1869 an. [30]

(eltenbîh) li serdemê Mehemed ‘Elî paşa li misrê li 1821 an yekem Rojnama 'erebî bu, u (Teqwîm elweqa') li (1832) an bi zimanê turkî bu, u bi zimanê farsî (Merat elehwal) li 1820 ande yekemîne, u ev bucone Run u aşkeratre u kevintre ji ya sala 1851 an ku ( elsehafe elîranye ) yekemîn buye, ev Rojname her sê ser bi dewletê febun, anku hkumî bun. Peydabuna Rojnamegerya Kurdî jî berovajya van wlatên cîran buye, bi Rojnameyeke ehlî u take kesî jêr navê (Kurdistan) lsala 1898 an li Qahîre, ji aliyê Mîqdad Medhet Bedirxan bu. Ev çende bi şanazîve jalîyêgiringîdana bnemalleka weku bnemalla Bedirxanyan ji bo Çapemeniyê, ku kesayetiyên wê bnemalê xudan hestekê niştîmanî u netewîy bun, heta gehşitîne wî radey kub pêşengên rewşenbîrî u Rojnamegerya tevaya miletê Kurd wern hejmartin.

## 1.3 Rojnameya yekemîn ya Kurdî

### 1.3.1 Rojnamaya Kurdistan (1898-1902)

(119) salan berya niha li bajarê (Qahîre) paytextê mîsrê, Rojnameya Kurdistan bi cwantirîn u soztirîn u behatrîn nav derket, li sîng u dlek prrî jan u dîrokek drêja xuynawî serhilda, dema (Kurdistan)ê çavên xwe vekrîn; yekemîn Rojnameya cêrmenî (Sitrasbork Rîleyş) 289 sal u (Lagazêt) ya frensî 267 sal u Rojnameya (gazîdidî medrîd) ya îspanî 238 sal, u ( Postin Nîwzîleyişn ) ya emrîkî 194 sal u ya turkî (Tequymî Weqa') 90 sal, u ya mîsrî ( elweqa' elmisrîye ) 70 sal u Rojnameya ( elzewra ) ya 'îraqî 21 sal, bi serde derbazî bibun ).[31]

Rojnameya Kurdistan heta dawîya salên şêstan jçerxa bîstande ya berze bu, serbarî peyvîna çendîn rojhelatnas u dîroknas u tore nvîsên Kurdan li ser mîna: blec şêrku, Mehemed emîn zekî, mînorsikî, dîsan ‘Elaeddîn Secadî di pertuwa xwe de (mêjuy edebî Kurdî),

30. Ehmed 'ebdulkerîm, *elsehafe elîranye, bexda* , b.ç , 1972, r. 6.
31. Mehmûd Zamdar, *Geştêk le nîw bzavî rojnamegerî kurdîde*, çapxaneya zanîngeha selaheddîn, hewlêr, 1998, r. 7-8.

Lê kesê Rojnameya henê nedîtbu u belav nekribu, u cudahî di dema derçuna wê de hebu, heta marf Xeznedarî hejmara yekemîn bi destxistî, di Rojnameya (Birayetî-Elteaxî) de li Bexda di hejmara (365) ande li berwara 19/4/1968 an, wêneyê hejmara yekem belafkirî, [32] yaku li pirtukxaneya rojhelatnasyê li linîngrad li rosya werî parastin,

Li şunde kemal fuad karî hemî hejmareyên wê dest bxe jiblî ya (10-12-17-18-19) an, u li bexdayê ser şêwê pirtuk li bin navê ( Kurdistan Yekemîn Rojnamey Kurdî 1898-1902 ) li sala 1972 an çapkir, u niha daneyên wê yên resen li pertuxaneya marburk ya elmanî di parastîne, li şunde Mehemed emîn buzerselan rabuye bi wergêrana wê ji pîtên 'erebî ji bo latînî, u bi du beşan li sala 1991 an li bajarê ubsala ya suydî li bin navê ( Kurdistan Rojname- Kurdî yapesîn- îlk Kurd gaztesî 1898-1902), u li şunde (Malmîsanij) herdu hejmareyên (17-18) an bi dest bxe u di pertuwa xwe de li suydê belav bike, u li bin navê (Kurdistana dayk) Mehmud zamdarî bi hevre di gel kemal fuadî li Hewlêrê li sala 1998 ande, herdu hejmar belavkirîne ).[33]

Hejmareyên (10-12-19) di winday bun heta sala 2005 ande, (Celîlê Celîl)î karî hejmareyên (10-12) an bbîne, u bivê yekê tenê hejmareya (19) di mîne berze u heta niha kesekê nedîtiye, prranya kotarên zimanê turkî yên li Rojnameyê hatîn belavkrin, hatne vekuhastin ji bo zimanê Kurdî ji aliyê (Şêrzad ‘Ebdulkerîm) ve, u (Mustefa zengene u usman Mehemed hewramî) tuyjandye, u (Ferhad Pîrbal u Mela Bextiyar) pêşekî jêre çêkiriye u mîna pertu çapkiriye li bin navê (Kurdistan yekem Rojnamey Kurdî) li sala 2000 ande li Kurdistana ‘Iraqê. [34]

Rojnameya Kurdistan, bi destipêka Rojnamegerya Kurdî were hejmartin, çinku Rojnama henê dergee ji bo reoşenbîrya Kurdan bi rengek cwan vekir, heta Rojnamegerya Kurdî gehşitî astek bilind, em di karîn bêjîn rojnamêgiringî bi denkobasên neteweyî u şerê miletan li wî çaxî dida.

---

32. Musediq Tovî di bêje li hejmareya 22/4/1968 ande ji rojnameya brayetî hatbû belavkrin, ji bo ptir zanyaryan bnêre: musdiq Tovî, *b.n.b*, r. 12.
33. Hugir Tahir Tufîq , *b.n.b*, r. 65.
34. *h.b*, h.r.

Dîsan (( Rojnamenvîsê Kurd her li destipêkirna derketina Rojnamegerîya Kurdî, li gel Rojnameya (Kurdistan) ku bi xala werçerxanek mezin u bi hêza kelturê Kurd bu lsala(1898) ande bi herdu zimanên Kurdî u turkî ku zimanên destellata siyasî bun di were nvîsandin u belavkrin, hinek caran bi zimanekê skala u du'a krin ji bo pêdana mafê xwendin u nvîsînê bi zimanê zikmakyê xwe kotar u babetên din nvîsîne)). [35]

Bi derketina (Kurdistan), giringî bi ziman u kilturê netewê Kurd were dayin, ku bi tiştek zor giring were li qelemdan, çinku li ((22 nîsana hemu salekê Rojnamenvîsan u qelem bi destan bi şkudarî çejna Çapemeniyê wpeyva resena Kurdî pîru z diken, yekemîn Rojnameya Kurdî li bin navê (Kurdistan) jdayk bu. Ser destê (Mîqdad Medhet Bedirxan)[36] yê beheştî li Qahîre paytextê mîsrê çrayê xwe hilkirîye u êdî karwanê Rojnamegerya peyva resena Kurdî jwê rojê u şunde dest pêkiriye, u bi gelek qunaxên cuda cuda derbazbuye heta bi qunaxa zêrîn re gehiştye)).[37] ‘Elaeddîn Secadî [38] dibêje: ( netewa Kurd li serdemên pêş de diyardeka weha ji bo nehatibu pêş ji bo wê yekê zimanê xwe bi nvîskî agehdar bike u belav bike, tenê hêzek bi destê wan vebu ew jî xwe parastin ji zulm zordarya dewletan taku bi mînin zindî) [39], demê em byanuya ji bo vê gotnê dînîn ziman ku gelê Kurd dreng hest bi buna xwe kiriye. li destipêka pertwa Cemal Xeznedar de ya li bin navê (raberên Rojnamegerya Kurdî) de hatiye: (derketina êkemîn Rojnameya Kurdî li demê xwe de bi zimanê Kurdî bi navê " Kurdistan " li 22ê nîsana 1898 an li Qahîre werçerxanek dîrokî bu bandora wê li bizava Rizgarîxwaza Kurdî de hebu).[40]

35. Hîmdad Husên, *Rojnamewanî û edebyatî nwêy kurdî*, çapxaneya şvan, slêmanî, 2008, r.342.
36. Mîqdad Midhet Bedirxan: nevyê mîr bedirxane, babê wî mîrê cezîra botan bû, li sala 1891ande, ji ber nexweşî û têkçûna barê syasî li wî çaxî ber bi misrê çûye, ta hijmare (5)an rojnama kurdistanê wekî ser nvîser domye, pişt re brayê wî bûye ser nvîserî wî rojnamê, dgel brayê xwe 'elî beg li sala 1909 serhildan djî deshelatên 'usmanî despêkir, û di sala 1910an de dgel nvîser û hevalên xwe ziviryeve stenbolê, û bejdarî damezrandna komeleya parvekirna pêzanînên kurdî kirye li heman sal de bûye muteserîf li dêrsimê sala 1912 ande, li berwara 1917 an wexera dawyê kirye. Bo ptir zanyaryan temaşke: malmîsaniz, bedirxanyên czîra botan, veguhastna şkur mustefa, hewlêr, 1998, ri 160-162.
37. Mehemed Se'îd Kurde, *çend babetêkî rojnamewanî*, çapa yekem, çapxaneya rewşenbîr, hewlêr, 2004 , ri .10- 11.
38. ‘Elaedîn Secadî (1915-1983) li bajarê slêmanîy ji day bûye, dwazde ktêb di mjara edeb û dîrokê de çap krîne, nvîsnên xwe di kovara (gelawêj) de belav krîne, dîsan ser nvîserê kovara (nzar) bû, li beşa kurdî li kolîja adabê zanîngeha bexda, wane bêj bûye, endamê korê zanyarî kurd bûye.
39. 'Elaedîn Secadî, *Deqekanî edebî kurdî*, korî zanyarî kurd, bexda, 1978, r.4.
40. Cemal Xeznedar, *Raberî rojnamegerî kurdî*, bexda, 1973, r.12.

(Kurdistan) pîşengê Çapemenî ya Kurdye 22ê nîsana her sall, mîletê Kurd bîranîna derçuna rojnamê nu dike, ger geştekê di hundirê ropelên vê rojnamê bikeyn ewên niha kopîkrî u ji ber destên me dbînîn komeka edgar u taybetmendî bercihste dbin, kualiyê bi qwet u pêşketyên vê Rojnameyê derdêxe u ji bo me Run dike. mîdiya u Rojnamenusî mîna êk ji zansitên miruvayetyên xwedî tuxim u rêsa gelek cihgîr nîne ku bi şêweyekê sîstematîkî berçav kirbe, jber vê yekê li dest pêka serheldana rojnamê li cîhanê de taybetmendyên Rojname u hunerê Rojnamenusî yê dest nîşan nekrîne heta astê baş u xrapî rojnamê ji bo me diyar bike, belku beRuvajî taybetmendyên tuxmên Çapemeniyê baş derçun ji sedema beref pêşçuna rojnamê hatne derkrin, mîna dahênana dezgehê çap u pêşkeftna teknîkî Çapemenî u gehandin u ve kohastin nexiş li dirust kirna form u hundirê rojnamê de hebu. derketina Rojnama Kurdistan mîna şoreşeka mezin di biyavê rewşenbîrî u roşengeryê li cîhanê de ber pa kir, bi taybet li seda nozdan u bîstan de ku di hundir de bi dehan buyerên mezin u ghorînên binçîneyî li hemî biyavên jiyanê de ser heman jî werçerxanek aburî u pîşesazî girtye ber, sîmayek din ev ghorînane buna gelên jêr dest buye, ( eger rolê rojnamê li welatên serbxo u xwedî qewarekê cugrafî u kyanê siyasî çi garîgerî hebe, dibe ji bo neteweyekê bê nîştîman u dabeş buy dibe bandoreka mezin hebe).[41]

(Mîqdad medhet berdxan) tenê pênç hejmareyên rojnamê derxistin, sê hejmareyên pêşîn li çapxaneya elhîlal u du yên din li çapxaneyaxwe ya li b navê (çapxaneya Rojnama Kurdistanê) , çapxaneya henê yekemîn çapxaneya Kurdye ji aliyê Mîqdad Medhet Bedirxanî re were damezrandin[42], (Rupelên Rojnameyê bi qebarê (32.50 × 25.50)sim nezêde mezin bun), her car du hezar hep di wern çapkrin, li ser ropelê Rojname ya yekemîn hatiye nvîsandin: ( ku mehê du carderdike ve ), lê belê ji ber zorî u rewşa xrap bi aweyekê bê ser u berî derneketîye, Rojname bi kirmancya joRu u bi zarê czîra botan hat nvîsandin, aşkraye ku ev di wî çaxî de di nav Kurdan de pir belav buye u xwedyê Rojnameyê bi xwe jî bi vê devokê axfitîye).[43]

---

41. Mumtaz Heyder, *dewrî rojnamenusî kurdî le pê geyandinî hoşyarî neteweyî û bzavî rizgarîxwazî kurdî, kovara (karwan)*, hejmar (120), 1998, r.20.
42. Ferhad Pîrbal, *Mêjulkey yekemîn çapxane kurdîyekan*, kovara (rabûn), hejmar (10-11), stokholm, 1994, ri .123-130.
43. Celîlê Celîl, *Jiyana rewşenbîrî û syasyên kurdan ( di dîwana sed sala 19an û destipêka sed sala 20an de)*, jyana nû, û pala , 1985, r.33.

Dema mirov di hundirê van pênç hejmaran li Qahîre derketne di nêre, di bîne ku aliyê Rojnameyê ya perwedeyî u çandîgiran u Mijarên polîtîk jê kêmin, ev Rojnameya pir caran li ser arîşên Kurdan seknî ye, ji bo vê em di karn nvîsek di jmara yekemîn de mînakekê bdin, di wir de dibêje ku:

***( Heyfa min tê ji Kurdan re, Kurd ji gelek qewman zêdetir xwehîş u zekane, camêrn dnêr xwe de rast u qewî ne, xurtin u dîsa wek qewmên din ne xwandîne, nedewlemendin, dinyayê de çi dibe, cîranê wan musqof çawaye, wê çi bike nzanin, lewma rya xwedê de min ev cihrîdeye ha nîvsî, bi îzna xwedê te'ala paş nho her pazde Roja de carekê ezê cihrîdekê binvîsm navê wê min kiriye (Kurdistan) vê cihrîdeyê de ezê behsa qencya 'îlm u me'rîfeta bikem, li ku derê mirov di 'elme, li kuderê medrese u mektebên qenc hene ezê nîşa bikem, li kuderê çi şer dibe dewletên mezin çi dkin, çewa şer dkin tîcaret çewa dibe, ezê hemya hîkat bikem*** )[44]

**Rojnameya Kurdistan çendîn taybetmendîbi xweve digirtinji wane:**

***** Herdem bi çar Rupelan derdiket, parêzgarî ji Rupelên xu kiriye, bê goman li wî çaxî prisgirêkên çap u kêmî ya nivîserê ku Kurdyê bi zanbe ya zehmetî ya gehiştna babet u nameyan, çunkî li derveyê Kurdistanê dwere çap krin u pareyên pêwîst ji bo derkirnê di kîm bun, çunkî Rojnameyeka ehlî bu, zêdebarê vê yekê gehandin bi Kurdistanê karekê hasan nebu, diyare ev prisgirêke her hemî belku çendên din jî hebun, çi jvane nekribune behane ta bi qebareka bçuktir derbiken, u niha buwaye bi van hemî prisgirêkan çêdibe çendîn caran gorankarî têde kirbane.

***** Ji aliyê şkil u derhênana hunerî ve, Rojnameye henê hertim xwedî ropelên li serdu ya sê stun bu, li ropelê yekemîn li beşa serî de navê rojnamê (Kurdistan) ji ber aşnabuna nivîseran bi elf bê ya 'erebî bi kirdistan hatibu nvîsandin, ev nave di naverasta Rupelî u bi xetekê mezin u bal kêş hatî yenvîsandin, li jor de sala derçunê (1315) ku sala hicrîye u li hemberî (1898)an hatiye nvîsîn, li hemî jmareyên her çar salan ev sale dheman cih de nvîsand bu,

---

44. Dilgeş Felat, *Rojnameya kurdî ya pêşîn kurdistan* , r.33.

Ji aliyê rastê nav u nîşanên rojnamê u nav u nîşanê post u tîraj di her jmareyekê de hatibune nvîsandin, u ji aliyê çep jî de heman nvîsîn bi zimanê turkî nvîsandibu, abunên salane ku (80) qiruş bun, li jêr navê (kirdistan) her carê çend riste têde dinvîsandin, carandema derçunê têda aşkra dikir, (pazde Rojan de carekê tê nvîsandin, cihrîde ya kirdîye) di gel hinek zanyaryên din jî, hinek caran dubare dbuneve, hinek caran tiştê din li Cihê wan belav di bu, piştî vane du hîlê terîbê drêj bi panaya rojnamê xistbune jêr zanyarya navbera van hêlande, sentîmetrek bu Roja derçunê her jmareyekê bi herdu rojmêra hîcrî u romê dhatne belav krin.

Rojnameya henê Rojnameyekader bi der bu, ji ber vê yekê qed li cihek diyarkirî cihgîr nedbu, belku her maweyekî li cihekî derdikt, sye u yek hejmar jêre derketîne [45] bi vî awayî: hejmare (1-5) an li Qahîre , (6-19) li cnêf suyisra derketin, dîsan carek din hejmare (20-23) an dubare li Qahîre, hejmare (24) an li lenden , u hejmare (25-29) an li "folkiston" derketin, dîsan hejmareên (30-31) an li cinêf [46], u hejmareya dawyê li berwara 14 ê nîsana sala 1902 ande derketiye).[47]

*****Rojname bi Kurdyek rewan u kirmancîya jurî bi devoka czîra botan dhate belav krin, car caran li piştî hejmareya (4) an bi turkî jî derdiket, bi taybet li hejmare (16) ande Rojnameya Kurdistan behis kiriye, fewzî beg [48] serperşitê beşê turkî u berisva pirsyar u nameyên tirkî di dave, ev rastye dinvîsandinên sernivîserî de der dikeve, dema dbêjît: ( geleg mirov ji min re nvîsn ku nzanin kirmancî bxunin, lewma min qismek tirkî cihrîda paş nho nîmê cihrîda xwe bi îltîzam xîreta xwarzî yê xwe, fewzî begê, tirkî tehb' bikem, fewzî beg srarduyê (Vabg) bê, lakîn... Ew jî rabî hat diyar xerîb), ev nvîsîne sernivîserî li hejmareya (16) rojnamê derket bu.) [49]

---

45. *Cemal Xeznedar, Murşid elsehafe elkurdye, bexda, 1973, r.17.*
46. *Idrîs 'Ebdula, Lebarey Rojnamegerî Kurdî (çwarde lêkolînewe), çapxaneya xanî, dhok, çapa yekem , 2008, r.1-2.*
47. *Cemal Xeznedar, h.b , r.17..*
48. *Fewzî Beg kurê xweşka 'Ebdulrehman Bedirxanî bû, endamî îtîhad û tereqî bû, efserekê 'usmanyan bû ji nû derçû bû ji ber zulm zordarya dewletê hatbû qahîre.*
49. Ferhad Pîrbal, *çend basêk le barey mêjûy rojnamenusî kurdîyewe*, r.39.

* Li sercem manşêtên jmareyên Rojnameyê; manşêtî mezin tenê li laperê yek u nehan de li ç Rupelên din nîne, wkotar jî prranîya wan bê nav u nîşanin, yêkuhebe jî tenê yek li du peêvîn kurt pêk hatibun.

* Li dest pêkê de biryar bu du hefte carek derbikeve, pênç hejmareyên yekemîn bi vî şêwey derketin, lê şunde ku li (Qahîre) ji bo (cnêf) were vekohestin, dîsan car din vegera ve (Qahîre) u çuye welatên din, mîna me li jorde jî amaje pêkrî derkrin u gehandina van hejmareyan ne karekê hasan bu, ji ber vê du hefte carek nehate derkrin u buye mehek belê ta hejmare (24) an jî her li ser hatibu nvîsandin ( pazde roj carekê were nvîsandin ), ta hejmare (25) an hingî li ser hat nvîsandin (heyvê carekê der diket). Ev çende jî xem xorî u rastgoya sernivîserî derdêxe beramber bi xwendevanê xwe. Rojnameya henê zimanihalî komela syasya Kurdî bu, ku li sala 1897 an (Mîqdad medhet bedirxan) di gel komeleyeka roşenbîrên Kurd li stenbolê damezrandî, lê derfet li stenbolî ji bo nehatibu rêkxistin, ev çende jî yek ji wan sedeman bu, ku mîqdad beg pal bi de Ru li qahîrê bike, syaseta rojnamê weha bu li rêka deqên ayetên pîroz de amaje bi mafên netewa xwe dikir u bi awayek weha hatibu nvîsandin ku bandora wê li ser xwendevanên Kurd hebe).[50]

Rojnameya Kurdistanê jî mîna vê rewşê nêzîkê turkên cwan bu, lê ji sedema ku ji aliyê fkir u ramanên xwe ne kohrîbun u hê sultan ebdulhemîd jî ji ser text bu, ev Rojnameye hat girtinê, mîna li jor de jî me got bu ku di Rojnameya (Kurdistan) de xenêcî nameyên xwendevan  nvîsî hemu li hêla Mîqdad Medhet Bedirxan u 'ebdurehman Bedirxan ve werne nvîsandin, lê belê di Rojnama (Roja Nu) ya hejmare sêyemîn de, di sala 1943an dij hêla Celadet Bedirxan re tiştek weha nvîsî ye:

(welê di xuyaye ku hîngî mîqdad beg ji birayê xwe yê mezin emîn 'lî beg yê ku hingî li stenbolê jbo nvîsan xwet bun, ji birayê xwe yê bçuk re dnav nivîserên din de teqrîrek jî rêkribu, lê na be navê xwe ji ber ku nkarî bu lê belê bi navê ( Lawê Şêx E.Fetah)).[51]

50. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, r.17.
51. Dilgeş Felat, *b.n.b*, r.194.

Di virde di were zanîn ku emîn ‘Elî beg ji Mîqdad Medhet Bedirxan re nvîsînek şandîye, di vê yekê de em dikarîn bibêjîn ku ew nvîsîn bê nav hatne nvîsandin, dibe dibeşeka wan ji hêla emîn ‘Elî beg hatbe nvîsandin, hîn nvîsên din jî hebun li gorî rêza jmaran kesên ku name teqrîz nvîs u helbestên wan di Rojnama (Kurdistan)ê de di weşandin mîna:

1. Hacî Qadrê Koyî
2. Ahmedê Xanî
3. Law Şêx A.Fetah [52]
4. (ş.m) Ji eşrafên Diyarbekrê
5. Mela Salihê Czîrî
6. Şêx Hesen
7. Mîr Cigerxun
8. 'Emer Fewzî
9. Reza
10. Reuf Qullrî
11. Seyd Tahrê Botî [53]

( Mîqdad Medhet Bedirxan) tewera çandî gelek giring di dît u ji bo vê yekê di hejmareya sêyemîn ya Rojnameyê de dest bi çapa (mem u zîn) a ehmedê xanyê nemir kir, ji bo vê yekê di hejmareya duyemînde wha derbas dibe: (her cihrîdekê de ezê ji wê ktêba (mem u zîn) henê binvîsîm, heta xlas dibu... Ew ktêb pêşî du sed salan hatiye nvîsandin, hin derê wê heşfîne, nayên xwandin, derên nayên xwandin înşaellae ezê bi karbim bi xwe temam bi kem, hek jvê ktêbê destê yekê de hebt, ez hêvî dikim ji min ra rêkt de ez ya li destê xwe de rast bkim beşê ezê dîsa ktêba wî jê re rêkim, nyata min ezê wê ktêbê tebî jî bkim, heçiya vê bla nuho ve ji min re binvîse).[54]

---

52. Ferhad Pîrbal, *b.n.b*, r.39-40.
53. 'Elaedîn Secadî, *şorşekanî kurd, çapxaneya me'arf*, bexda, 1959, r. 51.
54. Dilgeş Felat, *b.n.b*, r.86.

### 1.3.2 Sedema Derketina Rojnameya Kurdistan

Peydabuna hertişt di jiyanêde, hinek sedem di piştre hene, Rojnamegerya Kurdî her jdestipêka peydabun u geşekirnaxwe, di hundirê cvaka Kurdewarî de buye, ji berku Cihê cugrafyê miletê Kurd hevsuy hinek mlletaye, ku li herdem u cihekê delîve ji bo desketî;bizava nehêlana miletê Kurd daye, lê (di encama wê tepeserî u jêrdestya gelê Kurd bi drêjya sedan sallan têde jyayî, dagîrkarên Kurdistanê jî hertim bi hemu şyanên xweve bzavkiriye dîru ka gelê Kurd u nîşanên wî yên netewayetî jnavbben u windabiken, merema dagîrkaran jî jivê bzavê ew buye daku zêdetir berdewamyê bdene jyê dagîrkarya xwe li Kurdistanê, hemberî vê yekê jî gelê Kurd nemaze kesayetiyên zanaw u reoşenbîr li her cihekê u li her demekêde delîvek bu çê bbe dîru ka xweya tumar krî, u şunewar u nîşanên xweyn netewîy dayine nasîn).[55]

Bi vê yekêRojname u karê Çapemeniyê mîna çirkeyek ji bo berevanîkrinê dijî dujminî bi karanye, heta bi karbe li pey şyanên xwe miletê Kurd ragre, dîsan bi derketina Rojnama Kurdistan ( despêka varêbuna reoşenbîrya Kurde ji dagîrkar u wistemkarên Kurdistanê, vegerandne ji bo azadî derrbrrînê hemberî destellatdarên dîktatur ).[56] yanî bi awayek giştî dikarîn bêjîn derketina Rojnama Kurdistan ji bo ((xizmeta kêşa wê ya neteweyî bu))[57]bivê yekê Rojnama Kurdistan giringyeke zor mezin bi hemu Mijarên jiyana Kurdewarî di de mîna ( ziman, ayin, netewe, keltur, reoşnibîrî...). Li prranya kotar u nvîsînên Di hundirê rojnamêde hatîne bellavkrin, bi herdu zimanên (Kurdî-turkî) hemu bi duza miletê Kurd re grêdaye, hezkirne miletê Kurd ji bo hercihek li cîhanê bden nasîn, dîsan giringyeke zêdetir bi dîroka miletê Kurd de, jberku (( bi hurî pêde çunekê bi berperên (Kurdistan) êde bikeyn, dê gehîn rastyekê ku Rojnameyeya henê, yek ji çaktirîn jêderane ji bo dîru ka wî çaxî Rojname têde derketî )).[58]

---

55. Musediq Tuvî, *çend berperek ji dîroka rojname vanya kurdî*, pişka dûyem, çapxaneya hawar, Dihuk, 2011, r. 11.
56. Newzad ‘Elî Ehmed, *Rojnamegerî Xuyindkaranî Kurd le Ewrupa û Emrîka 1949- 1991*, çapa yekem, çapxaneya îşk, slêmanî, 2008, r. 15.
57. Reşîd Findî, *çend tîrujkek li ser rojnamevanya kurdî*, çapa yekem, çapxaneya ruşnibîrî , hewlêr, 2012, r. 11.
58. Musediq Tuvî, *çend berpere ki j dîruka rojnamevanya kurdî*, r. 13.

Bi awayek giştî vyayine her Kurdek xudan nasname u dîrokaxwe bi bilindî hellsengîne, jberku dîrokê giringyeke zor mezin ji bo hermilletekê li tevaya cîhanê heye, Kurd jî li demê derketina vê rojnamê pêdivî bi hindê hebu, ku dezgeyek yan rêkxistye ki were u behis li (binyat, ziman, kiltur, netewe, ayin)ê Kurdan bike, u li jêrdestellata dagîrkaran de derbêxe.

**1.4 Derbarey Çapemenîya Kurdî**

Her jçaxên kevinde her rêkxistî u aliyek siyasî ya rewşenbîrî ji bo gehandina peyama xwe, ber bi Çapemeniyê re çuye ji bo diyarkirna Xebata xwe ya rewşenbîrî u siyasî u çekdarî mîna pêtivyeke serdemane. (( Rojnamegerya Kurdî didemekê sextde derbazbuye, wRojnamenvîsê Kurd bvî awayî belingaz u zulm lêkrî maye. )) [59] Her di berisva vê pirsêde Ahmedê Xanî li pêşî pîtir ji sêsed salan bhelbest berisva me daye dema kotîye:

***Gerdê hebuwa mejî xudanek***
***'Alî keremek Letîfe danek***
***'Ilm u honer kemal u îz'an***
***Şî'r u xezel u ktêb u dîwan***[60]

Yanî nebuna deshelatdaryeke Kurdî ya serbixwe, sedemê serekî bu nedhêşt Çapemenî u rewşenbîriya Kurdî ber bi pêş bçe, u Rojnamenvîsê Kurd herdem li bin dest u zulm lêkirî maye, belê xemxorên Kurd li her Cihê sînahyek dîtbe, pêngavek havêtye u berek danaye ser dîwarê Rojnamegerya Kurdî. serkêşê Rojnamenvîsên Kurd (Mîqdad Midhet Bedirxan) [61]buye, dema dîtî mîletê Kurd pêtvî Xebata qelemîye, bi fer dît Rojnameke Kurdî belavbike, lê li bin sîbera sultanên usmanî nebuye,[62]

---

59. Musediq Tuvî, *çend beperek ji dîroka kurdî*, beşa yekem, çapxana kulîja şerî'etî, Dihuk, 1999, r. 6.
60. Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, hejar mukiryanî , 1989, b.ç , r. 20.
61. Mîqdad Midhet Bedirxan, derbara Jiyana wî bi nêre: Hugir Tahîr, *b.n.b*, r.269.
62. Musediq Tuvî, *çend beperek jdîroka kurdî*, r. 7.

Belkî li wlatê mîsrê li Roja 22 ya nîsana sala 1898 ande hatiye belavkrin, u heta Roja 14 ya nîsana 1902 an berdewambu u (31) hejmar jêre derketin.[63] u di gel derketina Rojnamegerya Kurdî ( bizava netewî ya Kurdî rêyeke freh u kur girte ber hemberî zulm u stema hukmeta 'usmanî ).[64]

Li tewerê bihurî de bi drêjahî me behsa Rojnama Kurdistan kiriye, lê her dema behsa Rojnamekerî u Rojnamegerya Kurdî tê krin dvê îşaret bi Rojnameya henê bê krin, dîsan di gel navê wê bnemala Bedirxanyên Xebatkar u ew xizmeta pêşkeşî mîletê Kurd krî bi bîr dînîn, u kurtya li jor tenê amaje pêkirne. Piştî Rojnama Kurdistan li sala 1900 an u şunde, çendîn Rojname u kofar derketin ji her yekê kurtîyekê di deyne aşkerakirin.

### 1.4.1 Çapemenîya Kurdî li (1900)-(1914)an

Piştî derketina Rojnameya ( Kurdistan ) li sala 1898 ande, li ser destî bnemala Xebatkar u şurşigêr ya Bedirxanyan, were zanîn despêka Çapemenîya Kurdî, her çend derketina wê li hundirî Kurdistanê nebu, niha çendîn Çapemenî lsala 1900 an u virde wern baskrin, bi vî awayî:

#### 1- Rojnama Umêd (1900)

( Rojnameka nîv mehane bu murkeka siyasî u olî li ser zalbu, dîsan li Qahîre ji aliyê (Mehemed Salih Bedirxan) ve derketiye, pêkhatibu ji çwar ropelan,[65] tenê hijmare yekem jêre hatiye dîtin, ewa li berwara (1) îlona sala 1900 an derketî bi zimanê turkî u 'erebî belavbuye,)[66] u bi duyemîn Rojnama Kurdî were zanîn piştî Rojnama Kurdistan (1898-1902) u heta vî serdemî nehatye zanîyn bi dirustî çend hejmar lê derketîne, u sedemê seknandna wê çi bu? Di hundirê roj namêde diyardibe ku semta giştî ya wê rexneya sultan ‘Ebdulhemîdê duyem (1876-1909) bu brengekê olî siyasî,

---

63. Ferhad Pîrbal, *b.n.b*, r. 21.
64. *Kurdistan yekem rojnameya kurdî*, gera sêyem 1917-1918, kumkirna Kemal fuad, slêmanî , 1998, r. 10.
65. Kunê Reş, *Komel, dibistan, kofar û rojnameyên bedirxanyan damezrandîn*, kofara Dihuk, hijmar(4), Dihuk, r. 15-18.
66. Yekemîn kes amaje daye rojnamê (Malmîsanij) bû, di pertuwa xwe de ewa bi zmanê turkî li bin navê: *(Abdulrahman bedirhan ve ilk kurt Gazatesi)*

Wehe diyardibe ku xudyê (umêd) ev şêwaze girtye ber mîna dijkarek hemberî syaseta (Bab el'alî), duy çaxîde di yek rêzkirna li bin navê (kumkara îslamî)[67] di were naskrin di berjewenda dewleta xwede ewa sistî wlawazî ketî têde. ji kotarên hejmareya yekemîn ya li bin navê (Diyariya Jubîlye- ewê şerm neket), aşkera kiriye ku Rojnamefan giringî daye kar u şaşyên walyan, dîsan Damezrandina xanyê honeran li stembolê, nivîser di pirsyarekêde diyardike sultan muradê pêncan (1876) ku bi kesê (bêkonah u zulm lêkrî) naf lê anî bxurtî dest ji deselatê ji bo ('Ebdulhemîd) î berdabu, dergehê duyem ji bo (hedîsên pîxemberî wgotnên mezinan, bi zimanê turkî w'erebî bu, dîsan bi mfa wergirtin ji şroveya hinek ayetên qurana pîroz wergirtîne u krîne behaneyên bi qwet ji bo rexneya sultanê usmanî).[68]

## 2- Kovara Kurd Te'awn u Tereqî Xeztisî: (1908-1909)

(( Li pey serketna Darbeya tîrmeha 1908 an li dijî sultan 'Ebdulhemîdê duyem, u piştî Damezrandina komeleya (te'awn u tereqî) ya Kurdî li 25 îlona 1908 ande, komeleya henê rabu bi derxistna Kovara (te'awn wtereqî xeztisî) mîna zimanihalê wê u helbestvanê xelkê sulêmanyê (pîremêrd) helbjard ji bo berpirsayetya kofarê, dîsan ehmed cemîlê diyarbekrî weku sernivîskarê jêre hat helbjartin, kofar li çapxaneyên slanîk u merkez li stanbolê hate çapkrin ))[69] pîremêrd di kotareka xwede dibêje: (( bewe denazm ke xezetey Kurd le stembol min xawen u sernuserî bum )).[70]

Newşêrwan Mustefa di pertuwa xude (çend lapereyek le mêjuy Rojnamevanî Kurdî), derketina gofarê li ((22 çirya yekemîn ya sala 1908 ande aşkra dike, u hijmara dawyê ku nuyeme li 17 kanîna duyem 1909 ande derketiye u hatiye girtin, u heme dbu (88) ropel )).[71]

---

67. Kumkara Islamî: *alyekê syasî bû li rojhelata wlatê musilmanan li çerxa nuzdan aşkera bû*, mebesta wî hezkrin ji bo bi karanîna peywendyên brayînî bû, û hefkarya îslamî ji bo derxistna musilmanan ji çerxên taryatyê ber bi ronahî û freya çerxa nû.
68. Hugir Tahir Tufîq, *b.n.b*, ri .232.
69. h.b , r. 141.
70. Newşêrwan Mustefa , *b.n.b*, ri . 78.
71. *h.b* , h.r.

‘Elaeddîn Sucadî di pertuwa (Mêjuy Edebî Kurdî) de u Celîlê Celîl u hinekên din ji hijmareka dîrok nvîs u Rojnamenusan munaqşe li ser navê Rojname ya kofar ji bo vê ropela Kurdî kiriye, u birastî kofar buye nek Rojname li pey pêdaçuna zêdetrî vekoleran, u hijmara ropelên wê dnîvbere (12-16) ropelan bu, xwedyê wê navê (xeztisî) ji bo danabu li wî çaxî bi manaya rojnamê dihat,[72] belê li pey van herdu xalan aşkera dibe ku ropelên hatîne baskrin wern hejmartin kofar:

**1-** Pêşî her tiştê ew mîna kofar derketiye; ne rojname, çku li wî çaxî kofar u Rojname di bernasbun di nava Rojnamevanande u hemuyan cudahya di nîvbera wande di zanî.

**2-** Ger vê kofarê bi Rojname bi nasîn, çku xwedyên wê peyva (xeztisî) lêkiriye; bvî awayî Kovarên ( Rojî Kurd u hetawî Kurd u bangî Kurd ) ewjî wern hejmartin Rojname, çku wana jî ef nave bkaranye, u dikarîn bbêjîn dmaweya 1898-1918 ande hîç kofarek derneketbu, u cudahîyek mezin di qebareya Rojnama Kurdistan 1898-1902 an u te'awn tereqî xeztisî u Rojî Kurd de hebu , di camêde Kovara navhatî bi kofar were hejmartin.[73]

( Derketina vê kofarê mebesteka siyasî bu, li bin navê wê bi turkî hatibu nvîsandin: (cem'îtk waste neşr efkarîder) manaya wê: " egera parvekirna hzir u boçunên komeleyê " bu. Mdurê wê (sulêmanyelî tewfîq) li hejmara yekem di gotarekêde bi turkî ev mesele Runkiriye).[74] di gelek çavkanyên dîrokîde navê ( kur te'awn wtereqî ) hatiye lbin navê (Kurd), yanî hatiye kurtikrin, mîna hugir tahrî jî bkaranye, (( di nîva ropelê yekem ya pêşîya kofarê weha nvîsandibu: ( niha heftyê carekê derdcih ) , aşkera kiriye ku Kovareke ( olî, zansitî, siyasî, edebî, civakî ) ye, (Kurd) yekemîn çapkirya Kurdî bu ku wêne (şikil) di hejmarên xwede belavkirîn, u dher nee hijmarande dwanizde wêne berçavkirbun.

---

72. Çêdibe ew alozye peyde bbe, ji nebûna çi peyvên hemberî zaravên rojname û kofar dizmana kurdî de, btaybet ta demek drêj bi ser de bi horî , peyva (rojnawe) bo yekemîn car di hejmara dûyem ya kofara kurd de hatye, ewa l1913 derketî, dîsan di were zanîn ku di nameyke pîrozbahîya xelîlê xeyalî de, sê caran ev nave bi karanye, û bûye yekem rojnamevanê kurd ev zarave bi karanî.

73. Hugir Tahir Tufîq, *b.n.b*, ri .143.

74. Newşêrwan Mustefa, *b.n.b* , ri . 79.

Bê goman wêney mifayekê zaf heye u tekezê ji pêzanînên hur dike, bê ku bi wern nvîsandin, u alîkarya wêney ji bo çespandna pêzanînan di hzirkirnêde.))[75] Nvîsevanên her du beşên turkî u Kurdî yên (kur te'awn wtereqî) Kurdên nasyar u navu dengibun ji xelkê stembolê bi xwe, u Kurdên nafçeyên cuda cuda jî têde hebun mîna (Slêmanî, Hewlêr, diyabekir, ercîş, melatye, bidlîs, u erzincan. U mdur u xwedî îmtiyaz u sernivîskar jî (sulêmanyelî tewfîq) bu, ku li şunde bi navê hacî tewfîq begê pîremêrd derkeft, helgirê şehadeya hquq bu, li pêşî derxistna xezetê bi turkî u farsî gelek babet li Rojnameyên stembol u taran de belavkirîne, bi turkî helbestên serketî nvîsandne.[76]

### 3- Rojnama Şerq u Kurdistan (1908)

Dîsan li Darbeya tîrmeha 1908 an u şunde ev Rojname li stembolê derket, u ehmed şerîfê herisklî u îsa'îl herisklî mdurên wê yên berpris bun, u sernivîskarê wê (bedrî melatî) bu,[77] tenê yek hejmar jêre hatiye dîtin, li berwara 19 çirya duyem 1908 ande, Rojname bi zimanê turkî bu, u jiçwar ropelan pêkdihat).[78]

Di ropela yekemde nvîsandibu (niha heftyê du caran derdiçe) dîsan nvîsandibu, ku (Rojname barê syasyê rojhelatê diyardike u kîmasyên Rojava hemberî mirovatyê), ji hundirê hijmara yekem ya şerq u Kurdistan aşkeradibe; behsê çend meseleyên giringên Kurdistanê kirîye, zêdebarî wê yekê bi rengekê giştî Yeketiya padşahîya usmanî parastye).[79]

Rojnama navbirî di hundirê xwede, mîna Çapemeniyên din cuda nebuye ((di daxwazkirna mafên netewyên Kurd, u were hejmartin yekem Rojnama Kurdî ku daxwaza damezrandina xwandingehên bilind krî li Kurdistanê, mîna pêşnyaza (Se'îdê Nursî), zêdebarî çarçovê usmanî derneketbu, belê di xwest Kurdan taybetmendiya xwe hebe )). [80]

---

75. 'Amir Ibrahîm Qendîlçî, *Me'lumat Sehefye û tewsîqha, dezgayê ayf ya çapê* , bexda, 1981, ri .46.
76. Newşêrwan Mustefa , *h.b* , h.r.
77. Tiştek ji Jiyana wan bi dest me neketye.
78. Malmîsanij, *Abdulrahman bedirhan ve ilk kurt Gazatesi* , ri . 24-26.
79. *h.b* , h.r.
80. Hugir Tahir Tufîq, *b.n.b*, ri .143.

**4- Rojnama Peyman (1909)**

((Dîsan piştî Darbeya 1908 ande, (yekbuy) rabun bi derxistna Rojnama (peyman) mîna Rojnameyeka heftyane, li bajarê diyarbekrê, li 15 ê xizîrana(1909) an, xwedî u serpişkê wê (mîr katb zade şukrî) bu)), [81] Rojnama peyman jberku xwedyê îmtiyaz u mdur wsernivîskarên wê Kurdibun, wi cihê ku derketbu ji bajêrekî Kurdistana turkya bu. vê Rojnameyê mîna Rojnameyeka Kurdan were hesbandin, Rojnameya xwesera ku li diyarbekir herî pêşî derketî ye Rojnameya (peyman) e,vê Rojnameyê destura xwe jhezîrana 1909ande hildaye u nêzî çar hefte şunde, li (29)ê hezîrana 1909ande dest bi çapê kiriye).[82]Rojnama henê li gorî (Hilmi zya), çil u heft hejmare derketiye.[83]

**5- Rojnama Amîd u Sewda (1909)**

Derbarê Rojnameya henê de, çi zanyaryên dirust li berdestamede tunene, ev Rojnameya li bin navê ( amîd u sewda ), amîd bi wataya amîdareş navê diyarbekrê ye yê pêşîn, di berga vê Rojnameyê de weha hatiye nvîsandin, (xwedyê îmtiyaz u mudur: şukiryê diyarbekirîye, ji bo welatê usmanîye, ji bo welatên din jî carna postidkrin, her jmareyeka wê pênç Rupel bu, Rojnameyeke zansitî u hunerî wicivakî u edebîye, her pazde rojcarekê derdikeve). [84] ( Rojname li 14ê şiwata sala 1909 ande li stembolê bi zimana turkî şeş hejmarên jêre derketin, lê pirtukxana mîllî ya ku li enqerê ye aşkerakiriye[85], ku Cihê derketina wê diyarbekrinîşandaye, vê tevlevyê ji bernavê çapxana vê Rojnameyê ye ev Rojname di çapxana (diyarbekriçaramîd)de hatiyeçapkrin, di hundirê Rojnameyê de hinek nvîs u gotnên pêşyan yên Kurdî hatîne çapkrin. Li gorî ku (şevket beysan oxlu) dinvîse; Rojname jaliyê emîrê diyarbekrî di were derxistin, xwedyê wê mehmed şukiryê diyarbekrî bu). Sernivîskarê wê (‘Elî emîrê diyarbekrî) ji alî hezkirna pirtukanve meşhure[86],

Nêzî (çarde hezar) pertukên wî hebun u ev pirtukan pêşkeşî pirtukxana mllet ya li stembolê hatiye avakrin.

---

81. *h.b*,r.236 .
82. Murat AKTAŞ-Mehmevt YONAT, *Dîroka Çapemenya Kurdî Dema Osmanya*, r.6.
83. Malmîsanij û mahm ûd lewendî,*Li kurdistana bakur û rojnamegerya kurdî(-1908 1992)*,Ankere, r.49.
84. Murat AKTAŞ-Mehmet YONAT, *Dîroka Çapemenya Kurdî Dema Osmanya*, r.66.
85. Kaya. *F.KùRrt. Basini*, Hivda ILetişim, Istanbul , r. 90-89.
86. Ji bo Zanyarên Zîdetir binêre "Oral, Fuat Sùreyya, *Tùrk Basin*, Tarihi, Kitab II, Ankarar, 1968 ,r.267.

**5- Kovara Meşrotîyet (1909-1914)**

Kovareke siyasî destorîye, (şerîf Paşay) li parîsê derxistye, u urgana (parta radîkalya usmanî) [87] bu, ew urgana şerîfî bi xwe li parîsê damezrandî, piştî li dijî yekbuyan rawestyay ji sedema syaseta wan ya şufênî piştî nîsana 1909 ande hemberî usmanyan.[88] (Meşrotîyet) bi manaya fermanrewayya destorî, ( şerîf paşay bi zimana frensî der dxist; hejmarên wê dnîvbera salên (1909-1914)de nêzî (55) heban bun, li pêşyê bi şêwê Rojnameke mehane bi çwar ropelan derdiket, hejmara yekemîn li 15 çirya yekem li sala 1909 ande derketiye, heta hejmar yazde li 1 çirya yekem 1910 ande, Meşrotîyet dibe kofar u hejmara ropelan nekêmtir dibe ji (50) ropelan u her mehê carek derdiket).[89]

Hejmarên Kovara henê bi rengekê zaf di pirtukxaneyên parîsêde parastîne, mîna pertuxana ( lankzu, nîştîmanî ) dîsan hinek hejmar di dbistanên Xebatê n asyewî u efrîqyayîda li lendun diwern dîtin, dîsan di pertuxaneya nîştîmanî li enqerê de.[90]

li ser Mijara boçunên kofarê, berevanîkrin bu ji berjewendî u mafên mîletê Kurd dinava dewleta usmanîde, u berdewambu li ser rexneya hukmeta usmanî ewa di destê yekbuyande dikir, u dakukî dikir ku parta yekbun u tereqî rêya zordaryê u xyanetê girtye, her ji çaxê hukim ketye destî li sala 1908 ande. Kovara henê were hejmartin yekemîn Kovara Kurdî ku kesekê Kurd bi frensî nvîsandibe, u sedemê derketina wê bi zimanê frensî ji bo aşkerakirna xrabyên dewleta usmanî hemberî Kurdan ji bo Rojava vedgere. Xuyindevanên wê dkêm bun, çunku hinek hejmarên wê di wundayine u kesekê ji bo zimanê Kurdî yan 'erebî ne vekohastye, jiblî (Ferhad Pîrbal) ku hinek parçeyên biçuk vekohastîne.[91]

87. Radîkalî: ji peyva (radix) hatye wergirtin, bi manaya wan kesan were, yên ku di vên sîstema cvakî ji rî û rîşala bi gorn.
88. Ferhad Pîrbal, *b.n.b*, r.42-43.
89. Ferhad Pîrbal, *kofara meşrotyet ya ceneral şerîf paşa*, t.terze fayq Cemal, kofara gulan el'erebî, hijmar(21), hevlêr, 1998, r. 80-81.
90. *h.b*, h.r.
91. Temaşeke Ferhad Pîrbal, *h.b* , r. 50-55.

Lê Cihê heybetê ye; nêzî nwet salan bmînît u kes li ser ne nvîse u bi xwendnefeya wê rabbe, belkî gelek ji Kurdan u rewşenbîran, her nedzanî "şerîf paşay" kofarek bi zimanê frensî derxistye, ger Kovara henê li ser mîletê Kurd ne axiftbe, belê her çawebe danerê wê Kurde; u jhemyê balkêştir ewe ku nuneratya Kurdan kiriye di kungreyê pêkhatnêde, yê ku li piştî cihnga cîhanya yekem li 1919 ande li parîsê werî bestin.[92]

### 6- Kovara Kurdistan (1912-1914)

Hinek rojnamenusên Kurd mîna Cemal Xeznedar u Mehemed mela kerîm, aşkera kiriye ku ("'ebdulrezaq Bedirxanî" li bajarê urmyê li rojhelata Kurdistanê li sala 1912 ande di gel hejmareke gencên Kurd yên bjare; Kovara henê derxistye, u piştî hukmeta Rusya qeyserî 'ebdulrezaq Bedirxanî ji nafçê derxistî , "smayl axayê şkak" berpirsatya wê xiste stuyê xwe, u heta sala 1914 ande berdewamkir li derketnê, belê kemal mezher bixwe goman li cem cêbuye li ser derketina wê).[93]

Belê dikarîn bi bêjîn bi rastî derketiye, çku ("'ebdulrezaq Bedirxanî"dnîvbere salên (1911-1914) ande, li Kurdistana rojhelat karkiriye, wkariye bi alîkarya "smayl axayê şkak" bi piştevanya Rusya qeyserî hinek rewşenbîyrya Kurdî li wê nafçê dabnît, mîna (komeleya cîhandanî), paşî yekem xuyindingeha Kurdistana rojhelat li bajarê (xuy) avedankir, u sîstemeka xwendinê jêre dana nêzî peyre u pRugrama xwendina rosî, lewre nahête durxistin ku ew bi derxistna Kovara Kurdistan rabuye, u goman heye kesê henê derxistbe; da bbe urgana komeleya wî, btaybet ku mezanî ku smayl axayê şkak kofarek xweser bi xweve derxistibu jêr navê (Kurd)),[94] ev çende wê dgehîne ku baweryeka mezin heye; ku smayl axay hzir u karê Çapemeniyê; ji 'ebdulrezaqê Bedirxanî wergirtye u fêrbuye.[95]

---

92. Hugir Tahir Tufîq, *b.n.b*, r.237.
93. Ji bo zêdetir zanyaryan bnêre: Kemal Mezher, *têgehiştna rastyê*, r. 77-78.
94. Kemal Mezher, *h.b*, h.r.
95. li sala (1914)ande, çendîn çafkanyan aşkera kirye ku mizgîndarên protistant bi alîkarya komeleyên elmanî li mehabadê kofareke din li bin navê (Kurdistan) derxistye, pîtir gringî daye rêzman û helbesta mîllî ya kurdî.

**7- Kovara Yekbun (1913)**

( Yekem kofar li stembolê li 1913 ande bi herdu zimanên turkî u Kurdî derketiye, mdurê wê (îbirahîmê Kurdî) bu, ji nvîskarên wê yên çalak (Salih Bedirxan) bu, armanca wê; dane nasîna Kurdan u bilindikirna cih u rêzgirtina wana dnav mîletên usmanîde.) [96]

Yekemîn kes li dor Kovara henê peyvî; kemal mezher buye, piştî rewşen Bedirxanê gotarên babê xwe yên vekohastî ji bo zimanê 'erebî ji bo hnartîn, ta niha nehatye zanîn ka çend hejmar jê derketne, lê di hundir kotarên (Salih Bedirxan) de; aşkeradibe ku yekbunê bi kêmî sê hejmaran derxistîne, ya yekem li 22 îlona 1913 an bu, u ya duyem li 2 çirya yekem ya 1913 an, u ya dawyê li berwara 13 çirya yekem li heman sal derketiye.[97]

(Salih Bedirxan) têde îşaret bi ptirya arîşeyên Kurdan dayine, u çareseryên koncay jêre wern dîtin, hertim daxwaza Yeketiya Kurdan kiriye; u dîsan daxwaz ji gencên Kurd kiriye; hewl bden nisbeya fêrkirnê li Kurdistanê berizbiken. [98]

**8- Kovara Roj Kurd (1913)**

Çend xwendikar u Rojnamenvîsên Kurd li sala 1913 ande, komeleya ( hîvya Kurdan) damezrand, u dest kir bi derxistna kofarekê li bin navê (roj kird),kofarê rêbazeka netewîy hebu, li ser bergê ropelên wê wêneyên mezine Kurdan hatibun danan mîna selaheddînê eyubî u kerîm xanê zend..., dîsan elf u bêyeka nu ji bo rêzimana Kurdî dana, u şunde navê wê were kohartin ji bo (hetawî Kurd) li sala 1914ande. [99] (( Kofarek mehane bu, li stembolê bi zimanê Kurdî u turkî dwere derxistin, u di (32) ropelande der dikeft u tenê çwar hejmar jêra derketin ).[100]

---

96. Malmisanij , *Li Kurdistana bakur û rojnamegerya kurdî*, r.58-59.
97. dîsan rewşen bedirxanê jî dîroka hejmarên henê dyar krîne.
98. Hugir Tahir Tufîq, *b.n.b*, r.237.
99. Fladîmêr Mînursikî, *elekrad mulahezat û întîba'at*, t.maruf Xeznedar, bexda, 1970, ri .44.
100. Gelek vekuleran behiskrîye ji wane: - Mînursikî, *elekrad mulahezat û întîba'at*, r.63.
- Mehemed Emîn Zekî, *Xulaset Tarîx Kurd û Kurdistan*, r.352.
- 'Elaeddîn Sucadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, r.552.

Dîsan Newşêrwan Mustefa di pertuwa (çend lapereyek le mêjuy Rojnamewanî Kurdî) de aşkera kiriye ku ( li sala 1912 ande xwendkarên Kurd li stembolê komeleyek jêr navê ( kird telebe hîwî cem'îyetî- cvata hêvî feqê Kurdan) dana, u destkir bi belavkirna xezetey turkî- Kurdî (roj Kurd). Xwedyê îmtiyaz u mdurê wê: (‘Ebdulkerîm hacî ‘Ebdula Kerkuklî zade) bu),[101]

Dîsan Mehemed emîn zekî di Damezrandina komeleyêde wek hev nebuye di gel vekolerên pêşîn u aşkera dike u dibêje: (( li sala 1910 ande listembolê (cem'yetî hîwî) hatiye damezrandin u heta şerê mezin yan hukmê kemalyan dewam kirîye)).[102]

Armanca kofarê li gotara hijmara yekem de bi turkî u îmzaya (rojKurd) li jêrde hatiye: ( (Xayet, Meslek) bi manya wê hatiye ji bo zelalkirna mebest u rêbaza armanca kofarê hatiye terxankrin bi zimanê turkî, u li gotara duyem ya bi zimanê Kurdî hatiye nvîsandin"cem'yetî Kurdî ji bo xidmetî Kurd buye, u duyem roj Kurd dîsan ji bo xizmeta Kurd hatiye meydana Çapemeniyê".

Ji nivîserên Kovara (Roj Kurd) bi herdu zimanê turkî u Kurdî, beşa turkî mezintir bu, u navê çendîn nivîser u Rojnamenusên şareza têde hatiye mîna: d.’Ebdula cihwdet, Baban zade, Isma’îl heqî, Baban 'ebdul'ezîz, Mehemed Salih Bedirxan, Kerkuklî necmedîn, xerbotay h.b, fexrî, medhet, slêmanyelî mes'ud, tuxan, lutfî fîkrî...hitd, u yên beşa Kurdî pêkhatibun j: slêman ‘Ebdulkerîm, diyarbekrî fikrî, fuad temu, Mehemed Salih Bedirxan, xelîl xeyalî li jêr navê (mudanî), benî erdelan ehmed muhsin, zêwer, fazl muxlis. Nivîser u Rojnamenosên henê bi herdu devokên sereke yên Kurdî, kirmancya serî u ya xwarê belavkiryên xwe nvîsandîne, u bihayê kofarê mîna li ser dawî ropelde hatî: sal hevde qroşe, u şeş meh neh qroşe). [103]

101. Newşêrwan Mustefa, *b.n.b*, r.102.
102. Mehemed Emîn Zekî, *Xulaset tarîx kurd û Kurdistan*, berga yekem, bexda, 1931, r. 315.
103. Newşêrwan Mustefa, *h.b* , r.104.

**9- Kovara Hetava Kurd (1913-1914)**

(( Piştî deselata usmanî li stambolê (roj Kurd), werî daxistin; Kovara (hetav) derket weku urgana komeleya Hîvî, ('ebdul 'ezîz Baban)[104]rêveber u berpirsê wê bu, semta Kovara henê ya netewî u Runakbîrî nehate kohertin, u li ser rêbaza (roj Kurd) berdewam bu, bi herdu zimanên Kurdî u turkî der diket, Kovareke mehanebu, belê li hejmara (4-5)ande hatibu aşkerakirin ku dê be nîv mehane, ropelên her hejmarekê (16-32) ropel bun )),[105] u tenê çwar hejmar jêrewerne dîtin, ewjî (1,2,3, u 4-5) dyek bergde derketin u 10 jî were dîtin. hejmara yekem li 24 çirya yekem ya sala 1913 ande li çapxaneya (resmilî kîtab) ça pi buye, hejmarên (4,5) bi hevre li 23 eyara 1914 ande, li çapxaneya (necim îstîqbal) çap buyne, dîsan li heman çapxane hejmare 10 l3 tîrmeha 1914 ande li çapê daye, di hejmara henêde piştî borîna salekê Wehe li serî werî nvîsandin:

***Rojnavey me sal 'ewelî îkî diqedêne***

***Rind derketnî salî tê lser hîmet wxîretê Kurda maye...***

Heta niha çi basek li destî to neye; ku piştî hejmara dehemîn ya kofarê, kanê dumkirîye yan ne.[106] Kovara Hetava Kurd piştî (Roja Kurd) derketî, heman armanc hebu, çapemenyeke bazirganî nebuye ji bo desketna perey, belkî xwedî peyamek netewî bu, tekez li ser hişyarkrin u handana xelkî ji bo xwendin u fêrbunê dikir, dîsan babetên grêday çandin u sîna'et whuner u dîroka Kurdî, u edeb wdanana ferheng u rênvîs u rêzimana Kurdî bun. [107] Her dîsan Hetava Kurd bi (belavkirna wêneyên kesayetiyên Kurd rabuye, ji bo danenasîna wan bo hevsuyên xwe, mîna ('ebdulrehman Baban) [108] li ser bergê hejmare (1) , u li hejmare (2) ande, wênê xêzaneke Kurd ji bajarê (aydin) li Kurdistana turkya hatiye danîn, pêkhatibu ji day u bab u du zarwan, u li hejmar (10) ande wênê mezine merdekê Kurd li bin navê (Şêx Mehemed nesret dîn efendî), u (Mehemed axa) li gel sê zelamên din ).[109]

---

104. Di pîtrî çafkanyên dîrokî jîna vî kesî nehatye zanîn û bzavên wî nehatîne aşkerakrin, tenê wek hevbûn li ser berpirsatya wî ji bo kofara henê.

105. Hugir Tahir Tufîq, *b.n.b*, r.185.

106. Newşêrwan Mustefa, *b.n.b*, r.132.

107. *h.b*, h.r.

108. ‘Ebdul Rehman Bbaban: *Ji navdartirîn mîrên mîrinşîna babane*, ji dawya çerxa hejdan û nîva dûyem ya çerxa nuzdande; hukim kirye. Bo zêdetir pêzanînan temaşeke: Mehemed Emîn Zekî, dîroka slêmanyê, bexda, 1951, r.102-103.

109. Hugir Tahir Tufîq, *h.b* , ri .186.

(Hetava Kurd) were hejmartin (yekemîn Kovara Kurdî xwedî peyamnêr li Kurdistanê, u çêdibe peyamnêrên henê her ew xwendkarbin; evên li stambolê di xwend u li dema te'tîlê vedgeryane Kurdistanê. ji sedema cihnga cîhanya êkê li havîna 1914 ande kofar ji derketnê rawestya, weku (znarislopî) aşkerakrî ku piştî daxwazkirna giştî ya leşkirê usmanî li sala nafhatî; pîtirya nivîserên kofarê ji bo xizmeta supay hatne daxwazkrin u bvî rengî nekarîn hejmarek din derbixen ).[110]

### 1.3.2 Rojnamegerya Kurdî li 'Iraqê

Pêşî yekemîn şerê cîhanî dewletek bi navê 'îraq tunebu, li wî çaxê tenê sê wîlayetên cuda hebun: wilayeta Bexda u wîlayeta mîsl u wîlayeta besra, ku her yek grêday babê 'alî bun li paytextê dewleta usmanî. ((yekemîn Rojname li Bexda (elzewra) bu, medhet paşay bi herdu zimanên turkî u 'erebî derdxist, li 16 xizîrana sala 1869 ande, u Roja henê bi Roja Cejna Çapemeniyê li ‘Iraqê were hejmartin, zewrayê 49 salan temenê wê hebu, heta dagîrkirna Bexda ji aliyê îngilîzan re li 1917 an, Rojnameya fermî ya hikumetê bu ji bo derxistin u belavkirna behis wyasa u fermanên hukmetê.

Duyemîn Rojname (elmusl) bu, ewjî bi herdu zimanên turkî u 'erebî derdiket li bajarê mîsl u were hejmartin Rojnameya fermî ya wilayeta mîsl, li 1885 derket u heta 1918 an, caxê îngilîzan wilayeta mîsl girtye dest berdewamî kir. Sêyemîn Rojname (elbesre) bu, li sala 1889 ande, li besre bi herdu zimanên turkî u 'erebî dwere derxistin, u ewjî Rojnameya fermî ya wilayeta besre bu, jyê wê heta despêka cihnga cîhanya yekemîn bu li 1914 ande, dema îngilîzan wilayeta besre girtye dest.))[111]

Heta 1908 ande li hersê wîlayetan tenê Rojnameyên henê berdewambun, u (( li ragehandina şorşê u şunde, Rojnameyan çi azadîyek lê tunebu, belê li wilayeta Bexda li dema dnîvbera (1908-1918) ande, nêzî (51) Rojnameyan u (20) kofare yên cuda cuda yên ( edebî, civakî, rewşenbîrî, siyasî, ulî, u kumêdî ) bi turkî u farsî u 'erebî u Kurdî, wern belafkirin u yek jiwana (Banga Kurd) bu )),[112] ku dibe yekem çapa Kurdî li ‘Iraqê derbikeve.

---

110. Hetava Kurd, hejmar (10), 3 ê tîrmeha 1914, r.4.
111. Newşêrwan Mustefa, *b.n.b*, r.158.
112. *h.b*, r.159.

**1- Kovara Banga Kurd (1914)**

Derbarê yekem rojnamegerya Kurdî li ’Iraqê ( li ser destê Cemal Baban[113] li Bexda buye li sala 1914 ande, kofarek li bin navê (Banga Kurd) bi herdu zimanên turkî u 'erebî li Bexda derket, pênc hejmar jêre derketin whejmarên wern dîtin (1,3,4) u li çapxaneya (adab) li bexdayê çap buye, çendîn kotar li ser Kurd u Kurdistanê belavkirîne u du babetên sereke wern vegirtin ewjî neteweya Kurd u dîroka Kurd bu, karkiriye ji bo belavkirna perwerde u rewşenbîryê li naf mîletê Kurd u baştirkirna rewşa civakî u aburîya Kurdistanê li wî çaxî, u hewildan ji bo Damezrandina kumelgehên zansitî ji bo pêşketina cvakê Kurdî, hejmara ropelên kofarê 24 bun bi qebarê nîvê, piştî derketina hejmara pêncem, ji karî rawestya sedemê wê ji bo helkirna agrê şerê cîhanya yekem di zivre, u çuna nvîsevanên wê ji bo bcih anîna erka leşkerî, navê Banga Kurd bi zimanê 'erebî yanî (Nîda elkurd) ).[114]

( Gelek dîroknivîs u Rojnamenvîsan li ser Banga Kurd qese krîne mîna: pîremêr, ‘Elaeddîn Secadî, kemal mezher ehmed u hinekên din, çendîn zanyaryên kurt u şaşî li ser dîroka derketina wê berçavkirîne, belê li dawiya van nêzîkan; ‘Ebdula zengene u sedîq Salih u refîq Salih karîn sê hejmaran bi dest bxen ku (1u3w4) bun, u sedîq Salih bergên van hejmaran bi hevberkirnê di gel boçun u gengeşekirna dîroknivîsên werî baskrin, aşkrabu ku derketina wê li (1914) ande buye).[115] whugir tahîr dibêje ev hersê hejmare dayine min.[116]

Dîsan newşîrwan Mustefa diyardike (( ku mdur u xudyê kofarê (Cemal Baban) hejmare (1) li 12 rebî'ul ewel l1332 an mşextî hemberî 8 ê şiwata 1914 ande derxistye, u tenê sê hejmar hebun u ropelên wan hemuyan bi hevre dbune (96) ropel, bi turkî u Kurdî bi zaravê kurmancya xwarê derdiket,

---

113. Cemaludîn Baban: navê wî Cemal kurê reşîd kurê ‘Ebdula beg kurê xald paşa ji malbata babane, li sala 1893 zi l bexda jday bûye, li sala 1914 an bawernameya maf wergirtye, li sala 1920 ande li dadgehên bexda û mîsl û sulêmanyê karkirye, li 1928 ande bûye nûnerê hewlêrê li cvata nûnerêt 'îraqê, li 1930 ande bo wezîrê dad û şûnde çendîn wezaret wergirtîne, l1965 ande li beyrotê wexera dawyê krîye. Ji bo zêdetir zanyaryan temaşeke: Farûq ‘Elî 'Umer, *b.n.b*, r. 56-57.

114. ‘Ebdulrezaq Elhusnî, *Tarîx elsehafe el'îraqye*, beşa yekem , çapasêyem , çapxana el'îrfan, seyda, 1971, r.22-23.

115. Ji bo zêdetir zanyaryan bnêre: gutara kofarî Bangî Kurd 1914, Kurdistanî nwê, hejmar (2517-2518), 2001.

116. Hugir Tahir Tufîq , *b.n.b*, ri .199.

Babetên turkî di hundirêde zêdetir bun, nvîsevanên beşa turkî pêkhatibun j: şukrî fezlî, Cemaledîn Baban, Baban heq bek, fikrî, slêman bek, xakî bexdadî, rizwan behşitî, ...hitd,

Belê li beşa Kurdî, dîsan bi îmzaya xwedyê wê were bi rêvebrin di gel du kesên din li bin navê behşitî u sidqî wdîsan 'arf saîb u zêwer jî du helbest dhundirda belavkirbun )).[117]

Jibabetên wê diyarbe ku terxan kirbun ji bo zansit u zanînê wperwerdekrin u bilindikirna fikrî u cvaka Kurdî dinava xêzana usmanî mîna endamekê zîndî u bhêz u rewşenbîr. Piştî berpabuna şerê cîhanyê yekemîn u dabeşkirna Kurdistanê ji bo çwar parçeyan li qelemrewê usmanî u qaçara îranî derketina Rojnameyan tunebu, belê li derveya deselata wan (têghiştna rastyê) li Bexda derket, ku li bin destê deshelata brîtanî bu li wî çaxî.

**2- Rojnameya Têgehiştina Rastiyê (1918)**

Her dîsan ji belavkiryên deshelata brîtanî li nafçeyê, li (bexdayê Rojnameya (têgehiştna rastyê) derket mîna Rojnameka siyasî u civakî ya heftyane, hejmare (1) li kanuna duyem li sala 1918 ande derket, u tekez li ser wê yekê dikir ku raya giştî bzanbe berjewendîya mîletê Kurd bi hevraye di gel brîtanyaye, u pêtivye dijî hezên turk u elmanan li navçeyê bseknin, (67) hejmar jêra derketin heta kanuna duyem ya 1919 ande ).[118]

Derketina Rojnameya henê ji aliyê îngilîzan re çend merm jêra hebun, u derketina wê mîna ( qunaxeka nu ddîroka Rojnamegerya Kurdîde were zanîn, çinku ji aliyê rewşenbîrên Kurd derneketbu, belkî ji aliyê deshelata îngilîzî bu, u despêkadestwerdana derekî bu ji bo Rojnamegerya Kurdî, dîsan ji du alyan were aşkerakirin, yekem mîna ragehandnek ji bo deselatê u berhingarbuna Kurdan hemberî turkan, u ya duyem danpêdanek aşkerabu bi rewşenbîrî u hişyarbuna gelê Kurd, u boye prek dnîvbere wan u deshelata îngilîzî li navçeyê, jiblî tewerê siyasî Rojnameyê giringî bi ziman u edeba Kurdî jî daye, u goşeyek jêre terxankirîye her ji hejmara 16ande.[119]

117. Newşêrwan Mustefa , *b.n.b*, ri .160.
118. Kemal Mezher, *b.n.b*, r .271.
119. Bedirxan Sindî, *Cvaka kurdî di dîtneva rojhelat nasîde*, hewlêr, 2002, r.17.

(Xizmeteka zav ji bo kirîye, dema hinek zarav u qseyên taze xistîne hundirî zimana Kurdî, dîsan giringî daye bnavdarên dîrokyên Kurd u were nasîn yekemîn Rojname peywendiya Kurd u mîdîyan aşkerakrî ).[120]

Ingilîzan bi ryêa rojnamê karîye hestê Kurdan ji xwere bi kêşe, u Banga wana dikir ji bo helgirtina çekan dijberî turkan, u bo wana were aşkerakirin ku daxwazên wan bcih nahên; gereke bdestê îngilîzan nebe, ( gazyên wana zor bun btaybet piştî Banga Kurdan zêdetir buy ji bo gehiştna dewleta usmanî, xweser ji aliyê karmendên Kurd evên li dezgayên dewleta usmanî kardikir, her dîsan seRuk 'eşîr u kesanên olî. U piştî meremên Rojnameyê yên sedemê derketina wê nehatîn cih anîn u korîna syaseta brîtanî hemberî Kurdistanê, deshelata brîtanî biryara rawestana wê derxist, Rojnameyek din li slêmanyê li bin navê (pêşkewtin) li Cihê wê derxist).[121]

### 3- Rojnameya Pêşkeftin (1920)

Piştî herfandna hukmeta yekemîn ya Şêx Mehmud li xizîrana 1919 ande wundakirna wî ji bo wlatê hindê, ( (Mîcihrsun) dest bzincîreyeke karên îdarî u rewşenbîrî krinb merema rehet buna xelkî u mukimkirna deselata xwe li nafçeyê, u jiwana anîna çapxaneyê ji bo slêmanyê u derxistna Rojnameya li bin navê ( Pêşkeftin -elteqedim), hejmara yekem li 29 ê nîsana 1920 an derket, u berdewamî kir heta hejmara 118 derxistî li 27î tîrmeha sala 1922 ande,[122] mdurê wê hakimê leşkerî yê bajarî mîcihrsun bu, u sedemê derxistna rojnamê Wehe diyardibe li hev nîzîkbuna texa rewşenbîr u karkrin ji bo razîkirna boçun wraya giştî ya Kurdî, u derxistna brîtanya mîna hevalek dilsoz ji bo mîletê Kurd). [123] Dinava syaseta îngilîzan di rojnamê de hatibu ku ( gelek soz u peyman bKurdare dabun, u jiwana grêdana wana bi deshelata Bexda re, li duv berjewindiya xwe li navçeyê)[124]

---

120. Faruq ‘Elî 'umer, *b.n.b*, r. 79.
121. *h.b*, h.r.
122. Mehemed Xidir Mewlud di pertuwa xwe de (bzavî rojnamegerî hkumetekanî Kurdistan) were aşkerakrin ku (114) tenê hejmar jêre derketne, û bûye urgana hukmeta şêx Mehmûd hefîd. Bo pîtir zanyarîyan bnêre: Mehemed Xidir Mewlud, bzavî rojnamegerî hkumetekanî Kurdistan, çapxaneya wezareta rewşenbîrî, hewlêr, 1999, r10.
123. Kemal Mezher, *b.n.b*, r. 155.
124. Faruq ‘Elî 'Umer, *h.b*, r. 84.

Rojnameyê di hejmarekê de aşkerakirîye ku ( 'îraq li jêr deshelata brîtanye, yanî lîwaya mîsl u Kerkuk u Hewlêr u Slêmanî çend beşekin j'Iraqê. di hejmareke din de dîsan aşkerakiriye ku pêkhata 'Iraqê bi vî şêwey despêka rasteqîneya diyarkirna çarenvîsê wilayeta mîsl u tevlî buna wê bi 'îraqa nu re). [125]

Xebata rewşenbîrî bi hevre di gel Xebata çekdarî ranewestya, (( u li hemberê de îngilîz u mîcihrsun bêy urgan neman, belkî tekez li ser wê yekê kir ku li çaxê Xebata şîx Mehmud u îdareya Kurdîde çendîn Rojname derxistin mîna ( Banga Kurdistan, Roja Kurdistan, Banga heq, umêd u îstîqlal ) ))[126], dîrok u sedemê derketina her yekê vekolînek taybet jêre dvêt, lê emê bi kurtî bas keyn.

Piştî zêdebuna pRupakinda kemalyan li Kurdistanê, deshelata brîtanî hewilda hemberî bi sekne, ku zêdetir belav nebe li Kurdistanê bi hemî rêyan, bi vî awayî rê hat dayin komeleyeka rewşenbîrên Kurd yên piştevanêt wan ji bo Damezrandina komeleyên Kurdî dijî kemalîyan li Kurdistanê u derkirna Çapemeniyê mîna urgana komeleyên wana, jiwana (Banga Kurdistanê) bu.

### 1.3.3 Dema Hukmeta Şêx Mehmudê Hefîd

#### 1.3.3.1 Banga Kurdistanê (1922)

Yeke ji Rojnameyên heftyane yên pêşketî yên çerxa bîstê ku bizimanê Kurdî derketî, (xwedyê îmtiyaz u mdur wser nivîserê wê (mistefa paşa yamulkî) bu, desteya nvîsevanan pêkhatibu ji Refîq Hîlmî u 'Elî kemal bapîr u Şêx norî Şêx Salih, hejmara yekemîn li 8ê zîlhîcih sala 1340 an hemberî 2ê aba 1922 ande derketiye, )[127]
Dîsan beşa zimanên turkî u farsî jî hebun, (muherrî Kurdî u farsî "'Elî kemal" u "m.nurî (Şêx Nurî Şêx Salih)", u yê turkî "Refîq Hîlmî" bu, despêkê heta hejmare (10) ziman halê (cem'îyeta Kurdistan) bu u şunde ya hikumeta Kurdistanê bu, heftî carek derdiket li bin nav u nîşana: ('Ilmî, Ictîma'î, Edebî Xezeteyeke hur u serbesta milye).

Banga Kurdistan di du gerande (14) hejmar jêre derketîne, u mîna Rojnameya pêşîn (Pêşkeftin), dîsan li çapxaneya mîcihrsun li slêmanyê li sala 1922 ande li çapê

125. Pêşkeftin (rojname), hejmar(6), sala yekem, 920, r.3.
126. Mehemed Xidir Mewlud, *Bizavî rojnamegerî hkumetekanî Kurdistan*, r.10.
127. Cemal Xeznedar, Bangî Kurdistan,1922-1926, bexda, 1974, r.16.

gehandîne)[128] ji şeş ropelan pêkdhat u qebarê wê (32×30) sim bu, hejmara (8) u ya dawyê li sala 1923 ande bu, u gera duyem[129]

Despêka sala 1926 an (mistefa paşa) li Bexda sê hejmarên din derxistin bi vî awayî: (14-1 , 14-2 , 14-3) li hersê hejmarên henê de nvîsandibu: ((mudîr mesul u sir muherr: Mustefa paşa, muherr: mistefa şewqî, mudîr îdare: kerîm rostem )).[130]

Zêdetrî vekoler u Rojnamenvîsan aşkera diken Banga Kurdistanê di çend qunaxanre derbaz buye, hejmare (5) bi aşkerayî behsê teşkîlkirna hukmeta Şêx Mehmudî dike, u hejmara (9) an ya rojnamê bi urgana nefermî ya hukmeta Şêx Mehmudî were nasandin, ku di heman demde bi gera duyem were nasandin. Yanî (Banga Kurdistanê) her ji hejmareya (1-4) komeleya Kurdistanê derkirîye, u ya pêncan despêka urgana Şêxî buye heta di gehe hejmareya (14) an li xizîrana 1923 ande.[131]

Rojnameyê berdewamî da rêbaza xweya pêşîn hemberî daxwazyên kemalyan u bizavên hukmeta 'Iraqê ji bo hevgirtina Kurdistanê di gel 'Iraqê, belê gera sêyemîn piştî derketina hejmara (14) an lsala 1923 an despêkir, qunaxeke cuda bu ji yên berê jber ku ziman halê deshelata brîtanî bu li Kurdistanê, u deskir bi rexnekirna Şêx Mehmud u hukmeta wî u diyarkirna nyazpakîya îngilîzan ji bo Kurdan.[132]

---

128. Refîq Salih , *rojnamekanî serdemî hukmî şêx Mehmûd*, çapxaneya tîşk, 2003, slêmanî, r.5.
129. Mehemed Xidir Mewlud, *h.b* , r.11.
130. Despêka sala 1926 an bi gera dûyem were zanîn ku Mustefa paşa ev her sê hejmarên henê derkirîn: (14-1 , 14-2 , 14-3). Ji bo zêdetrî zanyarîyan temaşeke: Mehemed Xidir Mewlud , b.n.b, r.13.
131. MehemediXidir Mewlud, *h.b* , h.r.
132. Musediq Tovî, *b.n.b*, r. 36.

Wênek ji Naveruka Rojnameya ((**Banga Kurdistan**))

**Hejmare (1)**

| **Babet** | **Ropel** |
|---|---|
| Cejna Qurbanê | 1 |
| Komeleya Kurdistanê | 1 |
| Banga Kurdistanê | 3 |
| Mbarekbadî ( helbest) | 3 |
| Kirdistank Esbab Tednîsî (Turkî) | 3 |
| Xarcde Bulunan Kurd Mnuran u Efazl Keramne (Turkî) | 4 |
| Me'lumat Tarîxye (Turkî) | 5 |
| Banga Kurdistanê (helbest bi Farsî) | 5 |
| Bixdmet Kurdihay Muhterm îran (Farsî) | 6 |

**Hejmara (2)**

| **Babet** | **Ropel** |
|---|---|
| Dibêjn Heyeta nasîhe ji Bexdayê re di were | 1 |
| Mesela Vekirna Mektebê | 1 |
| Bo Kurdan (helbest) | 3 |
| Senay' u Me'arf (Turkî) | 3 |
| Exlaq (helbest bi Turkî) [133] | 4 |

133. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, r. 23.

### 1.3.3.2 Roja Kurdistanê (1922)

(( Hejmara yekemîn li pazdeya çrîya duyem li sala 1922 ande derketiye, d.kemal mezher bi vî awayî behis lê kirîye, u li vî alî u alê din navê wê nvîsandye: ( sir muherr u mudîrî mesul m.nurî, muherr ‘Elî kemal ) li jêrde hatiye nvîsandin: siyasî, edebî, civakî, xezeteyeke resmî ye, heftê carek derdikeft, (4) ropel hebun, (32×20sim). Hejmara (15) an ku dawî hejmarbuye li Roja sêyem ya adara sala 1922 ande hatîye belavkrin mîna urgana hukmeta Şêx Mehmudî dema neçarbuy li bin zexta îngilîzan; slêmanyê bi cih bi hêle ber bi şkefta cihsane çu, u Rojnama henê ji derketnê were rawestandin)).[134]

Tenê pazde hejmar jêre derketîne, lê drastîde şazde hejmar bun, jberku ya sêyemîn dubare hatibu çapkrin ku li 29ê çirya duyem ya sala 1922 an derketbu, u ya dawyê li 6ê kanuna yekem ya 1922 ande derketbu. Duy çaxîde derketina hemuyan hatiye aşkerakirin.[135]

Rojnameyeke resmî zimanihalê hukmeta Kurdistana başur bu, hemu denkobas u xeberên hukmet u ferman u îradeyên melk Mehmudê yekem li ser ropelên xwe belavdikrin, dîsan Rojnameke siyasî dîblumasî bu, Xebat dikir ji bo netewa Kurd u hevbendyên Kurd u netewên hefsuîy belav dikrin, u gelek kotarên civakî jî hebun li ser jiyana Kurdan, Rojnama Roja Kurdistan giringîyeke xweser bi edebê Kurdî ra daye, helbest belafkirîne ku zêdetrî helbestên siyasî bun ku li wî çaxî dzor bun.[136]

( Rojnama henê mîna ziman halê hukmeta duyemîn ya Şêx Mehmud, jiblî Kurdî; yek helbesta fasî u çwarên turkî u du kotarên din yên turkî jî belavbibun, çendîn nvîsevan hebun mîna: ( 'arf saîb, m.nurî, ehmed fewzî, ‘Elî kemal, qale('ebduliqadir), zêwer, nurî baba ‘Elî, se'îd zekî, Mehemed axa, 'ezîz hîkmet qezaz, ehmed muxtar caf, xwacih efendî zade, Hisên nazm, Kerkuklî 'ebduliqadir qedrî).[137]

134. Mehemed Xidir Mewlud, *b.n.b*, ri . 14.
135. Ji bo zêdetir zanyaryan bnêre: - rojî Kurdistan 1922-1923; Refîq Salih, *b.n.b*, ri .6.
136. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, ri .12.
137. Refîq Salih, *h.b*, ri .6.

Wehe diyardibe ku piraniya dîru knivîs u Rojnamenvîsan ku deng buyne lser roj u mee wsala derxistna Rojnama henê, dîsan mebesta sereke siyasî buye, u aşkerakirin u derxistna ronahya rewşenbîriya Kurdî mîna navê wê (Roja Kurdistanê).

### 1.3.3.3 Banga Heq (1923)

Piştî rawestana Rojnameya (Roja Kurdistan) ji derketnê lbajarê slêmanyê, şun ketyên Şêx Mehmudî hewilde Rojnameyeke din li dervey bajêr derbiken, (piştî karîn çapxaneya bajêr vekohêzne şkevteka çiyayê surdaş, u karîn Rojnameyekê derbiken li bin navê (Banga heq) li Cihê roj Kurdistan li 28/3/1923 ande, yanku piştî bîst u pênc Rojan ji derketina Şêxî ji slêmanyê, sê hejmar bitnê jêra derketbun, ya yekemîn mîna me amaje dayê u ya duyem nehatibu çapkrin li benda razîbuna Şêx Mehmudî ma, belê hejmara sêyem li 12/4/1923 ande derketbu.

Were hejmartin Rojnameya yekemîn ku li çiyay ji aliyê bizava rizgarya Kurdîve derbiçe, mîna beşek ji Xebat u zimanihalê bizava borî ku ji aliyê baregayê giştî ya leşkera Kurdistanê derdiket), [138] u lser hatibu nvîsandin: (( naşkê betub u bumba sir evraze Banga heq. )) [139]Refîq Salih di pertuwa (Rojnamekanî serdemî hukmî Şêx Mehmud) de aşkradike ku (diyarnîne kî mdur u mesul u muherrê rojnamê buye, pêkhatibu ji du ropelan bi pêwana (21×23sim) u tenê hejmarên (1,3) di gel paşkoyekê li bin navê ('elawî cihrîdeya Banga heq ) u Roja wê aşkera ne kirbu jêra derketîne, u hejmara duyem 'eynî naveroka hejmara yekem bu; lewma mîna desxet ma u nehate çapkrin, navunîşanên wê: (siyasî, edebî, îctîma'î, xezeteyekî resmîye, xaye u emelî îstîhêalî huquqî Kurdane) li ser nvîsandibu, îdarekirna Rojnama henê jaliyê Şêxî bi xwe were bi rêvebirin. [140] ( Rojnamê murkeka netewîya tevlî hestên ulî wergirtbu, dema gazî ji bo Xebatê krî dijî îngilîzan, xuser dema xelkê Slêmanî toşî zulm wzorya wan hatîn,piştî bajar hatiye burdumankrin bi tupan, li wî demî kotara ulî bi hêzket li ser ropelên wê u kotin îngilîz kafre çinku Kurdên Musil man di kuje).[141]

---

138. Faruq ‘Elî 'Umer, *b.n.b*, ri .92-95.
139. Vekulîna d.Kemal fuad, sedîq Salih, sê rojnameyên şêxê nemir, Banga heq, Banga Kurdistan, umêd îstîqlal, nvîsandna Refîq Salih, slêmanî, 2001, ri .7.
140. Refîq Salih, *b.n.b*, r.7.
141. Banga Kurdistan (rojname), hejmare (1), 28 adara 1923, r.1.

Wehe aşkera dibe ku zêdebarî temena kurt ya rojnamê ku tenê sê hejmar jêre derketbun, belê cihekê mezin girtîye di dîroka Rojnamegerya Kurdîde, jberku yekemîn Rojname bu behis u boyerên bizava rizgarya Kurdî dweşandin ji jêdera wê ya sereke, her dîsan yekemîn Rojnameya Kurdî buye ku alîkarya byanî u derveyî wernegirtbu xuser wê dema hestyar u aloza Kurdistan têde derbazdibu.

### 1.3.3.4 Omêd Istîqlal (1923)

(Çaxê hevrikî dnîvbera îngilîz u hukmeta ‘Iraqêde zêdebuy ji alîyekî u dnîvbera hukmeta turkde ji aliyekê din li ser wilayeta mîsl, deshelata brîtanî ber bi pîlaneke nu çu u hewilda Kurdan razî bike ji bo vegerandna Şêx Mehmudî ji bo slêmanyê u çêkirna hukmeteke nu bi serokatya xwe u vegerandna kawdanan mîna pêşîn bi mebesta kuntRulkirna Kurdistanê, u dkotne Kurdan mesleheta hewe di gel wê yekêdaye ku di gel deshelata brîtanî bin dijî gazyên turkan li wilayeta mîsl).[142]

Şêx Mehmudî Rojnameya (Omêd Istîqlal- Emel Istîqlal) derxist mîna zimanihalê hukmeta wî ya nu, tekezî li ser hîvyên Kurdan dikir ji bo çêkirna hukmeteke xuser u serbxu, hejmara yekemîn li 20/9/1923 ande derket ji bo dema dee mehan li ser êk dumkir heta derketina hejmara dawyê li 15/6/1924 an.[143]

Rojnameya Omêd Istîqlal (25) hejmar jêre derketin u di hat çapkrin li çapxaneya hukmetê li slêmanyê, her sê hejmarên yekemîn ji aliyê ehmed xwacih efendî u ehmed sebrî werne îdarekrin li hersê hejmarên yekemîn de, u (Refîq Hîlmî) ji hejmara (4) an u şunde heta (13) an serpeştî dikir, u ji hejmareya (14) ande (Hisên nazm) buye, heta hejmareya (17) an ya Rojnameyê, u şunde çi kes nehate dîtin u nvîsandin mîna muherrê Rojnameya henê.[144]

---

142. Xelîl Mustefa Usman, *Kurdistan elcnubye (el'îraq) fî senewat elîntîdab elbirîtanî*, nameya masterê ji bo kulîjaadabê, zanîngeha Dihukê, 2005, r.264.
143. Mumtaz Heyderî, *Cejnî rojnamenûsî kurdî û rêbaz û giyanî kurdayetî rojnamey umêdî îstîqlal*, sentera brayetî, kofar, hejmar (1), hewlêr, 1997, r. 39.
144. Farûq ‘Elî 'umer, *b.n.b*, .98-99.

(Omêd Istîqlal) rolek berçav hebu dpêş xistna hesta netewîy li cem Kurdan, li wî çaxê Kurdistan di çendîn biyavên ne xweş de derbaz di bu, ku cvîn dnîvbere hikumeta brîtanî u ya turkî de dastek bilinde bu li pêşî bestna kungreya lozan, rojnamê kotarek belafkir li bin navê: (kirdîş heqî jiyanî heye) u di hundirde weha nvîsandibu: ( gişt mîlet u welatan mafê xwe standye piştî bi dawî hatna şerê cîhanyê yekemîn, tenê kur nebin...).[145]piştî derbazbuna du mehan li ser ketna hikumeta Şêx Mehmudî u kuntrolkirna bajarê slêmanyê jaliyê hêzên brîtanî wihikumeta ‘Iraqê re, deshelata nu bzav krin ji bo vegerandna dezgayên hkumetî u karkirna wan di gel syaseta xweya nu, ji bo wê yekê Rojnameya (jiyanewe- veJîn ) derxist li sala 1924 an mîna ziman halê hikumeta merkezî.[146]bi derketina Rojnama henê , ropeleyek nu di jiyana Rojnamegerya Kurdî de dest pêdike, u di gel derketina wê alozî dnîvbera hikumetên 'îraqî u brîtanî jaliyekî u hikumeta turkî ji aliyek din de zêde bun li ser wilayeta mîsl.

Rojnama henê çafkanîyek giring bu di vekulîna prisgirêka wilayeta mîsl ji bo berjewendiya deshelata brîtanî, ku damezrandina wê ji wî binyatê bu, dîsan hemberî Şêx Mehmudî u bizava wî kar dikir u hertim bi hevalbendê hikumeta turkî bi navdikir, u Şêx bi sedemê negehiştna mîletê Kurd ji bo mafên xwe di da zanîn.[147]

Piştî wilayeta mîsl bi ‘Iraqê re hatiye grêdan, deshelata brîtanî dest kir bi ghurîna syaseta xwe hemberî Kurdistanê, ji berku zu bi zu kawdanên wê yên siyasî u aburî u civakî dhatin kohertin, lê berjewendî mîna pêşîn dman ne hatin kohertin, u li ser syaseta henê de Rojnameya (jiyan) derxist li Cihê Rojnameya bihurî, dîsan li ser heman rêk u destura Rojnameya jiyanewe bi rîve çu di gel giringî danê bi aliyê rewşenbîrî u perwerdeyî, u dijî 'erebkirna deverên Kurdî seknî mîna di kotarekê de li sala 1929 ande diyarkiriye ku: ( Kurdan jiyana di gel 'ereban helbjartye bi merc, u dibe hikumeta ‘Iraqê bi wê yekê razîbe..) Rojnameya jiyan were hejmatin drêjtirîn belavukên Kurdî li çaxê deshelata brîtanî, ku ji 1926 an heta 1938 ande dumkir, u hejmara wê ya dawî yê bi bu (553).[148]

145. Umêd Istîqlal (rojname), hejmar(13) kanûna yekemîn, 1924, r.4.
146. Jiyanewe (rojname), hejmar(1) , 18 ab, 1924, r.1.
147. Jiyanewe (rojname), hejmar (36) , 20 ab, 1925, r.2-3.
148. *h.b* , hejmar (3) , 4 şwat, 1926, r.2-3.

Jiyana rewşenbîrî li Kurdistanê ber bi paşyê çu, ji sedemê syaseta hikumetên ‘Iraqê yek li pey yekên din hemberî doza Kurdî, u hemberî her bzavekê seknî ku karbike ji bo serbexweya Kurdan, ji bêxemet vê yekê rewşenbîrên Kurd hzir di derxistna kofarekê kir li bin navê (Diyariya Kurdistanê) li bexda, u hejmara yekemîn li 11ê adara sala 1925 an kir, babet li ser helbjartna endamên encumena nunerên ‘Iraqê u çendîn kotar li dur destura welatî, Roja durketna wê mîna rojek dîrokî hate li qelem dan u Cejna gişt 'îraqîyan bu).[149]

Dîsan giringyek zaf daye ziman u rêzimana Kurdî u rêyên nvîsîna pîtên Kurdî, u ji hikumeta ‘Iraqê xwest giringî bi xwendinê xweserixwendina Kurdî bê dayin u vekirna dbistanan li Kurdistanê, u bejdarîkirna afretê di jiyane civakî u rewşenbîrî de, ji sedema kêmatya şyanên darayî u hinek prisgirêkên din, Kovara henê ji derketnê seknî li berwara 11/5/1926 ande, u hejmara (16)an dawî hejmar bu derketî ). [150]

Kofarek din li bin navê (zar kirmancî) ku grêday tewerên edeb u dîrokê bun li şunde derket, taybet piştî bajarê rewanduzê buye melbendê bizavarewşenbîriya Kurdî li Kurdistanê ji aliyê rewşenbîr u netewe xwazên Kurd, bi taybet piştî (teha nehrî) mîna deverdarê bajêr were helbjartin li sala 1923 an, [151] ( hejmara yekemîn li 25/5/1926 an derket, nîzî nee salan ji Xebatê çendîn asteng bune sedema girtina wê mîna duratya rewanduzê ji melbendên bazirganî u biyavê darayî...., lewra li 31/7/1932 an ji derketnê seknî u dawî hejmara wê (24) bu ).[152]

### 1-5 Çapemenîya Kurdî li 'Iraqê (1958-1982)

Di îroka gelê ‘Iraqê de şoreşa 14ê temuza sala 1958 an, bi serokayetîya (‘Ebdulkerîm qasm) sîstema siyasî li ‘Iraqê de li paşayetî hat gohertin ji bo komarî, desturê demkî yê ‘Iraqê behsa li hevbeşya Kurd u 'ereb hatî ye krin, hinek gorankarî bi xweve dîtin lî her li çarçovê wan gorankaryan bu, (mebesta me li vî tewerî de Rojname u Kovarên li wî çaxî derketîn bi deyn xweyakrin,

---

149. Faruq ‘Elî 'umer, *b.n.b*, r.136.
150. Hetava Kurd (Kufar), hejmar (36), bexda, adar 1976, r.1.
151. Remizya Sabir Mehemed, *huznî mukiryanî nûser û rojnamenûs*, nameya masterê ji bo kulîja edebyat, zanîngeha selaheddîn, hewlêr, 1993, r.20-22.
152. Rojnamevanî (Kufar), j(9), hewlêr, 2002, r.149.

Di çwar salên pêşîn yên şurşê rewşenbîr u Rojnamenvîsên Kurd, ketne bzavek mezin ji bo pêşebirna ziman u keltura Kurdî, di salên henê de bi dehan pertuyên Kurdî ketne di pertukxanande u hejde kofar u nêzî dee Rojnameyên Kurdî hatne belafkirin, di hundirê wande karîn berevanya mafên mîletê xwe biken).[153]

Rojname u Kovarên li van coran belav di bun ku ( hemu taybet mendibun, mîna Kovara (Nîştîman) ji aliyê desteyeka mamosta u xwendkaran li sala 1959 ande hatibu derxistin, her dîsan Kovara (afret) organa yeketî ya afretên ‘Iraqê u Kovara (hîway Kurdistan) ji aliyê xwendkarên slêmanyê u (Dengê Qutabyan) ji aliyê yeketî ya giştî ya qutabyên ‘Iraqê der di ketin).[154]

Di gel Rudana van ghorînan li ‘Iraqê de baRudoxek li bar ji bo kaRubarên siyasî u Çapemenî hat pêş, ji bo cara yekemîn partek siyasî karî Rojnameyekê bi navê (Xebat) li 4/4/1959an li paytexta ‘Iraqê derbike, ev yeke jî wê rastyê derdxe ku geşekirna Rojnamegerya Kurdî bende bi helumercên siyasî u civakî, u serdema xwe li Rudanên mezinên dîrokî li nawçê de karîgerya xwe danaye li ser rewtî jiyan u pRusa geşekirna cvakê komeleya Kurdî, qonaxeka din pir li berhem u belav kirneve wazadî ya Çapemenî ya Kurdî li ‘Iraqê de.

Dîsan rêketna 11ê adara sala1970 an, werçexanek dîrokî bu li biyavê roşenbîrya Kurdan bi giştî Rojnamenusî yê bi taybetî, dnîvbere 1970 an ta adara 1974 an bi demekê zêrîn tê nasîn ji bo Rojnamenvîsîya Kurdî, li wî çaxî de bi dehan kofar u Rojname u belavuk derketin ) [155]

Di sala henê de bi sedema vê rêketna şorişa Kurdî u hikumeta 'Iraqê, Rojnamenvîsê Kurd jî çuye di qonaxeka dinde, hejmareyek ji wan Rojname u Kovaran berçav diketin ku ta astek herî baş pêşketin bi xweve dîtbu.

---

153. Musediq Tuvî, *çend beperek ji dîroka kurdî*, beşa yekem , r.78.
154. Mehemed Kerîm Ehmed, *rojnamenusî kurdî taybetmend*, nama masterê, zanîngeha slêmanî, beşa ragehandinê, 2010, r.56.
155. Azad 'Ubêd Salih, *karîgerî şorşî eylul le ser rojnamewanî kurdî 1961-1075*, çapxaneya roşenbîrî, hewlêr, 2007, r.81.

Mîna Kovara (Zanyarî) li 1970 an u ya (Korî Zanyarî Kurd) li 1973 an ku taybet bun bi lêkolîneve u Kovara (Nuserî Kurd) li 1971 an ya taybet bi edebê u (Perwerde u Zansit) ya taybet bi perwede u xwendina Kurdî u (Gêtî Pul) ku taybet bu bi pulixwazî u (Hîvî) ya liqa dhokê ya yekêtî ya mamostayên Kurdistanê, ( Estêre) taybet bu bi zarokan u (Hoşyarî Krêkaran) taybet bi krêkaran u (Bo Pêşewe) taybet bu bi yekêtî Mamostayên Kurdistanê lqê Hewlêr li sala 1972 an..) [156] ev maweye bi mawê zêrînê Rojnamenivsya Kurdî were nasîn li hemberî van kofar u Rojnameyan ji aliyê taybetmendî u pisporîve u ji aliyê naverokêve hunerê Rojnamevanyê jî pêngavek herî giring bu.

Li vî çaxî netenê Çapemenî berb pêş çu, belkî zor li dezgahên Kurdî ji bo yekemîn car dirust bun, mîna ( yekêtî nivîserên Kurd) u çendîn rêkxistyên dnên pîşeyî u civakî ku heryek karîn belav krî u Çapemeniyên xwe belav biken, lê belê behara azadîya Kurdî gelek ne vekêşa piştî çend sala rjêma ‘Iraqê li hemî wan belênên bi Kurdan re dabun, puşman bu u bi hemî şêweyan kete djayetîya Kurdan, carek din derkirna Rojname u Kovaran berdewam bun hinek ji aliyê hêzên niştîmanî ya ‘Iraqê werne qedexekrin, hinekên din jî mîna (karwanî werizşî) u Kovara ( tendirustî u komel) u dîsan hinekên din ku li wir jaliyê take kesan derdiçun mîna (hawdeng) u (dengê me) u (nêrgiz) u (aburî zan).

Jiblî vane hinekên din li çiya diwerne belav krin, mîna: (Nuserî Kurdistan) li 1981 an u (Gizing) li an 1983 u (Bang) u Kovara (Terazu) ku taybet bu bi yasa u mafperweyê, baRu doxê taybetî bi bzutneva Rizgarîxwazî ya Kurd u siyasetê diyarkerên Kurdan karekê weha kirîye, Rojname u partên siyasî li kawdanekê veşartî de derbikevin u beşekê giring li Rojnamenvîsyê pêk bînin, ev Rojname u belavkiryane syaseta part u armancên xwe têde Run dikrin u belav dikrin, heluyistê syaseta xwe li hember boyeran derdxist, li virde dbînîn hewl u bizava çiyayî ne her tenê li Mijara çek u pelemardanan nehatye grêdan, belkî yek ji sîmayên şoreşa Kurdan Rojnamenvîsî buye)[157]

---

156. Mehemed Kerîm Ehmed, *rojnamenusî kurdî taybetmend*, r.56.
157. Newzad ‘Elî Ehmed, *berew sereta, projey parastinî destnusekan jmare(8)*, çapxaneya zamwa, slêmanî, 1998, r.10.

Jêderên dîrokî xweser ewên behsa dîroka ronamegerya Kurdî diken, qunaxên dîrokî yên geşekirna Rojnamenvîsî parvey du qonaxan diken ew jî ( nihênî u aşkra ), ev boçune temam raste belê bi karanîna peyva (çiya) bi hevre di gel peyva nehênî ji bo Rojnamenvîsî ya temame)[158],

Ji berku hejmareyeke zor li Rojnamenvîsên Kurdî li çiyay derdiketin u bi nehênî li nawçeyên jêr desthelata rjêma be'si der diketin. Ji nav çun u nemana Rojnamenvîsê aşkra yên bi Kurdî derdiçun, buye sedema serheldana jmareyeka zor li rojnamên nehênî yên nu, ku rolek giring li karwanê Rojnamenvîsyê de bbînin, ev core bi Rojnameyên şaxî hatibune nasîn) [159], bi serkirneva naverokên Rojnamenvîsîya nehênî karekî hasan nebu, çunkî behra ptir ji Rojname u Kovarên li kawdanek dijwar de hatîne çapkrin u helgirtina wana karekê bi zehmet bu, ji bilî vê yekê jî nehatîne erşîfkrin u nehatîne helgirtin)[160], her dîsan biyavê taybet u aluzyên Kurdistanê behra ptir li nivîserên Kurd jber nebuna azadî ya Rojnamenvîsî ugiranî u nebuna bazarê Çapemenî ya Kurdî, bi bune sedem u nehêştîye Rojnamenvîsê Kurd berdewam be u ta mîna rojnamê bi temen li vê qonaxê de me hebin, ji ber vê yekê behra ptir li belav kiryan hejmareyên wana kêm buyne ).[161]

Rojnamegerya Kurdî li wan navçeyên rizgarkirî u navçeyên welat mşextî geştir bun, di gel tvenga pêşmergeyê şaxên Kurdistanê qelemê nvîskar u Rojnamenvîsan bi hevre Xebat dikir u hembêz dikir, her li salên me li jor behiskrîn 1974-1975 ande, u di gel despêka şorişa kolanê li 1976 an, dşorişa henê de bi dehan Rojname u kofar derketin, gelek jiwane li pey kawdan u karînên xwe mîna mayin u kelayên dagîrkaran di hejandin yan di bune çra u ronahî ji bo tevaya Kurdistanê,

158. Newzad 'Elî Ehmed, *b.n.b*, r.11.
159. 'Izedîn Mustefa Resul, *hewl elsehafe el kurdye*, çapxaneya dar elcahiz, bexda, 1973, r. 12-13.
160. Newzad 'Elî, *hunerekanî edeb le rojnamegerî nehênî kurdîda 1961-1991*, çapxaneya rûn, slêmanî, 2005, r.42.
161. Mehemed Kerîm Ehmed, *rojnamenusî kurdî taybetmend*, r.58

Mîna Rojnama (Birayetî) Kovara (beyan u roşenbîrî nwê) u Kovara (Kurî Zanyarî 'Iraq-desteya Kurdî) u (Nuserî Kurd-xola duyemîn) li salên 1979-1982 ande berdewam bun heta piştî serhildana gelê Kurd li behara 1991 ande, u belavoka (Dengê me) li dihukê).[162]

Li tewera behsa mede Çapemenîyek berifreh wzaf derket, u ji bo wê yekê babet zêdetrî drêj nebe u ji mebesta serke ya babetî durnekevîn, bi vî awayê li jêr corê Çapemeniyê u sal u bajarê lê derketî di gel xwedyê îmtiyazê yan ew aliyê derdxe, zorbeya Rojname u Kovarên wî çaxî dideyne aşkerakirin:

| **Sal** | **Rojname u kofar** | **Bajar** | **Xwedî Imtiyaz** |
|---|---|---|---|
| 1958 | Ko.Şefeq | Kerkuk | 'Ebuliqadir berzincî |
| | Ko.Pêşkeftin | Bexda | Mehemed brîfkanî |
| 1959 | Ru.Ray Gel | Kerkuk | Sedîq Blokînî |
| | Ru.Azadî | Kerkuk | Nayif' Yunis |
| | Ru.Xebat | Bexda | Ibirahîm Ehmed |
| | Ko.Rizgarî | Bexda | Salih Elheyderî |
| | Ko.Dengî Qutabîyan | Kerkuk | Yeketiya Xwendkarên 'Iraqê |
| | Ko.Dengî Qutabîyan | Bexda | Yeketiya Xwendkarên 'Iraqê |
| | Ko.çareserkirdnî kiştukal | Bexda | Wezareta çareserya çandinê |
| | Ko.Bilêse | Slêmanî | Yeketiya Mamustayan |
| | Ko.Newroz | Slêmanî | Kemal Mîrza Kerîm |
| | Ko.Afret | Bexda | Yeketiya afretên 'Iraqê |
| | Ko.Honer | Slêmanî | Dibistana honerên malan |
| | Ko.Nîştîman | Slêmanî | Mamustayên peymangehê |
| | Ko.Hîvya Kurdistanê | Slêmanî | Yeketiya Xwendkarên 'Iraqê |

162. Musediq Tuvî, *b.n.b*, r.17.

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1960 | Ru.dengê Kurd | Bexda | pa.'umer cihlal hewêzî |
| | Ko.Ronahî | Bexda | hafz Mustefa qazî |
| | Ru. Rastî | Musil | Enwer Mayî |
| | Ru. Birwa | Slêmanî | pa.kemal mîrza kerîm |
| | Ko.jiyan | Hewlêr | Yeketiya Xwendkarên 'Iraqê |
| | Ko.Roja nu | Slêmanî | Cemal şalî |
| | Ko.'îraqa nu | Bexda | wezareta çavdêrya 'Iraqê |
| 1961 | Ru.Kurdistan | Bexda | Ibirahîm Ehmed |
| | Ko.edeba 'îraqî | Bexda | Yeketiya nivîserên 'Iraqê |
| 1962 | Ru.Hewlêr | Hewlêr | şarewanya Hewlêrê |
| | Dîcle u Furat | Slêmanî | Edîb qerexan |
| 1963 | Ru.raperîn | Slêmanî | 'Ebdul'ezîz Salih |
| 1964 | Ko.Tutin | Bexda | Kargêrya dirustkirna tutnê |
| 1966 | Ko.raber | Slêmanî | xuyindingeha milkendî |
| 1967 | Ru.Birayetî | Bexda | Salih elYusufî |
| | Gizink | Slêmanî | xuyindingeha menar |
| 1968 | Ko.karî mllî | Bexda | dezgayê Rojnamegerya Kurdî |
| | Ko.Slêmanî | Slêmanî | Mehemed Mustefa |
| 1969 | Ru.ronakî | Bexda | hilmî 'Elî |
| | Ko.Rizgarî | Slêmanî | Newşêrwan Mustefa |
| | Ko.tîşk | Hewlêr | mala mamustayên seretayî |
| | Ko.beyan | Bexda | wezareta ragehandinê |
| 1970 | Ru.hawkarî | Bexda | dar elcemahîr ya çap u weşanê |
| | Ko.Birayetî | Bexda | hebîb Mehemed kerîm |
| | Ko.Gîtî Pul | Bexda | Komeleya çapa 'Iraqê |
| | Ko.defterî Kurdewarî | Bexda | marf Xeznedar |
| | Ko.Xebatî qutabyan | Hewlêr | Yeketiya Xwendkaran |
| | Ko. Hewlêr | Hewlêr | se'dî Mehemed emîn |
| | Ko.şureşî giştukalî | Hewlêr | wezareta çandinê |
| | Ko.çiya | Hewlêr | Bedirxan sindî |
| | Ko.çiya | Dihuk | |

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1971 | Ru.Birayetî | Slêmanî | hebîb Mehemed kerîm |
| | Ru.Jîn | Slêmanî | kake fulah |
| | Ru.dengî cutyar | Bexda | cutyaran |
| | Ko.perwerde | Bexda | kargêrya xundinên Kurdî |
| | Ko.Nuserî Kurd | Slêmanî | Yeketiya nivîserên Kurd |
| | Ko.dengî mamusta | Slêmanî | Yeketiya mamustayên Kurdistanê |
| | Ko.rwange | Bexda | nivîserên Kurd |
| | Ko.Rojî Kurdistan | Bexda | Komeleya rewşenbîrên Kurdî |
| 1972 | Ru.Birayetî | Bexda | hebîb Mehemed kerîm |
| | Ru.bîrî nwê | Bexda | fexrî kerîm zengene |
| | Ko.bîrî nwê | Hewlêr | dwanavendiya Hewlêr |
| | Ko.Kerkuk | Kerkuk | Yeketiya nivîserên Kurd |
| | Ko.Estêre | Slêmanî | Salih Yusufî |
| | Ko.nuserî nwê | Hewlêr | Yeketiya nivîserên Kurd |
| | Ko.kulîja edebyat | Bexda | kulîja edebyata bexda |
| | Ko.huşyarî krêkaran | Bexda | Yeketiya giştî ya krêkaran |
| | Ko.Hîvî | Dihuk | Yeketiya mamustayan |
| | Ko.çrayê geş | Dihuk | |
| 1973 | Ko.Korrî Zanyarî Kurd | Bexda | Komeleya zansitên Kurdî |
| | Ko.baba KorrKorr | Kerkuk | Yeketiya Xwendkarên Kurdistanê |
| | Ko.bo pêşewe | Hewlêr | sendîka mamustayên Kurdistanê |
| | Ko.roşenbîr | Hewlêr | Komeleya rewşenbîrên Kurd |
| 1976 | Ko.elşimu' | Dihuk | |
| 1978 | Ru.meşxel | Dihuk | |
| 1981 | Ko.peyv | Dihuk | Yeketiya Niviserên Kurdistanê |

Dîsan Ferhad Pîrbal di pertuwa xwe de ya nav bihorî (çend basêk le barey Rojnamenusî Kurdîyewe)[163], bizava Rojnamegerya Kurdî her ji derketnê heta sala 1992 an, yanî piştî serhildana pîroz, di çend xişteyekan de kumkiriye, btaybet naveroka her yekê jiwane dîsan parvekirna wan li ser welatan xweser li ewropa u emrîka, hejî behiskirnê ye ku heta niha (19) ji Rojnamegeryan di diyar nemayine ku li kîjan welatî wern belavkrin, li firr min bi fer zanî hinekan jiwane bi dem xuyakrin jber giringya wan dbabetî de u hejmareya wane gehiştin (129) an bvî awayî:

Parvekirna Rojname u Kovaran li ewropa u emerîka:

| **Welat** | **Hejmar** |
|---|---|
| Siwêd | 40 heb |
| Emrîka | 15 heb |
| Elmanya | 14 heb |
| Brîtanya | 13 heb |
| Frensa | 12 heb |
| Suyisre | 5 heb |
| Hulende | 4 heb |
| Kenede- Nemsa | 2 heb |
| Danîmark- Neruyc | 1 heb |
| Finlend1- Belçîka | 1 heb |

**Naverok u Meydanên bizav têde were encamdan**

| **Mijar** | **Hejmar** |
|---|---|
| Rewşenbîrî u Sisiyasî | 74 heb |
| Rewşenbîrîya Giştî | 37 heb |
| Edeb | 7 heb |
| Edeba Zaruyan | 5 heb |
| Myozîk | 1 heb |
| Afret(Jin) | 1 heb |
| Zanista Nojdarî | 1 heb |

163. Ferhad pîrbal, *b.n.b*, r. 217-220.

## Beşa Duyemin

## 2.1 Jiyana Salih Yusufî

### 2.1.1 Aliyê Civakî

Salih Yusufî mîna kesayetyek navdêr li ‘Iraqê bi giştî u li Kurdistanê bi taybetî, Rulek pir mezin dîtiye di dîroke syasya ‘Iraqêde, kes tuneye ku navê wî gwe lê nebuy ; wid gel navê wî aştî u azadî u xuşewîstî nebhîse, mîna helbestvanek çeleng ropelên edebyata Kurdî nexşandîne, mîna nvîsevan u Rojnamenvîs; Rojname u Kovarên Kurdî u 'erebî prî Gotarên xweyên pir biha krîne, berhemên wî rastî u wêrekî têde bu, qaremanek navdêr bu dijiyana xwe de u mîna qaremanane şehîd ketye u çuye ber rehma xudê.

#### 2.1.1.1 Peydabuna wî

Bab kalên bnemala (Yusufî) ji gundê kêste reş ber bi bajarê zaxu hatîne, xêzana Şêx îwsif ji dewlemend u navdêrên zaxu bun, xwedî gelek zevyên çandinê yên mezin bun xweser li taxên husênyê u 'ebasyê... Xêzaneke navdêre bi uldarî u xudê nasînê, Şêx îwsif zana u feqye bu divî barîde, ser bi Terîqeta neqşebendî bu u xwedî zîrekî u mêrxasyek zêdebu ku bawerî u hezkirna xelkî bdest anî bu, u seRukatye kumeleyeka zelamên mêrxas li zaxu kirîye). [164]

Navê wî (Salih kurê 'ebdullayê kurê necmedîne kurê mela tehayê Yusufî) ye, li sala (1918)an, li gundê bamernê ser bi nafçedarya amêdî yê, jibnemaleyeke zana u ayin perwer hatîye dunyayê, [165] ŞêxYusufiyê bapîrê wî rolek baş hebu di şorişa (Bedirxanyan) de li (1842-1847), heta di meydanên berixwedanê de dzîndanên turkan de şehîd di be,[166] bapîrê wyê din Necmedîn ji zaxu li çerxa nuzdan, mşextî bamernê buye u li wir chgîr buye, di gel heft kurên xwe; çwar ji wane çune ber rehma xudê u sê yên din man bi nafê (Mehmud u Hesen u ‘Ebdula) , yê dawyê (‘Ebdula ku bavê Salihî ye; li sala 1878 ande li bamernê jday buye, yekbu ji navdarên Kurdên wî çaxî,)[167] îmam u xetîbê mizgeftan bu gelek di gerya ji bo belavkirna uldaryê, di gel (Fatîma Mistefa Bamernî) jiyana Hevjîn yê pêkanye.

---

164. Zuzan Salih elyusufî, *Salih elyusufî (1918 1981) sefehat min heyathî û nîzalhî elwetenî*, çapxaneya hewar, Dihuk, 2009, r.13-17.

165. Bnêre: - Zuzan Salih elyusufî, *Salih elyusufî (1918 1981) sefehat min heyathî û nîzalhî elwetenî*, r.19.
-Mehemed ‘Ebdula, *şehîd seyda Salih yusufî*, Kofara (Metîn), ji (21), 1993, r.22.

166. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *dîwana seyda Salih yusufî*, çapa yekem , b.ç , 1991, r. 5.

167. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *h.b* , r. 6.

Fatîma ji binemaleke uldar u navdêr bu li bamernê di gutne babê wê seyd Mustefa, jneka îkcar şareza u uldarbu şarezayî xwendina quranê bu wkarî hemuyê ji ber bike, li ser destê day u babên xwe, wê jî bkarê xweyê pîroz dzanî zaRuyên gundî bixwendina wê perwerde bike.

Piştî zewaca wê bi ‘Ebdulayê bavê Salihî re, xudê sê zaRu brizqê wane krin, du keç bi navê (‘Ayşa u Esma) u yê sêyan kur bu bi navê (Salih),[168] di gotne dayka wî (Seyde Fatma) ji gundê bakurmanê hatibun u li bamernê dijiyan, nav u nîşanê (Yusufî) ji (Şêx Yusufî) wergirtye ku yek bu jmamêt babê wî, li çaxê wî kargêrê bajarê (zaxu), u di bejdarya wî dşorşên Bedirxanyan de her li zaxu were kuştin),[169] dîsan keça wî (Zozan)ê diyarkiriye ku naznavê (Yusufî) ji (îsv)ê bab kalê xwe wergirtye, ji ber hezkirna wî ya zêde ji bo bapîrê xwe.

Piştî çend mehan ji daykbuna (Salih Yusufî), babê wî di çe ber rehma xudê, dayka wî (Fatîma) yê bi sîngek freh u sebir tehemul li ser wexera wî razî bu ku hezkirna xudê ye, hemî giringya jiyana xwe kre di xizmeta perwerdekirna hersê zaRuyên xwe u alîkarya xelkê navçeyê ji bo xwendin u fêrbuna qurana pîroz, seyde Fatîmayê mala xwe mîna xwendingehekê danabu ji bo karê henê yê pîroz dîsan ji berkrin u tefsîra wê jî were fêrkrin, u navê (seyda Salih) her jnavê wê wergirtye, Salih u herdu xweşkên wî li serdestê dîya xwe fêrbun, u bune mamustayên zaRuyên bamernê ji bo fêrkirna quranê).[170]

(Yusufî) mîna me li jur aşkerakrî ji binemalek navdêr bu li bin navê bnemala (Yusufî), di pertuwa (mu'cem elşu'era elKurd) de hatiye ku ( binemala henê bi eslê xwe berwarîne, di gutnê mala yusufê kêsteyî ku li zaxu cih gîr buye u ji aliyê (Bedirxan Begê Botanî) re buye hakimê zaxu).[171]

---

168. Zuzan Salih elyusufî, *b.n.b*, r.17.
169. Reşîd Findî, *Salih yusufî jyan û berhem*, çapxaneya spêrêz, Dihuk, 2016, r.10.
170. Zuzan Salih elyusufî, *b.n.b*, h.r.
171. Hemdî ‘Ebdul Mecîd selefî- Tehsîn Ibrahîm duskî, *Mu'cem şu'era elkurd*, çapxaneya spêrêz, Dihuk, 2008, r. 361.

(Yusufî) mîna Xebatkarek siyasî miyanrrew, di jiyana xwe de gelek tuşî eşkence u girtinê buye, çendîn caran ketye zîndanê, ya ji hemuyangirantir u dijwartir ewa li sala 1963 an bu, dema serokatya şanda Kurdî krî ji bo bexdayê di gel rijîma be'sa ji nafçuîy, her dîsan malbata wî u xîzana wî ji zulma rjîmên serdema wî qurtal nedbun.

(Letîf ‘Ebdula) ji malbata wî di bîranînekê de weha di bêje: (( li sala 1958 an, dema li bajarê zaxu nameyek ji bo hat ku vegere bexdayê, ez jî bi hevre çum u gehşitîne mala (‘Eqîd Teha) xwedyê namê ku kur xalê Yusufî bu, nav bihorî (Yusufî) agedarkir ku xwe bi parêze ji rjîmê u hşyar bi be, lê di bersivêde gut; gereke min zanîba daxwazkirna min bo vê yekê bu, ne di hatim u ez karek heq dikem u natirsim)).[172]

Berdewam di be li ser xebata xwe pîtrî (40) salan li sala 1981 an dema Serkirdayetiya parta Sosyalîst dikir li bexdayê, rijîma Sedamî ya wî çaxî têkelî şerê li dijî îranê bu, sed mxabin rijîma henê ya diktaturî biryara terorkirna seyday derxist, u li Roja 25 ê xizîrana heman sal, nameyek bumbekrî ji boy hinart mal u dema vekirna nameyê li naf baxçeyê malê; pêre di teqe u bigiranî brîndar dibe, u heta di gehe nexuşxaneyê giyanê xwe ji dest di de u şehîd di be, u cenazeyê wî were veguhastin ji bo malbata wî li zaxu u li wir tê naştin ).[173]

### 2.1.1.2 Xwendina Wî

Xwendina xwe ya seretayî li bamernê bi dawî aniye, u qurana pîroz li cem diya xwe xwendîye u jaliyê wê re hatiye perwerdekrin, her ji gencatya xwe kureke behremend u jêhatî buye, sRuşta Kurdistanê karîgeryeke mezin li ser deRunê wî kiriye u hez u viyana sruştî zêdetir palda ku ber bi helbest u pexşanê re bi çe u hêdî hêdî behreya henê li cem peyde bu, yanî 'eşqa sruştî di gel denga bilbil u qebqeba kewên çîyayên Kurdistanê viyana wî zêdetir lêkir bu, ku helbest u pexşan u têksitên edebî binvîse). [174]

---

172. Letîf ‘Ebdula, ji malbata yusufî, dîkîwmenterî bi helketna yada merasîma rêzanîna şehîd (yusufî), hewlêr, 2/7/2012.
173. Reşîd Findî, *Salih yusufî jyan û berhem*, r.31.
174. Zuzan Salih elyusufî, *b.n.b*, r.19.

Piştî xwendina xwe ya navnicî li xwendingeha (Al elbeyt) bi dawî anî... Li bajarê bexdayê li sala (1938) an , buye mamuste li gundê (Herîr) ê, u şunde li (1943)an, carek din ber bi bexdayê çu ji bo temamkirna xwendina xwe li peymangeha (Zansitên Islamî), u pleya nayab bi dest xist, şunde ji aliyê zanîngeha ezherê derfet ji bo çêbu ku xwendina xwe ya bilind li wir bi xune, belê hez nekir ewjî ji sedemê çend egerekan,[175] ya herî giring grêdana wî bu bi karên siyasî, li dadgehan karkirîye mîna nvîsevanê yekemîn di nîvbera salên (1942-1960) ande.

Piştî şurişa çekdarya Kurdî li sala 1961 an çê buy bi Serkirdayetiya (mela Mustefa barzanî), di gehe şorşê u karê hikumetê bi cih dhêle, u ji sedemê wê yekê ptir ji carekê dwere zîndankrin u nefîkrin, heta li dawyê li bexdayê li mala wî bi rêye pustek bumbekrî were şehîdkrin li 25/6/ 1981 an, (Yusufî) xwedî çendîn helbestên Kurdîye,[176] belê dîwana wî heta niha berbelave).[177]

Di dawî pirtuwa ya li ser jiyana wî hatiye nvîsandin, ya li bin navê (Salih Yusufî jiyan wberhem) ya Reşîd Fndî de, kurteyek li dor jiyana seydayê şehîd nvîsandye u li ser birgeyên xwendina wî sekinye, u hevraye di gel Zozanê (( Salih li zaRukînya xwe li cem diya xwe (fatma) yê qurana pîroz xwendîye, u li bamernê ders ji bo Zaruyan di gutin, dîsan bi rêz u hurmet buye li cem dapîra xwe (leyla) yê, u (hazm Yusufî) aşkera kiriye ku seyday (60) ropelên bîranînên xwe ji bo wî nvîsandîne.))[178]

Piştî xwendina xwe ya seretayî di çîte bexdayê li e'zemye xwendina xwe ya îslamî li (dar el'lum- Al elbeyt) di xune li sala li jur hatî aşkerakirin, u bo dema salekê di be mamusta heta dawyê bi xwendina xwe di îne li (dar el'lum el'alyie) ku hemberî kulîja şerî'etî ya nihaye, li sala 1943-1944 ande.[179]

Xudê jê razî nivîser u helbestvanek çeleng bu, qelema xwe ji bo xizmetkirna doza gelê xweyê Kurd bi karanye, u dema jyê xwe gurî nvîsîna êş u azarên gelê xwe

175. 'Ebdul Selam 'Elî, *b.n.b*, r.6-7.
176. Hemdî 'Ebdul mecîd selefî- Tehsîn Ibrahîm duskî, *b.n.b*, r.360-361.
177. (Yusufî) xwedî dîwanek helbestên bi çûke, çendîn nvîsevanan li ser nvîsandye û çapkirîye, li berî derketna vê pirtûkê, mîna ('Ebdul Selam 'Elî) li sala 1991 an li bin navê (dîwana seyda Salih yusufî), belê helbestên wî hemî di hundirê wêde nebûn, û piştî derketna pirtuwa henê, dîwana wî ya bçûk bi temamî hatye nvîsandin, ji alyê keça wî (zozan Salih) ya nav bi hurî li sala 2009 an, dîsan mamusta (Reşîd Findî) li bin navê (Salih yusufî jyan û berhem) ya li vê salê 2016 ande nvîsandîye.
178. Reşîd Findî, *b.n.b*, r.10.
179. Zuzan Salih elyusufî, *b.n.b*, r.29.

krîne di Rojnamegerya Kurdî de bi taybet li (Elteaxî u Birayetî u Rojî Kurdistan u Stêre u Nuserî Kurd ya rewşenbîrî). Dîsan dijyê xwe de jiblî zimanê daykê şarezayyek zaf di xwendin u nvîsîna zimanê 'erebî de hebu, ku baştirîn Gotarên wî bi zimanê henê bun, bi awayek ku çi nvîsevanek 'ereb şyanên wî nebun, u dîsan zimanê niglîyzî u hinek ji zimanê rosî dzanî.[180]

### 2.1.1.3 Pêkanîna Xêzanê

Piştî (Yusufî) di bîte gencihk ji hejî li dawîya salên (1940)ande , dîya wî hezkir xêzanê pêk bîne, ji berku dema wî hatibu, belê (Yusufî) ji ber hezkirna wî ji bo wellat u karên siyasî u Rewşenbîrî; gwe li vê yekê nemabu, belê ji ber karîgerya dîya wî li ser ji bo pêk anîna xêzanê re bo hander ku çavê xu li Hevjîn ekê bgêre, li despêka derçuna wî ji (dar elmu'elmîn) hevallek bnavê (xelîl 'ebdilla slêvaneyî) hebu, kurê yek ji bazirganên zaxu bu, ku hevallînyek nêzîk bi hevre hebu, u herdu mamusta bun li Herîrê u hizrên wan nêzîkî yekbun , jiblî uldarya xêzana xelîlî u navudengya başa wê di hundirê bajarê zaxu de.[181]

Hevalê wî xweşkek hebu li wî çaxî ku ji nu derçu bu j(dar elmu'elmîmat) li bexda, li bin navê (Letîfe) bu, (Yusufî) hertim hezd kir keçek xwendeva u rewşenbîr bixwaze ku bkare di hzir u bîrên wî têbgehe u Hîvî u dîtnên wî yên siyasî li berçav werbigre, ji bo vê yekê daxwazê ji dîya xwe dike wê keçê jêre bi xwaze, keyfa dîya wî bi vê yekê hat ji berku xêzanek baş u ji heJîn e,  u hertim hzir di kir piştî (Yusufî) di be xwedî xêzan wê ji siyasetê duyr keve, lewma her zu bzav krin ji boy (Letîfe) yê bo bixwaze, u li salla (1948) ande , jiyana Hevjîn yê bi hevre pêkanî,

---

180. *https://ar.wikipedia.org/wik , Zozan Salih ,SalihYosfi, dawi* seredan li 20-11-2016 *dawi* seredan li 15-11-2016*i*

181. Zuzan Salih elyusufî, *b.n.b*, r.30.

Piştî çendîn sallan di be xwedî şeş zaRukan ewjî: ( Narîn, Şêrzad, Lawîn, Havîn, Zuzan, Turîn )[182] , Li şunde li sala 1949 ande, were vehastin ji bo şingarê u di be katbê yekemîn yê dadgehê, u li wî çaxî Serkirdayetiya liqa yekem ya parta demukrata Kurdistanê di kir u karî bi dehan xelkê nafçeyê bi xe nav rêzên parta henê u xebata nihênî.[183] Hestikrin bi nexweşî wazarên miletê Kurdê hejar wbê destellat jhenga karên siyasî wneteweyên seyda (Salih (Yusufî) bun, şeydabuna xak wwellatî palldaye Di hundirê karên siyasîde, vê yekê Giyanê hesta welat perweryê di deRuna wîde dirustkiriye, lewma hîvya dîya wî (Fatîma)yê bcih nehat, ku kurê wê dest ji karê siyasî berde, u di dema pêkanîna xêzanê wşunde li ser rêya xwe dum dike, u ne dîya wî wne jna wî nekarîn hizrên henê ji mêşkê Yusufî derbixen, ji sedema wê yekê xêzana wî bejdarî Xebatê dbin bhevre, whemberî gelek nexweşî witris wdurxistin wderbederyê dbin, dîsan diwern zîndankirin jî.[184] Çaxê (Sedam Hisên) li sala 1979 an, deshelatê digre dest, taybet li 30 ê tîrmeha sala 1980 an, (Yusufî) nameyeke (11) ropelî ji bo dihnêre, wil şunde dşerê ‘Iraqê wîranê de li heman sal, daxwaz jê tê krin ku dijî hikumeta nu ya îranê binvîse, lê daxwaza henê retdike u di encamde jiyana wî kete dmetirsyek zaf de, her çend Serkirdayetiya Kurdî li berya mehekê ji tîrorkirna wî ew agehdarkirbu ku ji bexdayê derbikeve, lê bimxabnîve li Roja 25 ê xizîrana 1981 an, li sa'et 11ê sbê bi rêya nameyek bombekrî li mala xwe li bexdayê tê tîrorkikrin, wpiştî vegwehistna wî ji bo nexweşxaneyê jsedemê zorya brînên wî piştî demjimêrekê Giyanê xwe jidest dide. [185]

---

182. Çiwar keç û dû kur hebûyne, herdû kurên wî di cwanya Jiyana xwe de, giyanê xwe ji dest daye:
- Narîn: keça yekemîne derçûya kulîja edebyata zanîngeha mustenseryel bexda beşa zmanê niglîzî, xêzana şekîb akreyye, kesatyek navdare li naf rêzên parta demukrata Kurdistanê li nafçeyê.
- şêrzad: yê duyemîne, endazyarbû, derçûyê zanîngeha besre, li sala 1993 an li zaxu bi boyerek dil tezîn wexera dawyê kirye.
- Lawîn: ji zaruyên sêyEmîne, nojdarbû, derçûyê kulîja nujdarî li qahîre, li brîtanya li 2008 an, wexera dawyê kirye.
- Havîn: ya çwaremîne, xêzana endazyar rubad xald elyusufî.
- Zozan: ya pêncemîne, xêzana diktur cîhad midhet cafe, nvîsevan û çîrok nvîsek navdêre li hnek welatên 'erebî û 'îraqê û Kurdistanê, xwedî çendîn bawername û subasnameye, ni ha li bajarê zaxu jyan di be ser.
-Torîn: ya şeşEmîne û keça çwaremîne, derçûya amadeyye û nha dgel dayka xwe xanim letîfayê li zaxu jyan di be ser.

183. Zuzan Salih elyusufî, *b.n.b*, r.30.

184. https://ar.wikipedia.org/ *didara Zozan Salih ,Sehid salih yosfi*,dawi seredan li 18-11-2016

185. *h.b*

Diktur (Bengîn Xelîl), jmalbata wî ku wî çaxî nojdar bu li nexweşxaneya yermuk, boyerê weha aşkeradike ku (dema min bîhsitî yekser çume cem widiyarbu brîna wî ji teqîna bombeyê zor mezin bu ku nikarîn qurtal bkîn, u li gel temambuna wî ew hêzên li hemberî nexweşxaneyê kumbuyn, çi kesek nema), bhevre di gel babê min u Xalid Yusufî u xêzana wî ji bo zaxu bi rêketîn ji bo naştna wî.[186]

li sbeya Roja li şunde gehşitîn zaxu, rêwresmên naştna wî bi rêveçun li jêr çavdêryek tund jaliyê rjêma Sedamî, [187] lê xelkek zaf ji nafçeyê bejdarî naştinê bun, u li wir gencihk li bin navê (seyda ehmed) helbestekê pîşkeş dike, wpiştî çend mehekan jtîrorkirna seyday, xêzana wî birryarê di de li bajarê zaxu jiyanê bi bene ser wêdî venegerrn bexdayê.[188]

Li 16 ê tebaxa 1997 an, bi helketna Damezrandina parta demukrata Kurdistanê, jaliyê hikumeta herêma Kurdistanê li ser firmana serokê herêmê u li bin çavdêrya parêzgarê Dihukê ('ebdul'ezîz teyb), bi destê hunermend (reşîd ‘Elî reşîd), peykerek ji bo tê çêkrin u li sentera bajêr tê danîn, u cade u meydana li hundirde bi navê şehîd (Salih Yusufî) bnaf kirîye, drêjya peykerî sê metre li ser bilindahya du metran hatiye danandin. [189]

**2.2.1 Aliyê Siyasî u Neteweyî**

( ( Salih Yusufî) Kurdê têkuşerê Kurdînî bi helbest u Gotar wihzir u boçunên xweyên Kurdewarî peydakrî, bi rêya qelema xwe xizmeta duza gelê xwe kirîye, ji bo danana dewletek Kurdî her tiştê ku hey dvê rê yêde danaye, hetaku buye yek ji kadrên pleya yekem yasiyasetê, mîna pêşmergeyekî heta bi destên rjêma be'si were şehîdkrin.)[190] piştî derçuna (Yusufî) ji kulîja nav bihurî, li bajarê mîsl tê damezrandin mîna katbê yekemîn li dadgehê li bajarê mîsl her ji çaxê dewleta 'usmanî sîmayek şaristanî u rewşenbîrî jêre diyarbu, li wî çaxî 'erebên bajêrî lqekê Komelleya (îtîhad wtereqî) vekir, piştî Darbeya desturê 'usmanî li 22î tîrmeha sala 1908 an ,

186. Bengîn Xelîl, ji malbata yusufî, dîkîwmenterî bi helketna yada merasîma rêzanîna şehîd (yusufî), hewlêr, 2/7/2012.
187. https://ar.wikipedia.org/ *didara Zozan Salih ,Sehid salih yosfi*,dawi seredan li 23-11-2016.
188. Luqman Yusifi, ji malbata yusufî, dîkîwmenterî bi helketna yada merasîma rêzanîna şehîd (yusufî), hewlêr, 2/7/2012.
189. http://sotakhr.com/,dawi seredan li 23-11-2016
190. Kamîran Mehemed Nebî, *qunaxa werara hizra netewayetî di huzana kurdîda ji destipêkê heta dumahîya sedê bîstê, nameya dikturayê*, kulîja zmanan, zanîngeha selahedîn, 2005, r .298.

Dîsan Kurdan li heman bajar li 17 î kanuna yekem ya sala 1908an, lqekê kumeleya ( Kurd te'awn u tereqî cem'yetî) vekir... Dîsan xuyindkarên Kurd kumelleyek li bin navê (Hîvî) li salên (1911-1912) ande damezrand.[191] Komeleya (îstîqlal elKurd) jî, li wî çaxî hebu u tayek li mîsl damezrandibu, belê di rastî de hêvyên Kurdan zêdetir bun li sala 1920 an, dema peymana (sîver) ji aliyê hevpeymanan hatiye damezrandin ku di birrgeyeke wêde hatibu, ku mafê Kurdaye dewletek Kurdî hebe, cara yekemîn mafê utunomî u li şunde ragehandina serixwebunê, belê ji sedemê nerazîbuna turkya u hezkirna brîtanya bi danîna tevaya 'Iraqê li jêr deshelata xwe, peymana henê nehat bcih anîn...(Yusufî) bi evîna Kurdistanê u şîrê Kurdistanê mezin buye, Kurdistan kanya helbestên wî buye, helbest u Kurdayetî u armanca serixwebunê bi hevre buyne kevalên agrîn, hetaku dîRukek nemir li şun xwe bhêşe , mîna helbestên ( welatê min, Kurdistan, bese bese kelî Kurdan, Ruja xeyrî ...) baştirîn mînakên hesta wî yên netewî buyne. Li sala 1941 ande, di helbesta li bin navê (kela hevlêrê) de , zêdebarî diyarkirna dîRuka bajarî; derdê hejarî u bin destîya wan aşkera dike:[192]

***Çi Hawar li taq dengî venaden***
***Çi findên hêvya Runahî naden***
***Kela hevlêrê pir ax u uyî***
***Byanî mîrn rezîl bun xuyî*** [193]

Seydayê Yusufî li vir desnîşana wan hêrşan dike, yên ku bi ser bajarde hatîn mîna ( eskender meqdunî u teter u mexul u turkan....), u çawan Cihê ulê wan yê zeredeştî, Musil manetî hat belafkirin, dîsan li Cihê fermandarên Kurdan ew bune fermandar u Kurd bune xulam u mêhfan li ser axa welatê xwe. Helbesta henê nîşanî me di de ku Xebat u bergirîkrin, rêke çareye jbuy derxistna dujminî ji welatî, her dîsan (Yusufî) brêya damezrandina çendîn partên siyasî mîna ( Hîvî, Rizgarî, parta demukrata Kurd u Sosyalîst ... ) dilsuzane karkiriye, dîrukek Xebat gêr zor pak li şun xwe hêlaye...[194]

---

191. Zozan Salih elyusufî, *b.n.b*, r. 19- 20.
192. Kamîran Mehemed nebî, *qunaxa werara hizra netewayetî di huzana kurdîda jdestîpêkê heta dumahîya sedê bîstê* , r.299.
193. Reşîd Findî, *b.n.b*, r.59.
194. Kamîran Mehemed nebî, *b.n.b*, r. 299- 300.

(Yusufî) dhelbesta xweya li bin navê (benda şerê cîhanyê duyem )de, li sala 1942 an hatibu nvîsandan , wan kêmasî u derd wibrînan diyard ke ku gelî Kurd li serdesta faşsit u nazîyan dîtî, Ruyê wanê reş aşkere bu, ku êdî kes bi a xiftna wan nake, u yaku hemberî miruvayetyê anî ziman, çucar nayê jbîrkirn:[195]

***Xwênêt bê guneh hatine riştin***
***Bçuk u jink pîr u kal kiştin***
***Jarî mşextê belavbun miştin***
***Talan ramalê çi tişt nehiştin***
***Leşên miruva bi agrî şuyiştin***
***Bi tank u tupa hatine brīştin*** [196]

Di her rewşek necêgîrde , hîmmeta wî dijwartir u bihêztir di be, karên xweyn siyasî ji bo serbestya welat bikaranîne, ji encama bawerya xwe ya nehijyayî, suzekê di de Kurdistanê ku bi evîna wê ye şîrîn wXebata şêrane bi serdujimnan de serkeve:

***Kurdistana can***
***Dî her serbest keyn***
***Xebatagiran***
***Pêş kêşî wê keyn***
***Dê mergêt erzan***
***Her gurî wê keyn*** [197]

Yan li cihek din dibîje

***Welat netirse, hezar hezarîn***
***Bu Jîn a neyara jehrê dmarîn***
***Gurya evînê yate sutîn xarîn***
***Nav şeRuk u rmêna şêrên harîn***[198]

---

195. ‘Ebdula yasîn amêdî, hunrawey bergirî le berhemî çend şa'êrêkî (k.s) 1939-1970, çapxaneya kurê zanyarî kurd, hevlêr, 2005, r.236.
196. Reşîd Findî, *b.n.b*, r.112.
197. Kamîran Mehemed nebî, *b.n.b*, r. 300.
198. ‘Ebdula Yasîn Amêdî, *Hunrawey bergirî le berhemî çend şa'êrêkî (k.s) 1939-1970*, r.218.

Di beşek din de li helbesta (Welatê Min) ku Xebata gelî xwe pêxemet Kurdistanê dest nîşan di ke, u amaje bi wê yekê di de ku her tişt ji boy wlatî qurbanî di ke, tenê ku bi serbestî jiyan bi be ser

***Kurdistan dê bêjîn  dê rêJîn***
***Xuyna xu Jîn axu xweha xu hêza xu***
***Jiyarey diyarî rizkarî slaf îy***
***Kurdistan .... Kurdistan*** [199]

Helbestvanê syasetmedar hêrşê di ke ser împiryalîzmê u dezgayên wê, u aşkera dike ku miletê me bi dijwarî li hember radweste u hertim mîlet amadeye jinav bi be, herdîsan bi rengek nayab behsa peywendiya gelê xwe bi gelên din re dike, u mîna şemalkekê xwe di de nasîn ji bo Runkirna rêya azadî u serbestyê wderxistna diz wdagîrkeran, u amadebuna xebatkarên kurd ji bo avakirna Kurdistanê dema di bêje:

***'Ereb u Kurd di gel êk dust u birane***
***Ist'mar u kefên pîs djimnêt xrane***
***Kardizî u rêgrî gunee u tane***
***Birandin qelandin kar destên gela ne*** 200

(Salih Yusufî) bajarên din yên Kurdistanê jbîrnekrîne bi taybet slîmanyê, u her bajarekî cihek taybet heye di hundirî helbestên wî de, bajarê henê li çerxa bîstê li salên bîstande, Cihê şurşên Kurdî buye bi Serkirdayetiya Şêx Mehmudê hefîd, heta salên sîhan jî dum kêşa, serukê parta hîwa (Refîq Hîlmî) li slîmanyê bu, u Yusufî berpirsê partê bu li navçeya behdînan, lewma zur seredana bajarê henê di kir u Xebat u berxudanên xelkê wî bi bune mînak li cem seyda (Salih Yusufî), helbestek li bin navê (Ruja xeyrî) bi wê yekê avakiriye , dur nîne li salên (40)ande, hatbe nfîsandin, u têde pesna bajarî di ke u di bêje:

---

199. Salih Yusufî, Kufara Runahî, *welatê min*, hejmare (4), kanûna dûyem, bexda, 1961 , r.22.
200. Reşîd Findî , *b.n.b*, r.159.

***Hatim bibînim şarê cindiya*** [201]

***(Silîmaniyê) warê zîndiya***

***Şemalka hîviya şar u gundiya***

***Kela honera hêz u tundiya*** [202]

Li dawîya sallên (30) ande ji çerxê bihurî, piştî bellavbuna dengubasên boyera kuştna (şae xazî) li nîsana 1939 an, li seranserî ‘Iraqê xwenîşandanên giştî tên krin u li bajarê mîsl xwendkar u law li pêşya xwenîşanderan de bun, yên ku daxwaza derketina dagîrkeran di kir, vê yekê kumelleyek genc u law palldan u dnav de (Salih Yusufî) bu, li ser Damezrandina kumelleyek siyasî ya Kurdî ya nhênî li b navê (brrosk) bi serkêşya van gencan: (hemze ‘Ebdula, Salih Yusufî, ekrem reşîd, şefîq se'dula, sedîq etRuşî, hisnî zaxuîy ) bu... Di kumbîna xwe yayekemîn de xwendkarek ji xelkê zaxu hat helbjartin ku bi be serokê Komeleya henê, u çendîn armanc hebun mîna

- Bellavekirna hizra netewîy ya Kurdî.
- Bellavekirna rewşenbîriya Kurdî Di hundirê xelkê Kurdistanê de.
- Balldana xelkî ji bo berixwedanê, dema xelkê Kurd hestipêkrî ku neteweyekê bin deste u mafê wan pêşêl di be. Li salla (1939)an, têkelî parta (hîwa) buye u peywendî di gel serukê partê (refîq hilmî) re hebuyne, u buye endamek ji damezrênerên parta henê .[203]

Jinafçuna parta (Rizgarî) di be sedemê peydabuna parta (demukrata Kurd) ku li berwara 16 tebaxa 1946 an, hat damezrandin bi bzav u piştgîrya kumeleyek jseRuk u kesayetiyên partên Kurdî, (Salih Yusufî) li kungirê yekemîn ya parta nav bihorî de bejdard be u yek bu jendamên serkirdayetî ya parta henê u di be endamê kumîteya navendî u berpirsê liqa partî li behdînan.[204]

201. Cindî: peyveke kurdî kefnare, yanku cwane, taze, baqij, rêk û pêk, kelek di axiftnên rujanede di hate bi karanîn di filklura kurdî de.
202. Reşîd Findî , *b.n.b*, r.159.
203. Zozan Salih elyusufî , *b.n.b*, r.20-21.
204. ‘Ebdula Yasîn Amêdî, *b.n.b*, r.234.

Piştî (Kerkuk u hevlêr) dibne parçeyeka leşê têkuşerê henê, bakurê Kurdistanê u malbata (Bedirxanyan) dibne hêvênê Kurdînyê, ber bi (mehabad)a xuynawî di çe, hetaku tazîya wî bgêre wrola faşîzma cîhanî u şahê drinde diyarbike:

***Îsti'mar u Şahê bê bext***
***Talan krin ala u paytext***
***Şarand drindî u sext*** [205]

### 2.2.2 Damezrandina Komara Kurdistan li Mehabad

Piştî Damezrandina parta demukrata Kurdî li payza sala 1946 an, bejdarî Serkirdayetiya (kumara Kurdistan) dike, piştî di gel barzanyê nemir u kumeleyek Xebatkar u şorşigêran bi hevre çun ji bo mehabadê li Kurdistana Rujhelat (îranê), belê piştî demek kurt ji ragehandina Komara henê, leşkerê îranê ber bi Kurdistanê hat u dest bi serde girt u jnav bir bi hefkarya turkya u sufyeta berê, amanca wan jî djayetî u jnavbirna gelê Kurd buye, di encamde li (30) adara 1947 ande, qazî Mehemed u birayê wî (êedir qazî) u kurmamê wî (seyf qazî) hatne sêdaredan. Li şunde barzanî u hevalên wî berb Yeketiya sufyetê çun, u rjêma şahîya 'Iraqê biryar da ku xwe radestî hikumetê biken u hinek ji wane biryara sêdaredanê ji bo derketbu, ( Yusufî) bi vê buyerê Gotarek drêj nvîsandye li guvara (elcamî'e) Rupelê (76) an, li bin nav u nîşanê ( feşela syaseta deste serkirna bê qeyd wmerc ), u tîde hêrş krîne ser hikumeta şahane, u ji ber wê yekê dwere girtin u rewanekrin ji bo (hle) li başurê 'Iraqê.[206]

Dema şorreşa 14 î tîrmeha 1958 an destipêkrî, li wî çaxî (Yusufî) berpirsê liqa behdînan buye, ( li zaxu rolek kartêker u mezin di piştgîrya şureşê de hebu, li berwara 9 ê kanuna duyemîn ya heman sal, partî demukrata Kurdistanê daxwazek pêşkeşî dewletê kir, ku mulet jêre bêt dayin ku dest bi çalakyên xwe bike ).[207]

---

205. Reşîd Findî, *b.n.b*, r.73.
206. Zozan Salih elyusufî, *b.n.b*, r.25.
207. Binêre:
- Kamîran Mehemed Nebî, *b.n.b*, r.30.
- Rşîd Findî, *kartîkirna şureşa îlunê li ser huzana kurdî*, kuvara Metîn, j(68) xola sêyem, 1997, r .34.

Li sala 1960 ande,.. Bi hevre di gel çend hevalên xwe yên şureşgêr piştî daxwaza desturdana hizba (partî) krî, ku pêkhatibun ji (mela mistefa barzanî, Salih Yusufî, îbirahîm ahmid, nurî şaweys,...) , u li Ruja (9) ê şuwata heman sal destur wergirt. [208] Di birrgeya helbesta (benda felestînê) de li sala 1948an,[209] ew nexweşî u derd u belayên sergelê Kurde hatîn , bi êş u azarên gelê felestînê re grê dide hemberî împiryalîzmê u dagîrkeran hev heluyist buyne jbuy serbestî u serixwebunê

***Kurdistan u felestîn***
***Îst'marê zur gestîn***
***Dest u pê li me bestîn***
***Xweh u xunê li mersitîn***
***Bext u suzêt nvistîn***
***Bahir u bişkêt qersitîn***
***Em azadî persitîn***
***Şêrn ji tora versitîn*** [210]

Li 15 ê çirya yekemîn ya sala 1960 an, tê deste serkrin li hewa destigîrkirna endam u serkirdeyên partî, (Yusufî) yekemîn kes bu hatiye deste serkrin u zîndankrin, u hat veguhastin ji bo bexdayê u carek din were zivrrandin ji bo zîndana mîsl u paşan hat azadkrin, li şunde bo demekî biryara destigîrkirna wî derket, belê wî li bexdayê xwe u ndakir ku li wî çaxî berpirsê liqa pêncan ya partî bu bi nihênî.[211]

Dema şureşa elulê 1961 an despêkrî, seydayê helbestvan berpirsayetyeke siyasî giring di rêzên şureşê de wergirt, u di gel serketnîn pêşmergey u astê dlêrya wan, helbestîn berz wern vehandin, u Rundik nedriştin, belê bnavê wana wern gazî krin u piştgîrya wana dikir jbuy bergirî krin u serketnê, cwantirîn helbest di vê barîda were gutin, birgeyeke helbestekê ye li bin navê (Heware)

---

208. Reşîd Findî , *b.n.b*, r. 18-19.
209. *h.b*, r .167.
210. *h.b*, r .103.
211. Zozan Salih elyusufî, *b.n.b*, r .33.

***Heware Heware Birayino Heware***
***Kurdistan ey welat Mergê meye xelat***
***Şefeq da Rujhelat HerXebat herXebat***
***Şureşê bşarînin Mêranyê barînin***
***Mizgîniyê bigehînin Azadyê bbarînin***
***Heware Heware Birayinu Heware*** [212]

Li vir weha diyard be ku (Yusufî) vyaye ji bo dujimnan aşkera bike, ku çend caran hewl bden wellat dagîrbiken yan parçe parçe biken u hzir biken bdeyne destê wan, belê xeyala wan dujimnan dikete aşupek u Xebatkarên Kurd hertim sîngê wan girtye u nerawestyayine ta derxistin u nemana wan u desveînana azadî u serbestyê ji bo gelê Kurd. Desthellatê derfet da parta demukrat ji bo kar u çalakyan, li 9 ê şiwata 1961an, u (Yusufî) mîna endamê lîjna navîna partî ji bo cara duyemîn hat helbjartin di kungreyê pêncan yê partî de, li salla (1962) ande, buye endamê lîjna navîn u endamê nvîsîngeha syasya parta demukrata Kurdistanê.

### 2.2.3 Darbeya Sala 1963 an

Li sala 1961 ande vegeryaneve ji bo mîslê piştî hatî berdan, u li şunde bi çend mehekan ferman ji bo girtina wî cardin derket, belê xwe li bexdayê windakir u li wî çaxî berpirsayetya liqa (5) an ya partî dikir bi awayek veşartî. (Piştî Darbeya ser(‘Ebdulkerîm qasmî) çêbuy li 1963 ande, li îvarya heman roj (Yusufî) di gel hinek hevalan çune baregayê radîyuya ‘Iraqê ku bingehê serkirdayetî yê derbeya wî çaxê bu, nameya piştgîrya Serkirdayetiya şoreşa Kurdî bi wan re gehand).[213] (‘Elî şengalî) hefsenger u xwendikarê (Yusufî) di bêje: ( dema Yusufî karmendê dadgeha şingalê, li wî çaxî mamustayê min bu u partayetî u dilsozî u rewşitê Kurdînyê min jêre wergirtye, u li ser destê wî çuyme hundirê parta demukrat ).

212. Rşîd Findî, *kartîkirna şureşa îlunê li ser huzana kurdî* , r.34.
213. Zozan Salih , *b.n.b*, r. 35.

Dîsan li şiwata 1963 an bi hevre bum dema di gel nunerê be'syan li çayxaneya sedir elqenat (‘Elî Salih se'dî) Runşitî, ji bo Darbeya henê, wid encam de serketin desxist, lê rjêm li sozên xwe lêve di be.[214]

Bi Damezrandina hikumeta yekemîn  ya (be's) li adara heman sal dest bi cvîna kir di gel Serkirdayetiya şureşê, weha diyar bu her ji serêve daxwazyên şurşê nehên bi cih anîn u xwe berhevkir ji bo hêrişkirnê bo ser Kurdistanê u li 10/6/1963 dest pêkir, car din (Yusufî) çu nav şurşê u berdewam bu li ser karê siyasî u mediyayî ).[215] ( li sala 1964 an , mela mistefa barzanî kungirê şeşan grêda li bajarkê qeladzê , piştî hevrikî di nîvbera parta demukratde çêbuy u di encamde barzanî mîna seRuk part hat helbjartin, di heman demde nêzî (14) endaman li mekteba siyasî u lîjna merkezî hatin durxistin, jiblî tenê du endaman ku Salih Yusufî u şewket akreyî bun ).[216]

Li dawîya sala 1964 an, car din cvîn hatin encamdan di gel hikumeta ‘Iraqê (Yusufî) yekbu ji endamên hnartî ji bo cvînê. ( Li sala 1965 an şer dijwartirbun, xweser li werza havînê u (Yusufî) li wî çaxî li nava şoreşêde bu u berpirsê mîdiya ya wê bu, u Xebatkarê beşa radîwya şoreşê bu, u ji sedemê giringya wî ya siyasî li wî çaxî hikumeta ‘Iraqê kerb u kîneka mezin jêre girt u fşar xiste ser xêzana wî, daku bi zivre bexdayê... Ji sedemê wê yekê xêzana wî li bajêrkê zaxu ketne jêr nexweşyê wifşara rjêmê, u li dawî nekarîn (Yusufî) vegerînin, lewma xêzana wî hinart bajarê mîsl, u jna wî jkarî hat durxistin ku mamusta bu wtenê wê kardikir ji bo îdareya xêzanê, belê xelkê nafçeya henê gelek çavdan jêre di kir u destê alîkaryê jêre drêj dikir ). [217]

Li sala 1966 an, (Yusufî) çaxê ('ebdulrehman 'arf) serok Komarê ‘Iraqê carek din endamê şanda cvînê bu di gel hKometê, u dencamde beyannameya 29 î xizîrana 1966 an derket, ku hinek ji mafên Kurdan wern ragehandin mîna derkirna Rojnameya (Elteaxî) u (Yusufî) mîna berpris u xwedî îmtiyaz u sernivîser hat danîn.[218]

---

214. ‘Elî şengalî, hefsengerê yusufî, dîkîwmenterî bi helketna yada merasîma rêzanîna şehîd (yusufî), hewlêr, 2/7/2012.
215. Reşîd Findî, *b.n.b*, r . 20.
216. Zozan Salih elyusufî , *b.n.b*, r.42-43.
217. *h.b*, r. 44-45.
218. Reşîd Findî , *b.n.b*, r .20-21.

Dema di çu civînan nivînên wî yên nvistinê hertim di gelde bun u hizra zîndanê hertim li pêş çavan bu. [219] Serkirdayetiya Kurdî u parta demukrat (Yusufî) helbjart, ji bo bellavkrin u Runkirna pêngavên partî u şureşê u şrrovekirna daxwazî u mafên gelê Kurd ji bo gişt gelê ‘Iraqê, rabu bi damezrandin u derxistna Rojnama (Elteaxî) li Bexda ku di be yekemîn sernivîserê vê rojnamê. (Yusufî) li salla (1967) an, xêzana wî j(şirgat) ji bo Bexda were vegwehestin u berdewam di be li geşta xwe di gel syaset u Rojnamegeryê bi rêya Rojnama bihorî piştî hatna parta (be's) ji bo ser desthelatê, hevbendyên (Yusufî) di gel parta henê Cihê gumanê bun, bi taybet dema aşkerabuy ku di gel şandê şorreşa Kurdîye.[220] )

Piştî razîbuna hikumetê ji bo cvînê di gel bizava Kurdî, şandek hat hnartin ji bo bexdayê pêkhatibu j: (Salih Yusufî, nurî şaweys, Dara Tewfîq, Mehmud 'usman, muhsin dzeyî, nafz cihlal, Mehemed memhmud 'ebdulrehman ), piştî çendîn caran hatin u çuna şandê Kurdî ji bo Bexda li pey bendek cvînê, Kurdan maf hebu (5) wezaretan wergrin, yek ji wane (Yusufî) bu mîna wezîrê dewletê ji bo kaRubarên Kurdistanê hat helbjartin, u çendîn caran buye wezîrê çend wezaretekan bi wekalet, herWehe nwênerê serok Komarî bu ji bo çend welatên 'erebî u byanî, dîsan cêgrê serokê Komeleya hevallînî u harîkarya îraqê buye. [221] ( Li 17 î tîrmeha sala 1968 ande, Darbeya parta be'si dijî hikumeta ('ebduselam 'arf)î çê bu, ehmed Hesen bekir serokatya Komarê girte dest bêy xuyn riştin, bi hatna hikumeta nu peywendyên Yusufî ber bi alozyê çun di gel endamên hikumeta henê, taybet ew cvîna dnîvbera wî u (Sedam) î de çêbuy, li ser şikestna misryan bi Serkirdayetiya (Cemal 'ebdulnasr) di gel îsraîlê, ku Sedamî bi awayek krêt behsa vî serkirdê nav bihorî krî ku kesek Xebatkar u dilsoz bu, (Yusufî) bi tundî berisva wî di de u di bêje:

(( to çi kes xwe hsab dkî ku behsa hêmayek weha bkî, her kesek 'ereb dvê piştgîrya serkirdê henê bike)). [222]

Cardin hikumeta nav bihorî li sozên xwe hemberî Kurdan poşman bu li beyannameya (29)î xzîranê, u car din şerî hilda u ptir jçend caran cvîn dnîvbera herdu alyan de dumkir, ku (Yusufî) yekbu ji endamên şanda Kurdî. [223]

---

219. Zozan Salih elyusufî , *b.n.b*, r.54.
220. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *b.n.b*, r. 10.
221. Reşîd Findî , *h.b*, r.21.
222. https://ar.Wikipedia.org/wiki , *Zozan Salih ,SalihYosfi* ,dawi seredan li 20-11-2016

Li salla 1968an, Rojnama (Elteaxî) li 6 ê çirya duyem li 1969 an hat girtin , u biryara uperasîwuna leşkerî ji bo ser nafçeyên Kurdî hat dayin, li şiwata salla 1969 ande, liqa pênc ya partî li Bexda hat vekşandin, (Yusufî) Bexda bi cih hişt u gehişte şorreşê, u xêzana wî li Bexda ma,[224] heta gehşitîne rêketnameya (11)î adara (1970) an, u mafê utunumî ji bo mîletê Kurd berçav krî.

( Piştî rêketna henê (Yusufî) vegerya bexdayê mîna wezîrê dewletê dihikumeta merkezya ‘Iraqê de bi karbu, u berpirsê liqa (5)an ya partî wergirt, dîsan seRukatya Yeketiya nvîsevanên Kurd u Komeleya rewşenbîriya Kurdî bu, di heman dem de sernivîserê Kovara (Rojî Kurd) bu, u endamê lîjneya aştî u..). [225]

Li bexdayê dema ahenga Rêkketinameyê de, (Yusufî) di gel herdu barzanî u Mehmud 'usman u norî şaweys u muhsin dzeyî u dara tufîq, amadebun bi hevre di gel serok Komarê ‘Iraqê (ehmed Hesen bekir) bi berhevbuna (Sedam husên) u hinekên din, li hevhatna henê karek dîrokî bu, u dlîlê aştî u biratya neteweyên Kurd u 'ereban bu, di çêkirna hikumeta nu ya ‘Iraqê de, ku pênç wezaret ji bo Kurdan hatin dayin, u yek jiwane seyda (Salih Yusufî) bu, ku buye wezîrê dewletê. [226]

(Yusufî) bejdarî definkirna serokê mîsrê (Cemal 'ebdulnasr) de kirîye, u hevbendî di gel çendîn serok wellatan de hebun, mîna: (hafz esed serokê surya yê bihorî, u qezafî serukê lîbya yê bihorî, u yasr 'erefat, wserokê tonsê borqîbe, u serokê kuytê yê wî çaxî, dîsan ze'îm kemal cumbulat). [227]

---

223. https://ar.Wikipedia.org/wiki , *Zozan Salih ,SalihYosfi* ,dawi seredan li 20-11-2016.
224. Zozan Salih elyusufî , *b.n.b*, r.54.
225. Reşîd Findî , *b.n.b*, r.21-22.
226. Zozan Salih elyusufî, *h.b*, r.57.
227. *h.b* , r. 58.

Carek din piştî ji bo şoreşa Kurdî u Serkirdayetiya wê aşkerabuy, ku hkumet sozên xwe bi cih naîne, li sala 1971 ande li kungreya (7) an ya partî, (Yusufî) cardin bu endamê mekteba siyasî, hikumeta ‘Iraqê ji aliyekê wezîr pêşkeşî Kurdan dikrin u azadiya karê siyasî peyda dikir u derkirna Çapemenîya Kurdî u vekirna kenala (Kerkuk) yê Kurdî, lê ji aliyek din çend bzav krin ji bo:

1- Terorkirna barzanî li 29-9-1971 an.
2- Veguhastna 'ereban ji bo parêzgeha Kerkukê u bajarên şengar u xaneqîn u Şêxan.
3- Derxistna hezareha xêzanên Kurdên feylî ji 'Iraqê. [228]

(Yusufî) jiblî ku endametya mekteba syasya parta demukrata kuristanê dikir li 1962-1975 an, karên li berya niha me aşkerakrîn, (dîsan endamê cvata nexşekêşana perwerdeyî bu, serkirdekê navdar u pêşeng bu... Di hundirê rêzên şoreşa îlunê de, hevalek zêde nêzîkê mela mistefay bu ). [229]

Li destipêka salla (1974) ande, cardin cvîn di nîvbere hikumeta îraqê u Serkirdayetiya Kurdî were destipêkrin, şandê aliyê Kurdî pêkhatibu jvan kesan: ( Idrîs barzanî, Salih Yusufî, Mehmud 'Usman, Nurî şaweys, Samî 'ebdulrehman, Hebîb Mehemed Kerîm, Dara Tewfîq, Ihsan Şêrzad ), piştî têkçun u alozbuna peywendîyan di nîvbere rjêma Bexda u Serkirdayetiya şorişa Kurdî, sê bingee ji bo çavdêrkrin u serperşitîkirna karên leşkerî u siyasî hatne diyarkrin u (Yusufî) di be çavdêrê bingehê sêyem li devera behdînan di gel çend kadrên partayetî u leşkerî u ji diyartirînên wan kesan ( Ershed Xuşevî, Reşîd Fndî, Hesu Mîrxan, Tehsîn Etroşî, Hemîd Akreyî, Fazil Mîranî, Mistefa Nêrweyî, ‘Elî şingalî, Hemîd Efendî ) bun.[230]

---

228. Muhsin Dizeyî, Gotarek li bin navê (*çawan te şehîd Salih yusufî naskirye*) , selaheddîn, 6/6/2004, ji erşîfê necmeddîn yusufî.

229. Binêre:
- Rojnameya elcimhurye, bexda, hejmar (720), 30/4/1970, r.5. -
- Rojnameya elhedef, zanîngeha kwêt, hejmar (490), 12/3/ 1971, r.10-11.

230. Harûn Mehemed, gutarek li bin navê ( *kurdê sufyê hatye kuştin bi pusteya bumbekrî*), lenden, 18/10/1003,ji erşîfê Necmeddîn Yusufî.

Li heman sal li 1974 an, (Sedam Hisên) bzavkrin parta demukrat têkbde, u di bêje (Yusufî), gereke ji barzanî u parta wî durkevî, her wezaretek bi xwazî emê pêşkeşî te keyn, di bersivê de di bêje: (( ez xyanetê nakem Kurdê kurrê Kurdanim.)) Her li adara heman sal; hikumeta 'Iraqê ji aliyê xweve yasaya utunumî ji bo Kurdan derxist, bê ku boçuna Serkirdayetiya Kurdî u mafên wana li ber çav werbigre, ef yeke bo sedema vekêşana wezîrên Kurd u gehiştna wan ji bo hundirî şorşê u cardin hêrşan despêkir, bi taybet ser bajarkê qeladzê, u di gelde xêzanên wana hatne durxistin u ji bo çiyayê sefîn Cihê şurşigêran hatin veguhestin, u li şunde bo ser snorê welatê îranê, hinek xêzan çune (şnu) u yên din çun ji bo (nexede), ku xêzana (Yusufî) yek ji wane bu. xebat u berxudana gelê Kurd berdeam bu, u babetê helbestên henê li cem (Yusufî) , babetek herî giring bu, ku li çaxê salên sîhan u çlande ji çerxa bihorî corê henê yê helbestê zurê kêm bu yan hernebu, seydayê (Yusufî) fêrsê vî babetî bu , rewşa Kurdistanê ya wî çaxî jşerê cîhanî yê duyem u kawdanên mîletê me di hundir de di jya, hemberî jiyana nuke cudahyek mezin tuneye, tu dbîjî evRu (Yusufî) dnaf medeye, dema behsa bê tebayî u neyek rêzîya gelê Kurd dike, ku bi sîfetek kevnê Kurdan di de zanîn...

Mîna dîruknifîs u Rujhelatnas jî di den diyarkrin, herdema Kurd bune yek, çi dujimnek xwe li ber sînga wan nagire ) [231]

***Bese bese gelî Kurda We em sutîn bi kul u derda***
***Bê tebayî welat berda Bê xudan ma Cihê merda***
***Kurdistanê lawê teme Zozan dişînin li min herxeme*** [232]

Li rêza yekemîn ya helbestên berxudan u netewî yên (Yusufî) helbesta ( Heware) ye, yaku li sala 1974 ande nvîsandî , dnaf şer u bumbebarana dujminî de , li wî çaxî seyda endamê mekteba siyasî ya partî bu li hundirî şureşê , u emîndarê giştyê dad wewqafê bu, dîsan serukê êketya nvîsevanên Kurd bu li başur,[233]

---

231. https://ar.Wikipedia.org/wiki , *Zozan Salih ,SalihYosfî*, dawi seredan li 20-11-2016.
232. Rşîd Findî , *b.n.b*, r.182-183.
233. Reşîd Findî di bîje li wî caxî (yusufî) helbesta (heware) vehand û daye destê min, û li Kofara (Nûserê Kurd) belafkir. Ji bo zêdetir zanyaryan binêr: Rşîd Findî, *b.n.b*, r.183.

Têde (Salih Yusufî) handana pêşmergê Kurdistanê di kir hemberî hikumeta (Sedam husên)î

***Heware heware***

***Birayinu heware***

***Şureşî bi şarînin***

***Mêranyê bi arînin***

***Mizgînyê bi gehînin***

***Azadyê bi barînin*** [234]

**2.2.4 Rêkketina Cihzayir 1975 an**

Li her çwar salên danustandnan de, di nîvbera Serkirdayetiya Kurdî u hikumeta ‘Iraqê, (Yusufî) rolek giring hebu di pêşvebirna civînan u gehiştin bi mafên xweyên rewa bi ryên aştyane u hertim di gut: (( çi qazanca mîletê Kurd dşerî de nîne u dvê deskeftên Rêkketina 11 î adarê bi parêzîn )).[235] Belê her wek me li jur diyarkirî li 1974 an şerî despêkir.

Piştî herdu hikumetên ‘Iraqê u ya îranê li çaxê şahî li welatê Cihzaîr rêkketîn, na umêdyek li cem Kurdan peydabu, u dergehên civînan li hemberî wan hatin girtin, ( hikumeta ‘Iraqê desberdarî nîva ( şetê 'ereb ) bu, u zêdetrî (300)kim2 ji 'erdê xwe, ji bo şahê îranê li hemberî seknandna alîkarya îranê ji bo şoreşa Kurdî, li 6 ê adara 1975 an, li nîvbera şahê îranê u (Sedam Hisên) de hat îmzakirin ). [236]

Li wî çaxî seydayê Yusufî ji wê yekê di tirsya ku pîlanek dijî mîletê Kurd robde, u tirsa wî di Cihê xwede bu u pîlan hat aşkerakirin, (Yusufî) di gel wê yekê bu ku şer berdewambe bo demekê, heta bkarbe bi çe ji bo derveya welatî u xweser bo Yeketiya suvyet, da fşarê li ser herdu dewletan biken ji bo seknandna Rêkketina henê, Reşîd Fndî di pertuwa xwe (Salih Yusufî jiyan u berhem) de di bêje: (( li pey zanyaryên min hinek (name) jî hatibune nvîsandin, da di gel xwe bi be, lê mxabin delîve nebu, u biryara Serkirdayetiya Kurdî weha bu ku şer were sekinandin.[237]

---

234. Reşîd Findî , *b.n.b*, r.184.
235. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *b.n.b*, r. 11.
236. Zozan Salih elyusufî, *b.n.b*, r. 68.
237. Reşîd Findî, *h.b* , r. 27.

Li wî çaxî (Yusufî) piştî nkarî bi çe ji derve Wehe baş zanî, nebe penaberê îranê u li meha adara 1975 ande, peywendî bi hikumeta xîraqê re kir u vegerya bexdayê, u li wir yanî li mala wî xebatkar u şorşigêrên Kurd hertim kum dbun, lewma her zu hikumetê mala xiste li bin çavkirnê [238], u çucar ji bexdayê derneket heta Roja şehîd di be, li bin çafkirna wî bu dema salekê vekêşa, mîna keça wî Zozan di de xweyakrin. [239]

### 2.2.5 Damezrandina Parta Sosyalîsta Kurdistanê 1976 an

( Piştî şikestna şorişa 1975 an u veqetiyan xebatkarên Kurd ji bo îranê u 'Iraqê u hinek çune dervey welat li emrîkayê u uropa, belê hinek Xebatkarên Kurd rabun bi Damezrandina partekê li bin navê (bizava Sosyalîsta demukratîk), u li şunde di gel çend aliyekên din bi hevre partek bi navê (parta Sosyalîsta Kurdistanê ya yekgirtî ) çêkir, u (Yusufî) mîna skirtêrê partê hat helbjartin ku wî çaxî li bexdabu, di kungirê xwe yê yemîn de li berwara 12-15/5/1981 ). [240]

Bi Serkirdayetiya 'Elî 'eskerî, kumek pêşmergeyan hat şandin ji bo çiyay lê li 8/8/ 1976 ande, u li sala 1978 an (Yusufî) were daxwazkrin ji bo kungreya rewşenbîriya Kurdî li Bexda mîna yekemîn damezrênerê Komeleya henê bu, lê (Yusufî) daxwazyê ret dike. [241]

Li sala 1979 an navê partê were guhertin piştî hevgirtin krî di gel lîjna amadekarya parta demukrata Kurdistanê bi Serkirdayetiya (Mehmud usman)î, ji bo (parta Sosyalîsta Kurdistanê),u (Yusufî) carek din mîna skirtêrê parta henê hat helbjartin, li wî çaxî nameyek ji bo hevalên xwe li hundirê partê u partên din re şand, u têde aşkerakir ku di be em mfay ji şaşyên xwe bikîn u şaşyên bihorî du bare nekîn. [242]

---

238. Reşîd Findî, *b.n.b*, r. 27-28.
239. Zozan Salih elyusufî, *b.n.b*, r. 77.
240. Reşîd Findî, *h.b*, r. 29.
241. wêneyek ji daxwaznameyê li paşkuyê pertuwa Zozan Salih yusufî de (*Salih yusufî 1918-1981*) heye, r. 193.
242. Zozan Salih elyusufî, *h.b*, r. 83.

Dema rjêmê zanî ku seyda li bexdayê Serkirdayetiya parta henê dike, biryara ji navbirna wî derdike, u bi rêya nameyeke bombekrî ku jêre tê şandin u di be sedemê şehîd buna wî. [243]

Piştî destipêkirna şerî di nîvbere îranê u îraqê de, li îluna sala (1980) an, (Yusufî) tê neçarkrin ku Gotaran dijî rjêma îranê bi nvîse, lê bi behaneya nexoşyê na nvîse, belê bi neçarî dengê wî hat tomarkrin u mîna Gotar di Rojname wKovaran de li b navê (Yusufî) hatin belav krin, seyday ev yeke zor pê nexoş bu, li berî şehîdbuna wî bi çend mehan, ji Serkirdayetiya Kurdî u serok barzanî re dengubas pêre gehiştin ku jiyana wî di metrisî daye u dvê li ser wî bexdayê bi cih bihêle.[244]

Li 25 xizîrana 1981 reşekekê rijêmê li ser payisiklekê mîna posteçî xwe derxist u ber bi mala (Yusufî) de hat, piştî li dergehî di de u Yusufî ve dike; nameyekê di de destê wî u piştî çend çirkeyan pustê henê di nav destên wî de dteqe, u jaliyê Komeka dîtir ku di hundirê utombêlek pîkab dabun li pişt xanyê wî, piştî gehandina wî ji bo nexweşxanê li yermuk li Bexda li demjimêr duwê piştî nîvro u ji sedemagiranya brînên wî, Giyanê xo jdest di de.

Xêzana (Yusufî) daxwaz ji desthelatê kir ku razî be li ser veguhastna termê wî ji bo bajarê zaxo, lê ev daxwaze hat retkrin, piştî xêzana wî biryar day ku termê wî li kerbela veşêrn, desthelat razî bu ku termê wî vegwehezne zaxo u li guristana wî bajêrî were veşartin. Hejî gutnê ye ku bi drêjahya jiyana siyasîya şehîdê nîştmanperwer zêdetir ji çil sallan di siyasetê de derbazkrin, u pênc caran hukmê sêdaredanê jêre derketîye.[245]

---

243. Reşîd Findî, *h.b*, r. 30.

244. Zozan Salih elyusufî , *b.n.b*, r. 95.

245. Reşîd Findî, *geryanek dnav baxê edebê kurdî de*, r. 273.

## 2.3 Aliyê Rewşenbîrî u Edebî

### 2.3.1 SalihYusufyê Helbestvan

Her wek berî niha me amaje dayê (Salih Yusufî) gencatî u tolazya xwe di bwara siyasetêde derbazkiriye, u her dwê rêde şehîd di keve, di gel germaya siyasetê, şeydayê tura Kurdî u zimana Kurdî buye, aliyê henê di gel aliyê Xebata xwe ya neteweyî wisiyasî bi çendîn babetên jhejî aşkera krîne. (Yusufî) syaset u helbest têkelî hevkirîne, ji bo xizmeta duza miruvayetyê u duza mîletê Kurd, gelek caran siyasetê ser jêra standye u bixwe birye, lê her ji nvîsandin u helbestê dur neketîye, Reşîd Fndî dpirtuka xwede ya li bin navê (Salih Yusufî jiyan u berhem) ya sala 2016 ande di bêje wî bi xwe gutîye min: (( eger ez hinde bi siyasetê ve mjul nebam, da Cihê xwe li meydana helbestê u edebê kem )) [246]

(Yusufî) di temena (21) salî de li dumahya salên sîhande ji çerxa bîstemîn, çuye di hundirî derya ya huzana Kurdî de , mil bi mlê Xebata siyasî, çawan hizra wî ya siyasî u neteweyî geş di bu di hundirî partên siyasî de, mîna:
( kumeleya Hîvî , Rizgarî , partî ) , bi helbest derbirîn jêra dikir, u helbest mîna alavekê cwanê tekezê bi karanye ji bo armanca siyasî...
li sala 1939 ande , çend helbest vehandîne ku niha li berdestê mene, her heman sal bu , dema çuye di hundirê rêzên kumeleya ( Hîvî) [247], seyda ( Yusufî) bi aşkerayî hzir u boçunên xweyên siyasî diyar dike u di bêje [248]

***Kurdistanê lawê te me***
***Warêt şînin min her xeme***
***Gurî tebim hindî heme***
***Hata dimirm palê teme***

[246]. Reşîd Findî, *b.n.b*, r8.
[247]. Parçe helbesta henê di dîwana ('Ebdul Selam 'Elî) de ne hate dîtin, lê di pertuwa keça wî (Zozan)ê de hate dîtin, temaşeke ropela 113 an, di helbesta bese bese gelî kurda.
[248]. Reşîd Findî, *h.b* , r.145-146.

Yanî her ji lawya xwe, (Yusufî) xwe ji bo Kurdistanê terxan dike, u heta mirnê xwe dike (palê) wê [249] , weha bu u weha derket, heta dvê rêde şehîd dikeve, (Yusufî) yê helbestvan dhatin u çuna wî de di rêde gelyê dihuk ê derbazd be ji bo sersinkê u bamernê u amêdyê, u jxerîbya çiyayên Kurdistanê di gel gelyê dihukê di peyve u danustandinê di gel de dike hez di ke gelî di gel wî baxve u berisva wî bde u bêdeng nemîne...u di bêje gelî ji bo min hinek awazên xweş yan zêmaran bbêje , yanî hinek awazên xweş u sitranên xweş u hinekên nexweş u bi xem, dema di bêje

***Gelyê Dihuk î bêhna min bîne***
***Tişteki bêje cihrgî bi kewîne***
***Awaz u zêmarêt xo bi xune***
***Kovana sutim min xoş nîne*** [250]

Babetên helbestên (seyda) î prranya wan neteweyî bun, u ger mêze dikeyn dbînîn mîna rewşa îRu Kurdistan jêre derbaz di be aşkera dike, li dawiya heme helbestên xwe, mîletê xwe bê umêd nake u hertim Hîvî u umêdê di de ku her dê Rujek tê u mîletê me bi mafên xwe şad di be.

Ji bo babetê (gaz fRutnê) ku babetek herî germê mediyaya îroye, dema çavên wî bi gurrya agrê baba gurgur (Kerkuk) ê di keve ku gaz wê di suje mîna çaxê di hundir de dijîn , axînkên wî ji dil tên u helbest jêre nvîsandye, li sala 1941 ande[251]di helbesta (qirçe qirça agrêt geş) dema di bêje

***Guriya agrê te sutim Kerkuk***
***Axînk bune tê gîzan çeqok***
***Hizar xewnên ser kre zivRuk***
***Hizar fxabin buye reş çîrok*** [252]

---

249. Li Kurdistana başûr navçeya badînan (pale) yanî krêkar yan rêncber.
250. Reşîd Findî, *b.n.b*, r. 147-154-155.

251. ‘Ebdul Selam ‘Elî mîrza , *b.n.b*, r. 22.
252. Reşîd Findî , *h.b* , r. 162.

(Yusufî) hertim pişt germê mîletê xwe bu, ne bi ç hêz u aliyên din, her divî biyavîde helbestek li bin navê (bese bese gelî Kurda) , gelek gazindan ji Kurdan re di ke, ji ber bê tebayî u neyekrêzya mîletê Kurd, Wehe diyar dike ku derdê herî kujek u dum drêjê Kurdane...

Hertim (Yusufî) bi rêya helbestên xwe yekrêzya gel xwastye, wê yekê di dete berçav ku li dnê tenê Kurdistan nebe, u heme dijî avabuna dewleta Kurdî ne, u ne dewletbuna Kurdistanê di nav cîhanê de, helbestvanî pitrî (70) salan hzir jêre kirbu, ku Kurdistan bê xudane u prrî dujimne u li wî çavî gutye ( ew armanca piştî (70) salan, hêdî hêdî tête cih u nêzîk di be). [253]

***Li nav vê dnê te naf nîne    Hemî dibêjn hernemîne***
***Bê  xudan  kes  te  nîne    Çiya u geliya tazî u şîne***

(Yusufî) mîna helbestvan, çendîn derdên îro danayine hemberî çavên me, jiblî babetên siyasî u netewyên bihurî, dîsan hatiye ser basê gelê êzdî, Reşîd Fndî di pirtuka xwe de diyardike, tiştek seyre dema dbînîn li sala 1949 ande, (Yusufî) helbestek nvîsandye, di bêje îRu nvîsandye u ew bi xwe dnav rewşa niha daye.. u niha îzdî yê li meydanekê kumkirî u vê helbestê jêre di xune u derbrrînê ji hestê wan wrewşa wan ya îRu dike, helbest li bin navê (benda şingarê) ye u têde dibêje [254]

***Cihê hevgur u    Bira krîva***
***Kurdên xursitî    Mêrêt delîva***
***Welatê bi biha    Mişt zêr wzîva***
***Kurdîn em hemî    Wellate her êke***
***Êzdî  fele    Bisirman jêke..***

253. Reşîd Findî, *b. n. b*, r.165-167.
254. *h. b* , r. 173.

Di helbesta henê de, helbestvan (Salih Yusufî) gelê êzdî bi Kurdên xursitî (resen) nav di îne , ku ew li çiyayê şengarê u li tevaya chan peywendiya wan bi çu netewanrre nîne, em hemî li welatê Kurdistanê, welatê me her êke, Musilman u fele u êzdî jêkin yanî yekin, u armanca me her yeke, ewjî avakirna Kurdistana delale u jiyaneke xweş bi hevre. [255]

Di dîdara xwe de (Zozan Salih) li Rojnameya elsewt el axir de di bêje: ( srud u helbestên babê min gişt di xweş bun ku prranya wan li ser hesta netewîy bun , caran ji min u xweşka min (Torîn)ê re di xwendin, rastî ji kuratya dlê xweyê prî êş u azarên gelê me der dxist, heta niha li bîra mnin ji wane helbestên: ( Qircih Qirca Agrêt Geş ) ( Ruja xeyrî kela Hewlêrê, Heware, Dengê Xurtan, Hîfya Me, Axînkek Dinaf Gelyê Dihukê , u li gel rubarê xaburî ), niha gelek puşmanim ku min ew dengê zelal tomar nekrî. [256]

### 2.3.2 Salih Yusufî u Paqijkirna Zimanî

Mîna berî niha me amaje dayê prranya helbestên (Yusufî), babetên neteweyî bi xweve girtîne, Ruha Kurdînyê ji gencatya wî, ketye di hundirî pêlêt siyasetê mil bi mlê derbirîna hzir u boçunên xwe u diyarkirna êş u derdîn gelê Kurd brêya vehandna helbesta neteweyî, di hundirê nvîsîn u helbestên xwe de giringî daye bikaranîna zimanek paqij.

(Yusufî) bzav kiriye biryêa helbestê, zimanê Kurdî paqij bike ji peyvên byanî ugiran, u bikaranîna zimanek xweş u sivk u Run ji bo helbesta Kurdî, her ji salên sîhan u çlan ji çerxa bihurî heta nîva çerxî, salên paqijkirna helbesta Kurdî bun, jbarê peyvêngiran u byanî, ... Li wî çaxî (seyda) bi tenî nebu, lê di gel çendîn mamustayan ef kare encam gehandye, mîna ( ehmedê nalbend , Şêx Mehmud brîfkî, mela Enwer Mayî , u teha mayî.... ).[257]

255. Reşîd Findî, *b. n. b*, r. 174.
256. hittp://*Sotaxir.com*/,hittpis:, dawi seredan li 20-11-2016.
257. Reşîd Findî, *h.b*, r. 148 - 149.

Helbesta kilasîkî li ser destê mela u ulnasan hatiye damezrandin, lewma peyvên 'erebî u bitaybet di xwandna quranê de u hedîs u nehu u rewanbêjî de gelek di diyarbun, herdîsan zimanê farsî jî bikar dihat , çunkî zimanê edeb u helbestê bu, mîna şakarên edebyên (Hafzê şîrazî u Se'dyê şîrazî) u şehname ya ( fîrdewsî ), lê piştî damezrandina dewleta ‘Iraqê ya nu u belavbuna Çapemeniyê dest bi peyvên Kurdî yên nu hate krin u xwe ji peyvên zimanên din durxist. ( Lewma em dbînîn zimanê helbestê li cem czîrî u xanî wfeqê teyran u pertuwê hekarî , pre ji peyvên byanî , u were guhartin u li cem nalbend u Yusufî u mayî ku di be rewşek din, u ghurîn ya aşkeraye nemaze helbesta seydayî ji ya gişt hevalên çaxê wî berçaftire ji bo paqijiya zimanî ) [258] her ji bo mînak di helbestekê de di bêje

***Azadyê dê çînîn***
***Evînê vehînîn***
***Jîn a xweş xemlînîn***
***Aştiyê reşînîn***
***Xuyna buş frrînîn***
***Mizgînyê bi gehînîn*** [259]

Peyvên vê kupleya helbestê bê guman Kurdîne , u tenî yek peyva zimanek din di hundirde nayê dîtin , eve wê yekê dgehîne , ku saxlemîya helbestên (Yusufî) ji aliyê paqijya zimanî ve aşkera di ke. ( Li cihek din peyva (kut) bkar dîne ku peyveke resena Kurdîye, niha kîm were bkar anîn, di vê parçe helbestê de ji bo xwarnê bkar nayê , belkî ji bo (kuştin )ê hatiye bikaranîn, çunkî̧ (kujtin) jêderê karî ye u Kurdan sivk kiriye jbu (kotin) )

***Kul u kuvana helandim sutim***
***Êş u brîna kelandim Kotim***
***Zvistana reş xarm verotim***
***Xerîbya çiya u gelîya hajutim..*** [260]

258. Reşîd Findî , *b.n.b*, r. 148- 149.
259. *h.b* , r.150.
260. *h.b* , r. 153.

## 2.4 Rola (Salih Yusufî) yê Rewşenbîrî u Çapemenî

Miletê Kurd mîna mletek xwedî dîrok u şaristaniyet, li vî biyavî de bê bar nebuye, ji berku Rojnamegerî di gel çend biyavên din mîna edeb wdîRuk u babetên din têkelî hev buye, u miletê me bi gelên cîhanê re daye nasîn, ji berku çendîn kesayetiyên navdar di navde peydabuyne.

Neweyek jvan kesayetyan di biyavê Rojnamegeryêde karkirîne, vê yekê bihayê xu yê taybet heye, ji berku ( Rojnamevanî di jiyana miruvayetyêde boyerek giring u karîgerbu di gel peydabuna xwe, royê rêveçuna dîRukê ghuherrî u miruvayetî ji qunaxekê berb qunaxek din ya pêşketî u geştir bi rêvebir, peydabuna Rojnamevageryê ne boyerek demkî bu, mîna çendîn boyerên din yên sroştî u miruvayetî, ku bi tnê ropelekî yan çend ropelekan ji dîrokê ve di gre, belku boyerek dumkirî bu u hindî miruv u miruvayetî hebe, hebuna wê jî berdewam di be u berdewamyê bi karwanê xu de )[261] , ji berku weku zanistek di xizmet gel u miletan de kardike.

Seyda (Salih Yusufî) yek jiwan kesayetiyên giring u navdêr buye li seranserî Kurdistana mezin were hejmartin, ji berku (Yusufî) destekê balla di biyavê Rojnamevanya Kurdî de hebuye, bi taybet li başurê Kurdistanê u bexdayê paytextê kumara ‘Iraqê, kar di çendîn Rojnama u Kuvaranda kiriye, mîna nivîser, sernivîser yan xwedî îmtiyaz, ev der encama zîrekî u êrekî u çalakî ya wî buye di vî biyavî de, ev yeke jî jsedemê hindê ku miletê Kurd li wî çaxî de, mletek tepeserkirî buye, ji aliyekê din ve di gelek aliyên jiyanêde renge xizmetkirna miletî cure allozyek bi xweve dîtbe, belê Çapemenîya Kurdî li wî çaxî bi taybet li bexdaya paytext, renge zehmetî u nexuşyek hebuye, heta ku karîban Rojnameyekê yan guvarekê derbixen, belê (Yusufî) ev çende pişt gwe havêt u bi hemî wêrekî u hêza xwe şya bejdaryê di çendîn (Rojname u Kuvaran) de bi be, bi gelek pleyên jêk cuda, bi tenê ji bo merema xizmetkirna gel u xaka Kurdistanê buye.

261. Musediq Tovî, *b.n.b,* r. 3.

( Kesekê li berî Salih Yusufî nvîsînek bi zarê kirmancî li Rojnamegerya Kurdîde belaf nekiriye, were nasîn pêşengê Rojnamenvîsên Kurdên nafçeya badînan, ku yekemîn helbesta xwe ya Kurdî ya li bin navê (hîvya me) lnafçeya badînan li hejmar 19an ya Kovara (Hawar) de li 39 li 15/2/ 1942 ande belafkirî bi pîtên latînî, paştir di guvara (Gelavêj ) de li Bexda li sala 1939- 1949 an, helbest bellavkirîne u heta dawî jiyana xwe berdewam buye li ser bellavkirina berhemên xwe).[262]

Di xwendina min de ji bo nvîsînên seydayê (Yusufî), bawerî u wêrekyek aşkera jêrre diyard be, hertim xudê u gel li hemberî çavan bu u ji hîç keskî netirsyaye, u hemberî rijêmek dijwar seknîye mîna şîretkar u rexnegir wberhingar hemberî hikumeta ‘Iraqê u rjêmên yek li duf yekên çaxê jiyan têde derbazkirî.

Peydabuna Çapemeniyê li cem her mîlet u neteweyekê, mîna beşek herî giring u karîger ji dîroka wî miletî de were hejmartin, zêdebarî vê yekê jî biyavê henê yê Rojnamegerî; xwedî kar u bizavên çendîn kesayetiyên bernyas u kartêkere di vî biyavîde, heta di gehe astê seranserî wellatî u heta hinek caran van snuran derbas dike wid bne kesayetiyên hemu cîhanê.

Her dîsan li salên çlande bi pîtên 'erebî li Kovara Gelavêj bi çend berhemên bi hêz bejdarbuye u her ji pêşengên nivîseran bu, jiblî nvîsînên wî li Kovarên hîwa u Ronahî u Jîn mîna helbestvanek çeleng taybet piştî şoreşa 14 î tîrmehê li sala 1958 an, u ji yekemînên wan Xebatkarên Kurd bu ku kar dikir li êzkê dengê Kurdistanê li hundirê şorşê, ku li wî çaxî endamî Serkirdayetiya parta demukrata Kurdistanê bu).[263]

(Her piştî Damezrandina dewleta 'îraqî li paş cihnga cîhanîya yekemîn, belavbuna Çapemeniyê li ‘Iraqê... (Yusufî) helbestên xwe bi zimanekê paqij ji zimanên byanî belavdikrin, mîna (Komeleya Hîvî, gelyê Dihukê) ku li dawîya salên sîhande dîsan li 1940 ande (roj xeyrî) nvîsandîye, u li hejmara yekemîn ya Kovara (Ronahî) li sala 1960 ande hatiye belafkirin...) [264]

---

262. Dîdarek di gel nvîser Musediq Tovî, li bingeha siklupîdya parêzgeha dihukê, dihuk, li 5/11/2016 ande.
263. Reşîd Findî, *b.n.b*, r.149-150-158.
264. Dîdarek di gel nvîser Musediq Tovî, li 5/11/2016 ande.

Zêdetir ji bo bajarê slêmanyê hatibu nvîsandin u têde di bêje

***Rêvîngê jarim bê xanî u nanim***
***Bê çek u darim rêkê nizanim***
***Bê kar u barim ji êşagiranim***
***Kovana xarim mêt Jîn u canim***

( Li sala 1941 ande, helbesta (qirçe qirça agrên geş), di Kovara (hîwa) ya hejmara (11) an li sala 1958 ande belavekirîye.) [265] di Mijara babetê siyasî de zêdetir behiskirîye u mînaka helbestê nvîsandye li ser (Kerkukê )...

Ji berku (Yusufî) kesek netewe xwazbu, her zu gehişte hundirê Komeleya (Hîvî), ku berpirsatya wê wergirt li badînan piştî buye part, seyda zor pesna wê di ke wib Hîvî u umêd di de zanîn ji bo msugerkirna mafê mîletê Kurd, helbesta Komeleya Hîvî li salên sîhan de nvîsandibu u di belavokên Komeleyê de were weşandin, li ser Komeleyê di bêje [266]

***Dê çîn u dê burîn***
***Pêkve bi Komelî***
***Jîn ê guhirîn***
***Bi Xebata gelî***
***Da lê bistînin bi zorî***
***Daxazêt dlî*** [267]

Kesanên rewşenbîr u xebatkar, beşa xwe di nav helbestên wî dehene, bêguman bnemala Bedirxanyan beşek mezin heye di bizava netewe xwazya Kurdî de, weha hzir di kir ku xebata rewşenbîrî berdewamîya xebata çekdarîye, (Mîr Celadet Bedirxan) li salên sîhan de, Kovara (Hewar) li şamê damezran, u birayê wî (Kamîran) li salên çlan de, (Ronahî) dana u (Roja nu) li beyrotê dîsan (Stêr) u (Salih Yusufî) jî jêre bê bar nebu ji belafkirna xebata henê li wî çaxî u li wan Çapemenîyan de.)

265. 'Ebdul Selam 'Elî, *b.n.b*, r. 22.
266. Reşîd Findî, *b.n.b*, r. 177-178.
267. *h.b* , r. 62.

Helbesta (Heware) ya sala 1974 ande hatiye nvîsandin, li Kovara (Nuserî Kurd) de, li hejmareya (12) ande li hundirê şorşê hatibu belafkirin u têde di bêje [268]

***Zozana mezin ya bê xudane***
***Xurtên welatî yêt jêk cudane***
***SerKol u rîs ne dexil u dane***
***Evro Hewara şêrêt erdane*** [269]

Seyda (Salih Yusufî), sernivîserê Kovara (Rojî Kurdistan) bu, ku KuFareke rewşenbîrî giştî bu, mehê carekê bi herdu zimanên Kurdî u 'erebî jaliyê Komeleya rewşenbîriya Kurdî li Bexda derdiket, yekem hejmar li salla 1971 ande derketiye u heta niha berdewame, her di biyavê Çapemeniyê de (Yusufî) mîna sernivîserê Kovara (Estêre) bu, ku Kovareke zarokan bu u paşKoya guvara Rojî Kurdistan bu, mehê carekê li bajarê slêmanyê were derxistin, zêdebarî van karên henê yên Rojnamevanî (Yusufî) beşdarî di çendîn Kofar wRojnaman de kiriye her ji salên çlan u vir de.) [270]
zêdebarî wê yekê ku (Salih Yusufî) kesayetyek mezinê siyasî bu, lê ew weku rewşenbîrekê desthel diyar di be, xweser di byavê tore wRojnamegeryê de, Yusufî bi Gotar u vekulîn u hozanên xo cihekê berifreh u ji hejî di laperên Rojname u guvarên Kurdî w'erebî de girtîye,hizrên Yusufî di Gotar u hozanên wîde ji bo mllet u yekbun u hevkarî u rewşenbîrkirna Kurdan buye,

Serkirdayetiya Kurdî u parta demukrata Kurdistan, (Yusufî) helbjart ji bo ronkirna pêngavên partî di şureşê de u şrovekirna daxwazî u mafên gelê Kurd ji bo tevaya neteweyên 'êyraqê, rabu bi damezrandin u derêxistna Rojnama (Elteaxî) li bexda, ku ev Rojname zimanihalê partî dîmukratî Kurdistan bu, ku jaliyê (Yusufî) re were îdarekrin. [271]

---

268. Zozan Salih, *b.n.b*, r. 126.
269. *h.b*, h.r.
270. 'Ebdul Selam 'Elî, *b.n.b*, r.16.
271. Zozan Salih, *h.b* , r. 40.

Fere aşkerabikîn ku (Yusufî) sernivîserê Rojnama henê bu, serGotar u Gotara (Terîq Elteaxî u Mesamîr) di nvîse, u nêzî (428) hejmaran jêre derçun, dîsan li destipêka şoreşa eylulê li îzgê dengê Kurdistan kar kiriye, wek yekem damezrênerê Komeleya rewşenbîriya Kurdî li salla 1968 ande, (Yusufî) tê daxwazkrin ji bo bejdarîkrinê di Runiştna grêdana Kongirê rewşenbîriya Kurdî li Bexda li salla 1978an , belê ev daxwazîye jaliyê wî tê retkir...

Li 6/5/1968 ande yekemîn hejmara Rojnama (Birayetî) derçu ku paşKoya Rojnama (Elteaxî) bu, mîna Rojnameyek siyasî bi zimanê Kurdî li Bexda , Salih Yusufî mîna xwedî îmtiyaz u sernivîserê wê kardikir, ku bi tenê du hejmar jê re derketin u li salla 1968 an hat girtin.[272] ji aliyek din ve li despêka şorreşa eylola mezin (Yusufî) li êzgê dengê Kurdistana ‘Iraqê karkiriye,
Ku rolek berçav di bellavkirina hest u hizra neteweya Kurdî de hebu, karî şorreşa Kurdî bi hemî Kurdistan u ‘Iraqê re rabgehîne u hesta neteweyî li cem take kesê Kurd bellavbike.

### 2.4.1 Rojname u Kovarên (Salih Yusufî) derxistî

Ji berku hizrên (Yusufî) dGotar u helbestên wî de ji bo mîlet u yekbun u hevkarî u reoşenbîrkirna miletê Kurd buye, heta di gehe wî radey ku Serkirdayetiya Kurdî u parta demukrata Kurdistanê bi karê helbjartna (Salih Yusufî) rabun, ji bo merema Runkirna pêngavên Serkirdayetiya Kurdî di şorreş u bizava Rizgarîxwaza Kurdî de, ji bo miletê Kurd u dîsan bi rîka Gotarên xweyên Rujnamegerî hertim bzafa desketna mafên gelê Kurd kiriye.

Çapemenî yek jiwan byavane, ku di karîn bi bêjîn li dawîya nîva duyem ji sedê hevdê, heta niha Çapemenîya Kurdî gelek pêşketin bi xuve dîtiye, anku her ji destipêka peydabuna Çapemenîya Kurdî li (22ê nîsana 1898) an, ji aliyê (mîr Celadet Bedirxan) ve, ku rolê wî u bnemala Bedirxanyan, çucar nayê jbîrkrin, ji berku buye sedemê derketin u peydabuna çendîn Rojname u Kovaran, zêdebarî derketina çendîn kesayetiyên navdar di byavê Rojnamegeryê de, mîna (mîr Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan, sureya Bedirxan, Refîq Hîlmî ...).

272. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *b.n.b*, r.15-16.

(Seyday bi Gotarên xwe, u lêkulîn u helbestên xwe, cihek gelek freh u layiq di ropelên Rojname u Kovarên Kurdî u 'erebî de girtye dest... U piraniya nvîsînên wî mîlet persitî yên yeketî u hefkarî u rewşenbîrkirna Kurdan bu, ji bo azadî u serixwebuna mîletê Kurd bu,[273] u hertim dgu: (rewşenbîrî milkê mîlete u yekbuna rewşenbîran hezkirna îradeya gelê Kurde.)[274]

(Yusufî) yekemîn helbestvan bu ku li Kovara (hîwa) de, helbesta xweya navdêr (qirçe qirça agrêt geş) dijî kumpanyayên Kolonyalî yên petrolê li ‘Iraqê nvîsî, li sala 1941 an mîna li jur me aşkera krî, ku di be sruda gelê Kurd ku bi bajarê Kerkukê re gutye, hertim di helbestên xwe de; nishetan li kur u keçên gelê xwe dike ku xwendewar u zana bin, lewma dzanî bu gereke Kurd dest nedin yek u nebin yek u cud ; zana u rewşenbîr nebin, hertim jar u bin dest bi mînin. [275]

(Salih Yusufî) bi yek jiwan kesayetiyên desthell tê hejmartin, yên ku destek balla di byavê Rojnamegerya Kurdî u heta radek baş di edebyata Kurdî u bi taybet byavê helbestê de hey, di beşa henê ya vekulînê, dê bzavê keyn kurtyekê li dur wan Rojname u Kovaran bdîn diyarkrin, yên ku seyda (Salih Yusufî) bi her rengek ji rengan kar têde encamday:

#### 2.4.1.1 Rojnama Elteaxî 1967

Rojnama Elteaxî tê hejmartin sêyemîn Rojnameya aşkeraya parta demukrata Kurdistanê li ‘Iraqê, piştî Rojnameya Xebat u Rojnameya Kurdistan.[276]

Li 29 î xizîrana 1966 an, di Rêkketina şoreşa Kurdî de di gel hikumeta ('ebdulrehman bezaz) î, bendek di hundirê wêde hebu ku Kurd Rojnameyekê bi zimanê 'erebî derbixen, u jaliyê şoreşê ve (Yusufî) tê helbjartin mîna sernivîserê wê, li bin navê (Elteaxî) li 1967 an, rjêmê li wî çaxî hezne dikir Kurdan çi Rojname u Kofar bi zimanê 'erebî hebin, daku ya dlê wan nehê zanîn u biratya Kurd u 'ereban dirust nebe, u birayên 'ereb derd u azarên Kurdan nezanin.[277]

273. Kofara Rojî Kurdistan, komeleya rewşenbîrya kurd li bexda , h (2) kanûna yekem 1972, r.3.
274. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *b.n.b*, r. 14-15.
275. *h.b*, r. 15.
276. Http://farhad-mohmmed.blogspot.com/, Ferhad Ehmed Mihemed, *Meqes elreqabe*, dawi seredan li 25-11-2016.
277. Dîdarek di gel mamusta Reşîd Findî, li pertûkxaneya bedirxanîyan, dihuk, 3/11/2016.

Rojnameke siyasî Rojanebu, bi herdu zimanên 'erebî u Kurdî der di ket, xwedî îmtiyaz u sernivîsevanê wê (Yusufî) bu, desteya nvîsevanan pêkhatibu j: (Hebîb Mehemed Kerîm, necîb Baban, Mehemed se'îd caf, u 'Ebdula se'îd), hejmara yekemîn li Roja şembî 6 î gulana 1967 an derketiye, urgana parta demukrata Kurdistana 'Iraqê bu, her yek j: (Mehemed mela kerîm, Mehemed emîn usman, u 'Izeddîn Mustefa resol) kar têde kirîye, u berpirsê nvîsînê refîq çalak bu.[278]

(Çavdêrîkirna Rojnameya nav bihorî, ji aliyê parta dîmukrata Kurdistanê re bu, ji berku Rojnameyek bu zêdetir giringî bi aliyê civakî u siyasî u şorreş u Serkirdayetiya Kurdan di de, Rojname li bexdaya paytextê 'Iraqê bi zimanê 'erebî derdiçu.)[279] . Şoreşa Kurdî bi Serkirdayetiya parta dîmukrata Kurdistanê, hertim hewlla xizmetkirna miletî Kurd daye, ev yeke jî ne bi tenê bi rê yên leşkerî u siyasî buye, belku di byavê Rewşenbîrî u Rojnamevanîde jî xizmeta miletê Kurd bike.

Li sala 1968 an Rojnama Elteaxî tê girtin, nêzî (428) hejmaran jêre derketin, (Yusufî) xwedî Gotara (Terîq Elteaxî u mesamîr) bu, hemî hejmareyên wê li pirtuxaneya merkezya zanîngeha bexdayê parastîne, dîsan li Korî Zanyarî Kurd li bexda.[280]

Car din li sala 1971 an, mîna Rojnameyeke siyasî giştî derket, heftê yek car li bajarê slêmanyê piştî Rêkketina 11 î adara 1970 an, xwedî îmtiyaz (hebîb Mehemed) bu, u ser nivîserê wê (dara tufîq) bu, hejmara yekemîn li 11î îlona 1971 an derketiye, u hejmara dawyê ku ya (17) an bu, li berwara 18î adara 1972 an, (remzî qezaz) serperşitî jêre dikir.[281]

Zorbeya ser Gotarên Rojnameya henê, her (Yusufî) jêre di nvîsîn,[282] dîsan li sala 1972 an paşkuyek jêre derket li bin navê (Birayetî- birayî), mîna Rojnameyek siyasî Rojane li bexdayê, her bi îdareya nivîserên nav bihorî were îdarekrin, hejmara yekemîn li 26 î gulana 1972 an derket, dîsan (refîq çalak) serperşitî di kir.[283]

---

278. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, r. 98.
279. Wesfî Hesen, *Rojnamegerî li devera behdînan 1950- 2005*, çapa dûyem, çapxaneya xanî, Dihuk, 2012, r. 176.
280. 'Ebdul Selam 'Elî, *b.n.b*, r. 15.
281. Cemal Xeznedar, *h.b*, r .116.
282. Dîdar dgel Reşîd Findî, 3/11/2016.
283. Cemal Xeznedar, *h.b*, r. 124.

( (20) hejmar jêre derketin u hemu li kulîja perwerdeyê li zanîngeha bexdayê beşa ziman u çanda Kurdî de hene).[284] hikumeta wî çaxî pîtir ji agehyekê dane Rojnameyê, heta li hejmara (1583) li 12 adara 1974 an, tê rawestandin bi awayek ku êdî neyê derketin li bexdayê bi zimanê 'erebî, heta borîna (29) salan, cardin li 10î eyara 2003 an[285] u ketna rijîma (Sedam Hisên)î, dest bi derketnê hat krin.

### 2.4.1.2 Rojî Kurdistan (şemis Kurdistan)1971

Kufareke rewşenbîrî ya giştî ya mehane ye, mehê carekê bi herdu zimanên Kurdî u 'erebî li bexdaya paytext derdiket, ji aliyê Komeleya reoşenbîrya Kurdî li bexda, yekem hejmara guvara henê li salla 1971 an, derketiye u heta niha berdewame)[286]

Kovara (Rojî Kurdistan), giringî bi gelek babet u layenan di de, u (Salih Yusufî) sernivîser u muherrê wê bu u çendîn Gotar u babetên heme cur di hundirê Kofarêde nvîsandîne, zêdebarî wê yekê çendîn nvêserên din yên Kurd u 'ereb bejdarî di nvêsîna babetan de kiriye. skirtêrê sala yekemîn (se'îd nakam) bu, wheşt hejmar jêre derketin, u li sala duyemîn tenê sê hejmar u dumkir,[287] hemu hejmareyên wê li pertuxaneya kulîja edebyata zanîngeha bexdayê u Komeleya rewşenbîriya Kurd li Bexda parastîne.[288]

Di dîdara min de di gel mamusta Reşîd Fndî ku heval u hef Xebatkarê (Yusufî) bu, taybet li karê mediyayî li radîwya dengê Kurdistana ‘Iraqê u Yeketiya nvîsevanên Kurd de, aşkerakir ku (( baştirîn nvîsînên wî di Kovara henê de belavbune bi zimanê 'erebî, ta astek bilind ku 'ereban hertim di gut kesekê ji nvîsevanên me şêwazê nvîsîna (Yusufî) nîne, ji ber şarezayya wî ya zêde di zimana nav bihorî de )). [289]

---

284. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *b.n.b*, r. 16.
285. hittp://farhad-mohimmed.blogispot.com/ ,dawi seredan li 25-11-2016.

286. Cebar Cebarî, *Tarîx elsehafe elkurdye fî el'îraq*, çapxaneya elwetenye, bexda, 1975, r. 77.
287. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, r.123.
288. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *h.b* , r. 16.
289. Dîdar dgel Reşîd Findî, 3/11/2016.

### 2.4.1.3 Kovara Estêre 1972

Jialiyekê dinve her di hundirê Kovara (Rojî Kurdistan) paşkuyek hebu, yanî Kofarek taybet bi zaRukan re li b navê (Estêre) , dîsan (Yusufî) ji bo sernivîskarya paşkuya henê hat helbjartin, hejîye bi bêjîn ku mehê carek li bajarrê slêmanyê derdiket, dîsan yekem hejmara wê li sala 1972 an, derketiye, Kovara Estêre ( yekemîn Kovara zaRukan bu li başurê Kurdistanê derketî u mehane buye, li bajarrê slêmanyê di were çapkrin u weşandin , hejmara yekemîn li gulana salla 1972 an u hejmara duyemîn li îluna salla 1972 an u ya sêyemîn li şiwata salla 1974 an , derketîne ).[290]

Kufara henê giringyek zaf bi zaRu u jiyana zarwan di da, hertim hewl u bizava xizmetkirna zaRuyên ‘Iraqê bi giştî u zaRuyên Kurdistanê bi taybetî di da, desteya nvîsevanan pêkhatibu j: ( rizgar şewqî, ehmed seyd, ‘Elî berzincî, ‘Ebdulkerîm Mehmud Şêxanî, sedîq Mehmud berzincî), dîsan karê honerî (lale kerîm) jêre di kir,[291] u hejmara yekemîn ya Kofarê li havîna sala 1972 an derketiye.[292]

Jiblî Kofar u Rojnameyên nav bihorî, seyda (sah Yusufî) gelek îş u kar di çendîn Çapemeniyên nhênî de kiriye xweser li salên çlan de, mîna Kovarên ( Hawar, Ronahî ) yên bnemala Bedirxanyan, her dîsan li Kovara Gelavêj u Rojnameya Jîn de, u Nuserî Kurd ku ji aliyê Yeketiya nvîsevanêd Kurd li Bexda derdi ket. [293]

Li virr awirdanek kurt di dîne ser her yek ji wan Kofar u Rojnameyên têde karkirî bi Gotar u nvîsînên xwe hetaku tê tîrorkrin li ser destê rijîma zalma wî çaxî u di gehe rêbaza şehîdên Kurd u Kurdistanê.

---

290. Isma'îl Badî, *Rojnamevanya kurdî di navbera bzava syasî û rewşenbîrî de*, çapa yekemîn, dezgayê bedirxan yê çap û weşanê, 2004, r. 74.
291. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, r. 123.
292. ‘Ebdul Selam ‘Elî, *b.n.b*, r. 16.
293. Dîdar dgel Reşîd Findî, 3/11/2016.

### 2.4.2 Rojname u Kovarên (Yusufî) têde bejdarbuye

#### 2.4.2.1 Kovara Gelavêj 1939

Kovareke rewşenbîrî mehane bu li Bexda derketin, xwedî u mdurê wê (Ibirahîm Ehmed) bu, u di hate îdarekrin ji aliyê (‘Elaeddîn Secadî) re, hejmara yekemîn li meha kanuna yekemîn ya 1939 an, u hejmara dawyê li sala 1949 ande, yanî bo dema dee salan berdewam bu, u di dema henê de ji jyê wê (116) hejmar jêre derketîne.[294]

#### 2.4.2.2 Rojnameya Jîn 1939

Rojnameyeke edebî civakî heftane bu, mdur u berpirsê wê helbestvan u nvîsevanê navdêr (pîremêrd) bu, u li şunde (cemîl saîb, nurî emîn, ehmed zring, u guran) îdare wergirtye, hejmara yekemîn li 26 î kanuna duyemîn ya sala 1939 an li slêmanyê derketiye, heta 8 î şiwata 1963 an dumkir, cardin li 1971 an mîna Rojnameyeke edebî derdikeve, midorê wê (kake felah) bu, sernivîser ('ebduliqadir berzincî) bu, hejmara yekemîn li 10î kanuna yekem li 1971 an derket bu.[295]

#### 2.4.2.3 Kovara Hawar1941

Mîna Kovareke Komelayetî edebî siyasî derketbu, xwedî u bepirsyarê wê (Celadet 'alî Bedirxan) bu, li bajarê şamê li 15î eyara 1932 an,[296] heta 1933 an tenê (23) hejmar jêre derketîne, u herdu hejmareyên (25,24) li sala 1934 an derketin, u ya (26) li 1935 an u Kofar hat rawestandin heta li 15 î nîsana 1941 an ku hejmara (27) derdikeve, heta hejmara dawyê ya (57)an, li 15 î tebaxa sala 1943 an bi dawî tê, hemu hejmareyên wê ta niha li şamê çend caran hatîne çapkrin.[297]

Li sala 1939 an Komeleya hîwa ku hatiye damezrandin bi Serkirdayetiya (Yusufî), rêkxistyên wê li tevaya başurê Kurdistanê di gre, endamên wê rolek mezin di rewşenbîrkrin u hişyarkirna xelkî u belafkirna Kovara (Hawar) u çapkiryên din yên Bedirxanî u fêrkirna xelkî bi xwendin u nvîsandna Kurdî bi tîpên latînî di gêrre,

294. Cemal Xeznedar, *h.b*, r. 40.
295. *h.b*, r . 42.
296. *h.b*, r . 36.
297. Musediq Tovî, *b.n.b*, r . 19.

Di vî barîde hejmareyeka endamên Komeleya nav bihorî 1939.1943, li bajarê Dihukê tekîd di kir ku (Hawar) di gehişte wan hemuyan u wan li nafçeyê ji xwendkar u cutkaran re di de xwendin.[298]

Li Kovara (Hawar) hemberî Kofar u Rojnameyên pêşîn her ji 22 î nîsana 1898 an, cudahyek hebu ewjî yekemîn çapkirîya Kurdî bu bi tîpên latînî yên ku bi elfabêya mîr Celadet Bedirxanî di were nasîn derketî, Kovara henê tîpên latînî yên Kurdî bi Kurdan re dan nasîn, u ji xwandingeha ropelên wê de Cihê xwe girtye... U li tevaya Kurdistanê belavbun, heta îro buyne tîpên serekeyên Kurdî li gelek nafçeyên Kurdistanê, xwedyê tîpên nav bihorî heman ser nvîskarê wê bu ku mîr (Celadet Bedirxan) bu 1893-1951, ku binyat jêre dana u peyva Kurdî jêre avakir.[299]

Her dîsan piştî nîsana 1941 an, di gel nvîskarên başorê Kurdistanê, belê vê carê tenê yên nafçeya badînan u yên ku bi diyalekta kurmancya jorî di peyvîn, u li despêka wan bu di belafkirna berhemên xwe li ser ropelên Kovara (Hawar), helbestek li bin navê (hêvya me) li hejmareya (39)ande li 15 î şiwata 1942 an belafkiriye, u li şunde helbestvanên mîna Şêx memduh brîfkanî u Enwer Mayî berhemên xwe di hundir de belafkirin.[300]

Di qunaxa duyemîn ya Kovara henê li sala 1943 an, ( kartêkirna wê li nafçeya badînan ya başurê Kurdistanê zêdetir bu... Mîna çendîn dîdaran de yên me di gel rewşenbîr u xwendevanên qunaxa nav bihorî de krîn, mîna şehîd Enwer Mayî (1919-1963), li xwendingeha mizgefta gundê mayê li nafçeya berwaryan li 1942 an, xwendikarên  xwe di gel dersên olî  fêrî  xwendin u nvîsana  Kurdî bi van tîpan di krin ).[301]

(Mehemed Ermexanî) yek ji nvîskarên Kovara (Ronahî) ya şamî li hejmara (12) ande, amaje bi xwendingeha henê re kiriye u di bêje Şêxê gundî Şêx mezher di temenê pêncî salde xwe fêrî van tîpan kirîye, u piştevanî jêre kirîye.[302]

---

298. Selah Hirorî, *Me endamên hîwa jbîrkrn*, rojnameya birayetî, h.2289-2290, adara 1997 an.
299. *h.b* , r.19-20.
300. Musediq Tovî, *b.n.b*, r . 71.
301. Musediq Tovî, *h.b* , r . 66-67.
302. Kofara Ronahî, h.(1), şam, adara 1943, r . 10-11.

Her divî biwareyde Mehemed Se'îd Muftî (1929-2009) ku li dawiya salên sîhan de u despêka çlan, dema xwenkarê navnicî li mîsl di bêje: ( li sala 1939 an bi rêya seyda Salih Yusufî şaneyeka parta hîwa li Dihukê hat damezrandin, li şunde di bêje belavok u Kofar ji bo me ji surya di hatin her çend rojekan carek bi rêya kesekî li bin navê mistefa botanî, u em fêrî latînî di krin).[303]

Di dîdara min de bi mamusta Musedeq Tovî re, ku zêdetir li ser Kovara (Hawar) peyviye; derbarê (Yusufî) aşkera di ke ku (( yekemîn kes bu helbest bi kurmancî (badînî) di Kovarên Kurdîde belafkirî ewjî Kovara nav bihorî bu bi pîtên latînî)) her dîsan ji nvîsevanên pêşengê badînan buye, ku bi Kurdî u kirmancî bi pîtên 'erebî bejdarî Çapemenîya Kurdî buye, bi helbesta (hêvya me) li hejmareya (39)ande li 15 î şiwata 1942 an belafkiriye.[304] dîsan cardin li hejmareya (55) ande bejdar di be, u di gel çend nvîskarên badînan mîna Memduh Birîfkanî u mela Enwerê mayî di ropelên Kovara (Ronahî) de bejdar di be

Ji aliyek din despêkirna şerê cîhanyê duyemîn, ferset li cem mîr Celadetî vekir ser jnu dest bi belafkirna (Hawar)ê bike, u li şunde kar ji bo belafkirna Kovara (Ronahî) bike li nîsana 1942-1945 an.

#### 2.4.2.4 Kovara Ronahî1960

Kovareke edebî heftane bu, dîsan li şamê ji aliyê (Celadet 'alî Bedirxan) ve derketiye, ku xwedî u berpirsyarê wê bu, hejmara yekemîn li çirya yekem ya sala 1941 an derketiye. [305] (Yusufî) bi helbest u nvîsînên xwe di ropelên wê de bejdarbuye.

Cardin bi heman nav mîna Kovareke edebî Zanyarî mehane derket, li bajarê bexdayê , xwedî îmtiyaz u sernivîserê wê (hafz qazî) bu, hejmara yekemîn li tîrmeha 1960 ande derketiye, bo dema sê salan u li 1962 an rawestya, u (Mehemed mela kerîm) serperşitî ya derhênanê jêrre di kir.[306]

303. Kofara Dihuk, dîdarek dgel Mehemed se'îd miftî, h (17), tîrmeha 2002 , r. 20.
304. Dîdarek dgel Musediq Tovî, li 5/11/2016.
305. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, r. 41.
306. *h.b*, r. 83.

### 2.4.2.5 Kovara Nuserî Kurd 1971

Kovareke edebî ya mehanebu, ji aliyê Yeketiya nvîsevanên Kurd li wî çaxî li Bexda derdiket, hejmara yekemîn li meha azara sala 1971 an derket, seRuk nivîserên wê (marf Xeznedar) bu, heft hejmar jêre derketîne, li hersê hejmareyên pêşîn de (nesrîn fexrî) skirtêra nvîsandinê bu.[307] di dîdara min de di gel mamusta (Reşîd Fndî) ku hefsenger u hevalê seyday bu li hundirê şoreşê, weha aşkera dike dema ku gehşitîne naf şoreşê li sala 1974 an, li ( wî çaxî min li êzgê dengê Kurdistanê kar di kir; (yosfî) bu emîndarê giştî yê dad u ewqafê (wezîrê dadweryê). u ji ber dilsozya xwe daxwaz ji me kir bzanîn kanê çend endamên Yeketiya nvîsevanan gehşitîne şoreşê daku helbjartnan encambden ji bo danîna serokek nu ji bo Yeketiya nav bihorî, u bi dengdana hazran ku zêdetir bun ji nîvek endamên pêşîn, bi prranya dengan cardin hat helbjardin ji bo serokatya Yeketiya nvîsevanan, me destkir bi derxistna Kovara Nuserî Kurd, ku di nîvbera salanên (1970-1974) ande, yazde hejmar jêre derketbun, u me li hundirê şoreşê li çiyay hejmara (12) an derxist, u ez yek ji desteka nivîseran bum li wî çaxî u berpirsê liqa dihuk ya yeketiya nivîserên Kurdistanê, di hejmara henê de (Yusufî) helbesta xwe ya li bin navê (Heware) [308] têde belafkir ).[309] u têde di bêje

***Heware Heware birayino Heware***
***Spêdeya zu rabin***
***Pêkhatî u têk kar bin***
***Li doşka swarbin***
***Hev dêwêt bjar bin***
***Heware Heware birayino Heware***
***Em krêkar u cotyarîn***
***Rêncber u hejarîn***
***Umêd u Hîvî darîn***
***Gorr kenêt zordarîn***
***Heware Heware birayino Heware*** [310]

---

307. Cemal Xeznedar, *b.n.b*, r . 118.
308. Reşîd Findî bi tenê ef helbeste bi temamî bi dest xistye û li hejmara (12) ya gofarê belafkirye. Bi nêre: Reşîd Findî, *b.n.b*, r. 133.
309. Dîdar di gel Reşîd Findî, 3/11/2016.
310. Reşîd Findî, *b.n.b*, r . 133.

### 2.4.3 Ji Gotar u nivîsînên (Yusufî) di Rojname u Kuvaran de

1- Rojnameya Terîq Elteaxî, hejmareya (1387) li 7/7/ 1967 an , li bin navê ( Rojnamegerî rastya wê u dîtneva paşeRoja mîletî ).[311]

2- Rojnameya Beyrut, hejmareya (98) li 25/8/1971 an.

3- Rojnameya elsewre , hejmareya (1083) li yekşembya adara 1972 an, bi helketna 11 î adarê peyvek li bin navê (*11 î adarê bikeyne rê xweşkerek ji bo Yeketiya neteweyî* ).[312]

4- Rojnameya elcimhurye, hejmareya (1328) li 11/3/1972 an, di ropelê çwaranda dîdarek di gel de sazkiriye , li ser bîranîna duyemîn ya Rêkketina 11î adarê, her dîsan bi helketna serhildana şoreşa 14î tîrmeha 1958 an, li heman Kofar diyarek digel de pêkanye, lê hejmare u berwara wê bi dest min neketye.

5- Rojnameya Beyrut, hejmareya (349) li 21/6/ 1972 an.

6- Rojnameya Elteaxî, hejmareya (1224) li 28/12/ 1972 an.

7- Rojnameya Elteaxî, hejmareya (1227) li 1/1/ 1973 an,[313] aheng gêran bi helketa sal vegera Komeleya rewşenbîriya Kurd li êvarya Roja înî li 29/12/1972, ku li wî çaxî serokê Komeleyê bu u endamê Serkirdayetiya mekteba syasya partî bu, dîsan wezîrê dewletê bu li hikumeta ‘Iraqê.

8- Rojnameya Elteaxî, hejmareya (1285) li 17/3/ 1973 an, ahengek li hola zanîngeha mustenserye li bexda, Roja 11ê adara 1973 an bhelketna yada yazdey adarê u Cejna Newrozê, ku jaliyê tayê pêncan yê parta demukrata Kurdistanê hatibu rêkxistin, gelek aliyên hkumî u diblumasî u hêzên neteweyî u rêkixraweyên 'îraqî u kurdistanî berhevbun.

9- Kovara Rojî Kurdistan, hejmareya (2) l1971 an, serGotara hejmarê li bin navê (*Saxkirna Cejna Çapemenîya ‘Iraqê ya 102 an* ).[314]

---

311. Salih Yusufî, *Rojnamegerî rastîya wê û dîtneva paşeroja mîlletî*, rojnameya terîq elteaxî, h (1387), bexda, 1967, r.1.

312. Salih yusufî, *11 î adarê bikeyne rê xweşkerek ji bo yeketya neteweyî*, rojnameya elsewre , h (1083), bexda, 1972.

313. Rojnameya elteaxî, h (1227) li 1/1/ 1973.

314. Salih Yusufî, *saxkirna cejna çapemenya 'êraqê ya 102 an*, Kofara rojî Kurdistan, h (2), bexda, 1971, r.2.

Dîsan me li beşên bihorî yên Xebatê  de aşkerakrî, çendîn nvîs u Gotar u helbest li gelek Rojname u Kovarên din belafkirîne, u bi tenê hinek bi dest min ketîne u di hundirê beşên henê de nvîsandîne, taybet Çapemenîya serdema bnemala Bedirxanyan u herdu Kovarên Hawar u Ronahî de.

**ENCAM**

1- Çapemenîya Kurdî mîna stunek şaristanî tê hesbandin, cihek xweser dijiyana netewan de heye u denga wan ya azad aşkera di ke, hertim bizava belafkirna rewşenbîryek pêşketî kirîye, u berevanya mafên rewayên mîletan di ke, miletê Kurd xwedî çendîn kesatyên navdêr u rewşenbîre, ji helbestvanan heta di gehe Rojnamenvîsan, bi hebuna zana u rewşenbîran di be sedema pêşketina Çapemenîya Kurdî.

2- Reseniya Çapemenîya Kurdî jnavê Rojname u Kovarên wê diyard be, ku prranya wan bi navê Kurd yan Kurdistan re grêdayine, mîna Kurdistan, Banga Kurd, Hetava Kurd, Rojî Kurd, Nuserî Kurd u Rojî Kurdistan.. , Yanî Kurdan bi xwe derxistye ne wek welatên din, mîna turk u 'ereban ku frenisyan ji bo cara yekemîn li navde peyda kirbu.

3- Peydabuna Çapemenîya Kurdî ji derveya wlat bu, di Xebatê  de dur ji gumanê yekemîn Rojname li wlatê mîsrê li 22 nîsana sala 1898an derketiye li bin navê (Kurdistan), ji aliyê Mîqdad Midhet Bedirxan u bnemaleya wî ya Xebatkar, u ji hundirê zulm u zorya deshelata 'usmanyan mîna baştirîn rêk ji bo berengarya hikumetên yek li şun yekên dnên zordar, ber bi pêş çuye li piştî Darbeya dewleta 'usmanî li 1908 an, u bi dehan Rojname u Kofar derketîne, mîna: ( Umîd, Peyman, meşrutyet, Yekbun, Roj Kurd...), yekemîn Rojnameya Kurdî li ‘Iraqê li bin navê (Bangî Kurd) li 1914 an derketiye.

4- Çapemenîya Kurdî li çaxê hukmê şahê ‘Iraqê, heta şurişa 14 î tîrmeha sala 1958an, karek zafgiranbu ji bo gehandina peyama xwe u huşyarkirna gelê Kurd, ji aliyekî li bin çavdêryek tund bu, dîsan li aliyek din ne dhişt hîç partek bi aşkerayî kar bi ke, dîsan piştî şorişa nav bihorî u derketina belafkiryên Rojane yên siyasî, mîna Rojnameya Xebat u Elteaxî yên parta demukrata Kurdistanê, Rojnamenvîsê Kurd kariye rexneyê li syaseta hikumetê bike u êş wazarên mîletî bi gehîne.

5- Li serdema hikumdarya Şêx Mehmudî (122-124), pêşketin bi xweve dîtiye u çendîn Rojname u Kofar derketin mîna: ( Banga Kurd, Rojî Kurd, Banga heq, u Omêd Istîqlal ), lê bi awayek giştî lawaz tê aşkerakirin, heta di gehe sala 1958 ku zor pêşketin ji xwe re dîtiye, bi dehan govar u Rojname u pirtu derketin.

6- Piştî Rêkketina 11î adara 1970 an, werçerxanek dîrokî tê zanîn di rewşenbîriya Kurdî de, bi taybet di nîvbere (1970-1974)an, ku bi demek zêrîn tê danîn ji bo Rojnamenvîsê Kurd u ber bi qunaxek nu çuye, u bi dehan Rojname u Kofar u belavok derketin, dîsan Rojnamegerya taybet peyda di be, rola (Salih Yusufî) jî di derxistna çendîn Rojname u Kofarn berçav di keve di salên henê de, mîna Kovarên Rojî Kurdistan u Nuserî Kurd u Estêre.

7- Piraniya Rojname u Kovarên grêday dema Xebatê bi herdu zimanên Kurdî u 'erebî buyne, u hinekan zimanên din bikaranîne mîna Çapemenîya serdema Şêx Mehmudî, u parvekrin u belafkirna wê lawaz buye u tenê li ser mlên endaman bu, dîsan ji aliyê çap u çapkirnê hejaryek zaf têde tê aşkerakirin.

8- (Salih Yusufî) zêdetir mîna syasetmedarek myanrew diyar di be, her ji zu ketye di hundir de ji sedemê hesta wî ya bilind ya neteweyî, dijî zolm u zorya hikumetên ‘Iraqê, ji bo dema nîv çaxî Xebatek berdewam kirîye, u têkelî karê partayetî buye, endamek sereke bu di Damezrandina parta demukrata Kurdistanê de, u kariye partên ( hîwa - Rizgarî - Sosyalîsta Kurdistanê ) da bi mezrîne, Roja şehîdbuna wî ku li 25/6/1981an bu, bi Roja salvegera şehîdên parta Sosyalîst were nasîn.

9- (Yusufî) mifayek zaf ji buyer u babetên çaxê jiyana xwe dîtîne, ku rꞏê xweşker bu ji bo gehandina peyama xwe, u kariye bi awayek serketiyane derbrrînê ji baRuduxê alozê Kurdan bike, vê yekê di hundirê Gotar u nvîsînên wî de rengve di de.
10- Mîna Rojnamenvîsek çeleng bu, qelema xwe ji bo xizmetkirna doza gelê xweyê Kurd bi karanye, dîsan dijyê xwe de jiblî zimanê daykê şarezayyek zaf di xwendin u nvîsîna zimanê 'erebî de hebu, ku baştirîn Gotarên wî bi zimanê henê bun, bi awayek ku çi nvîsevanek 'ereb şyanên wî nebun, u dîsan zimanê niglîyzî u hinek ji zimanê rosî di zanî.
11- Yek jiwan kesayetiyên giring u navdêr buye li seranserî Kurdistana mezin , ji berku destek balla di biyavê Rojnamegerya Kurdîde hebuye, bi taybet li başurê Kurdistanê u bexdayê, kar di çendîn Rojnama u Kuvaranda kiriye, mîna nivîser, sernivîser yan xwedî îmtiyaz, ev yeke der encama zîrekî u wêrekî u çalakî ya wî buye di vî biyavîde.
12- Kesekî li pêş (Yusufî) nvîsînek bi zarê kirmancî li Rojnamegerya Kurdîde belaf nekiriye, were nasîn pêşengê Rojnamenvîsên Kurdên nafçeya badînan, ku yekemîn nivîser bu li Kovara (Hawar) de li 1942 ande bi pîtên latînî bi kirmancya jurî, baştirîn Gotar li Rojî Kurdistan xweser bi zimanê 'erebî nvîsandîne u dîsan li Nuserî Kurd ya rewşenbîrî u zaRuyên gelê xwe bê bar nekrîne u Kovara Estêre jêre di ke diyarî.

13- Navê (Yusufî) di gel Rojnameya Elteaxî tê, u bi rêya Rojnameya henê kariye biratya Kurd u 'ereban kurtir lê bike, u bi Gotarên xwe rexneyan arastey hikumetê bi ke, u di hundirê teaxî de rolek berçav di bellavkirina hizra neteweya Kurdî de dbîne, u karî şorreşa Kurdî bi tevaya Kurdistanê u ‘Iraqê re ra bi gehîne u hesta neteweyî li cem take kesê Kurd bellav bi ke.
14- Rojnameya Elteaxî tê hejmartin sêyemîn rojnameya siyasî ya Kurdî, piştî (Xebat u Kurdistan), u rojnameya fermî ya yekemîn ku ji aliyê hikumeta 'ebdulrehman 'arfî ferman jêre derketbu , ku nav bihorî navê henê ji bo danabu, ku pêştir pêşnyaza navê (zayley Kurd- êewt elekrad) jêre kirbu, Rojnameya tenê bu ya kertê taybet Ko bi rexneya xwe hemberî rjêmê seknî li wî çaxî, (Yusufî) mîna nivîser u helbestvan, qelema xwe ji bo xizmeta doza gelê Kurd u êş u azarên mîletî xwe terxan krîne, di Rojname u Kovarên derxistî u tê de bejdarbuy.

## LISTEYA ÇAFKANIYAN

### YEKEM: PIRTUK

#### A. Bi Zimana Kurdî


AZAD 'UBÊD SALIH, 2007, *Karîgerî şorşî Eylul Leser Rojnamewanîy Kurdî 1961-1075*, Weş Rewşenbîrî, Hewlêr.

EHMED ‘EBDULKERIM, 1972, *elsehafe elîraniye*, b.ç, Bexda.

EHMEDÊ XANI, 1989, *Mem u Zîn*, Hejar Mukiryanî, b.ç, Hewlêr.

IDRIS ‘EBDULA, 2008, *Lebarey Rojnamegerî Kurdyewe* (Çwarde Lêkolîne Çapaxaneya Xanî, Çapa Yekem, Dihok.

ISMA’IL BADI, 2004, *Rojnamevanya Kurdî dnavbera bizava siyasî u rewşenbîrîde*, Çapa Yekemîn, Dezgayê Bedirxan yê Çap u Weşanê,Dihuk.

BEDIRXAN SINDI, 2002, *Civaka Kurdî di Dîtneva Rojhelatnasîda*, Hewlêr.

CELILÊ CELIL, 1985, *Jiyana Rewşenbîrî u Siyasyên Kurdan ( di Dîwana Sed Sala 19an u Destipêka sed Sala 20an de),* Jiyana Nu, u Pala.

CEMAL XEZNEDAR, 1974, *Bangî Kurdistan*, 1922-1926, Bexda.

CEMAL XEZNEDAR, 1973, *Raberî Rojnamegerî Kurdî*, Bexda.

DIWANA HACI QADIRÊ KUYI,1986, Lêkdan u Vekolîna Serdar Hemîd Mîranu Kerîm Şareza, Hewlêr.

REŞID FINDI, 2016, *SALIH Yusufî Jiyan u Berhem*, Çapaxaneya spêrêz, Dihuk.

REŞID FINDI, 2012,*Çend Tîrujkek Li ser Rojnamevanya Kurdî*, Çapa Yekem Çapaxaneya Ruşnibîrî , Hewlêr.

REŞID FINDI,1997,*Kartîkirna Şureşa Ilunê Li ser Huzana Kurdî*, Kuvara Metîn, ji (68) Xola Sêyem, Dihuk.

REFIQ SALIH, 2003, *Rojnamekanî Serdemî Hiukmî Şêx Mehmud*, Çapaxaneya Tîşk, Slêmanî.

KÊWI MUKRIYANI,1999, *Ferhengî Kurdistan*, Çapa Yekem , Dezgayê aras, Hewlêr.

‘EBDULA YASIN AMÊDI, 2005 , *Hunrawey Bergirî Le Berhemî Çend Şa'êrêkî (k.s) 1939-1970*, Çapaxaneya kurê Zanyarî Kurd, hevlêr.

‘EBDULSELAM’ELI,1991, *Dîwana Seyda SALIH Yusufî*, Çapa Yekem , b.ç, Dihuk.
‘EBDULSEMED ISLAM TEHA DUSKI, 2010, *Rolî BinemaLey Bedirxaniyekan Le Geşepêdan u Pêşxistinî Hunerekanî Rojnamegerî Kurdîda1932-1946*,Ça. Yekem, Çapaxaneya Baban, Slêmanî.
‘ELAEDIN SECADI, 1959, *Şorişekanî Kurd*, Çapaxaneya me'arf, Bexda.
‘ELAEDIN SECADI, 1978 *, Deqekanî Edebî Kurdî*, Korî Zanyarî Kurd, Bexda.
FAROQ ‘ELI 'UMER, *Rojnamegerî Kurdî Le'Iraqda (1914-1939).*
FERHAD PIRBAL, 2007*, Çend Basêk Le Barey Rojnamenusî Kurdiyewe*, Çapa Yekem, Slêmanî.
FUHAD TAHIR SADIQ, *Ferhengî Yarîdeder*, ('Erbî-Kurdî-Ingilîzî), Çapa Yekem, Çapaxaneya karo, Slêmanî.
KEMAL FUHAD, SEDIQ SALIH, 2001,*Sê Rojnameyên Şêxê Nemir, Banga Heq, Banga Kurdistan,Omêd Istîqlal*.
KEMAL MEZHER EHMED,1978*, Têgeyiştinî Rastî*, Çapaxaneya Kurê Zanyarîy Kurd, Bexda.
MEHEMED XIDIR MEWLOD, 1999 , Bizavî *Rojnamegerî Hikumetekanî Kurdistan*, Çapaxaneya Wezareta rewşenbîrî, Hewlêr.
MEHEMED SE’ID KURDE, 2004,*Çend Babetêkî Rojnamewanî*, Çapa Yekem, Çapaxaneya Rewşenbîr, Hewlêr.
MEHEMED KERIM EHMED, 2010*, Rojnamenusî Kurdî Taybetmend*, Nama Masterê, Zanîngeha, Beşa Ragehandinê,Slêmanî.
MUSEDEQ TUVI, 1999*, Çend Berperek Ji Dîroka Rojnamevanya Kurdî*, Beşa Yekem, Çapxana Kulîja Şerî'etî, Dihuk.
MUSEDEQ TUVI, 2011*, Çend Berperek Ji Dîroka Rojnamevanya Kurdî*, Beşa Duyem, Çapaxaneya Hawar, Dihuk.
NEWZAD ‘ELI EHMED, 1998, *Berew Sereta, Pirojey Parastinî Destnusekan jmare(8)*, Çapaxaneya zamwa, Slêmanî.
NEWZAD ‘ELI EHMED, 2008, *Rojnamegerî Xuyindikaranî Kurd Le Ewrupa u Emrîka 1949- 1991*, Çapa Yekem, Çapaxaneya îşk, Slêmanî.
NEWZAD ‘ELI, 2005, *Hunerekanî Edeb Le Rojnamegerî Nehênî Kurdîda 1961-1991*, Çapaxaneya Run, Slêmanî.

NEWŞÊRWAN MUSTEFA,2001,*Çend Lapereyek Le Mêjuy Rojnamewanî Kurdî*, Berga Yekem, Çapa Dezgayê Serdem, Slêmanî.

HOGIR TAHIR TUFIQ, 2006, *Rolê Rojnamegeriya Kurdî Dipêşvebirna Hizra Neteweyi ya Kurdîda (1898- 1918),* Wergêrana Muhsin 'Arf, Çapxana hecî haşm, Hewlêr.

HIMDAD HUSÊN, 2008, *Rojnamewanî u Edebyatî Niwêy Kurdî*, Çapxaneya Şivan, Slêmanî.

WESFI HESEN,2012,Rojnamegerî Li Devera Behdînan 1950- 2005, Çapa Duyem, Çapaxaneya xanî, Dihuk.

**B. Bi Zimana 'Erebî**

ELFIKUNT FILIB DITIRAZI,1913, *Tarîx elsehafe El'erebye*, Berga Yekem, Beşa Yekem, Beyrut.

IBRAHIM IMAM,1972, *Dirasat Fî elfen elsehefî*, Çapa Yekem, eliqahîre.

CEBAR CEBARI,1975, *Tarîx elsehafe elkurdye Fî el 'Iraq*, Çapaxaneya elwetenye, Bexda.

CEMAL XEZNEDAR, 1973 , *Murşid elsehafe elkurdye*, Bexda.

CEMIL CIBORI,1977 , *Weheyil elî'lam u Mesîret elîntac*, b.ç, Bexda.

HEMDI 'EBDULMECID SELEFI-TEHSIN IBRAHIM DUSKI, 2008 , *Mu'cem Şu'era elkurd, , Çapaxaneya spêrêz*, Dihuk.

ROFAYIL BETI, 1955, *elsehafe fî el'Iraq*, b.ç , Bexda.

ZUZAN SALIH elyusufî, 2009 , *Salih elyusufî (1918 1981) Sefehat Min Heyatihî u Nîzalihî elwetenî*, Çapaxaneya Hewar, Dihuk.

Se'di eldîn Xzir, 1986, elsehafe u el'esr, Çapaxaneya dar elhurye , Bexda.

'AMIR IBRAHIM QENDILÇI, 1981, *Me'lumat Sehefye u Tewsîqeha*, Dezgayê Ayif yê Çapê , Bexda.

'EBDULREZAQ ELHUSNI, 1971, *Tarîx elsehafe el'Iraqye*, Beşa Yekem , Çapasêyem , Çapxana el'îrfan, Seyda.

'EBDULREZAQ ELHILALI, 1959 , *Tarîx elte'lîm Fî el'Iraq Fî el'ehd el'usmanî elexîr 1638-1917*, b.ç, Bexda.

'IZEDIN MUSTEFA RESUL, 1973 , *Hewle elsehafe el Kurdye*, Çapaxaneya Dar elcahiz, Bexda.

FAYIQ BETI, 1961, *elsehafe el'Iraqye, Mîladuha u Tetewiruha*, Bexda.

FAYIQ BETI, 1976, *Suhuf Bexdad fî Zîkra Tesîsha*, Bexda.

FEYSEL DIHATI , 1998 ,*Eda u Mulahezat Hewle elsehafe u elsyase*, Çapaxaneya Selah eldîn, Hewlêr.

FILADEMIR MINORISKI, 1970, *elekrad Mulahezat u Intîba'at*, Maruf Xeznedar, Bexda.

MECDI WEHBE, 1974, *Mu'cem Mustelehat eledeb*, Çapaxaneya Lubnan, Beyrut .

MEHEMED EMIN ZEKI, 1931, *Xulaset Tarîx Kurd Kurdistan*, Berga Yekem, Bexda.

HOGIR TAHIR TOFIQ, 2004, *Dewr elsehafe elkurdye fî Tetewir elwe'î elqewmî elKurdî 1898-1918*, Hewlêr.

WAYIL 'IZET ELBEKRI, 1994 , *Tetewr elnîzam elsehefî fî el'Iraq (1958-1980),* Dar elşun elseqafye el'ame, Bexda.

**C. Bi Zimana Turkî**

MALMISANIJ, 1999, *Kürt Teavün ve Teraki Cemiyeti*, ve Gazetesî, Istenbul.

**DUYEM: NAMEYÊN EKADEMI**

XELIL MUSTEFA USMAN, 2005,*Kurdistan elcnubye (el'Iraq) fî Senewat elîntîdab elbirîtanî*, Nameya Masterê ji bo Kulîja Adabê, Zanîngeha Dihukê.

REMZIYA SABIR MEHEMED,1993, *Huznî Mukiriyanî Nuser u Rojnamenus*, Nameya Masterê ji bo Kulîja Edebyat, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr.

KAMIRAN MEHEMED NEBI, 2005, *Qunaxa Werara Hizra Netewayetî di Huzana Kurdîda ji Destipêkê Heta Dumahîya Sedê Bîstê*, Nameya Dikturayê, Kulîja Zimanan, Zanîngeha Selaheddîn.

**SÊYEM: KOVAR**

Kufara Runahî , 1961, hejmare (4), kanuna duyem, Bexda.

Kovara Ronahî, adara 1943, hejmare (1), Şam.

Kovara , Dihuk, Tîrmeha 2002, hejmare (17) Dihuk.

Kovara Rojî Kurdistan, 1972,KomeLeya rewşenbîriya Kurd li,hejmar (2),Bexda.

Kovara Gulan el'erebî, 1998, hejmar (21), Hewlêr.

Kovara Hetava Kurd, 3 ê Trmeha 1914, hejmar (10).

Kovara Rojnamevanî , 2002, hejmar (9), Hewlêr.

Kovara Hetava Kurd, Adar 1976, hejmar (36), Bexda.

**ÇIWAREM: ROJNAME**

Rojnameya elcimhurye, 30/4/1970, hejmar (720), Bexda.

Rojnameya elhedef, 12/3/ 1971, hejmar (490), Zanîngeha Kiwêt.

Kurdistan Yekem Rojnameya Kurdî, 1998, Gera Sêyem 1917-1918, KumkirnaKemal Fuad, Slêmanî.

Rojnameya Pêşkeftin , 1920, hejmare(6), Sala Yekem.

Rojnameya Banga Kurdistan , 28 Adara 1923 , hejmare (1).

Rojnameya Omêd Istîqlal , 1924 , hejmar(13) Kanuna Yekemîn.

Rojnameya Jiyanewe, 18 ab, 1924, hejmar(1).

Rojnameya Jiyanewe, 20 ab, 1925, hejmar(36).

Rojnameya Elteaxî, li 1/1/ 1973, hejmar (1227).

**PÊNCEM: DIDAR**

NIVISER MUSEDEQ TOVI, *Li Bingeha Inisklupîdiya Parêzgeha Dihukê,* Dihuk , li 5/11/2016.

M. REŞID FINDI, *Li Pitukxaneya Bedirxanîyan*, Dihuk , li 3/11/2016.

**ŞEŞEM: GOTAR**

HARUN MEHEMED, 18/10/1003, ( *Kurdê Sufiyê Hatiye Kuştin Bi Pusteya Bumbekirî* ), Lendun.

KEMAL MEZHER, 2002, *Dîsan Rojnameya Kurdistanê,* Kovara Rojnamevanî, hijmar(8), Hevlêr.

MUMTAZ HEYDERI, 1998, *Dewrî Rojnamenusî Kurdî Le Pêgeyandinî Hoşyarî Neteweyî u Bizavî Rizgarîxwazî Kurdî*, Kovara (Karwan), hejmar (120) .

MUMTAZ HEYDERI, 1997,*Cejnî Rojnamenusî Kurdî u Rêbaz u Giyanî Kurdayetî Rojnameya Umêdî Istîqlal*, Sentera Birayetî, Kofar, hejmar (1), Hewlêr.

MEHEMED ‘EBDULA,1993, *Seyda Salih Yusufî*, Kovara (Metîn), j(21).

FERHAD PIRBAL,1994, *Mêjulkey Yekemîn Çapxane Kurdîyekan*, Kofara (Rabun), hejmar (10-11), Stokholm.

SELAH HIRORI, Adara 1997, *Me Endamên Hîwa Jibîrkrin*, Rojnameya Birayetî, e.2289-2290.

SALIH YUSUFI, 1967, *Rojnamegerî Rastiya Wê u Dîtneva Paşeroja Mîletî*, Rojnameya Terîq elteaxî, h (1387), Bexda.

SALIH YUSUFI, 1972, *11î Adarê Bikeyne Rêxweşkerek Ji bo Yeketiya Neteweyî*, Rojnameya elsewre , h (1083), Bexda.

SALIH YUSUFI,1971, *Saxkirina Cejna Çapemenîya ‘Iraqê ya 102 an*, Kovara Rojî Kurdistan, h (2), Bexda.

**HEFTEM: SAYT**

Hittpis://ar.wikipedia.org/wik

Hittp://sotakhir.com/

Hittp://farhad-mohimmed.blogispot.com/

**HETŞEM**: **DIKYUMENTERI**

Dîkyumênterî Bi Helketina *Yada Merasîma Rêzanîna* Ş*ehîd (Yusufî)*, 2/7/2012, Hewlêr.